**K.T.**

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZİNDÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZİMAN û ÇANDA KURDÎ**

# TÊGEH Û ZARAVAYÊ ÎRFANÎ DI HELBESTÊN FEXREDÎN ERAQÎ Û MIHWÎ DE

**Imad Shukur Mahmood MAHMOOD**

**VAN - 2017**

**T.C.**

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

# FAHRETTÎN ERAK'LI VE MIHWI'NN MISTIK ŞIIRLERININ DII VE ANLAYIŞI

**Yüksek Lisans Tezi**


**HAZIRLAYAN**

**Imad SHukur Mahmood MAHMOOD**

**DANIŞMAN**

**Yrd.Doç.Dr. Ömer ÇIFTÇI**


**VAN – 2017**

**K.T.**

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZİNDÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZİMAN û ÇANDA KURDÎ**

# TÊGEH Û ZARAVAYÊ ÎRFANÎ DI HELBESTÊN FEXREDÎN ERAQÎ Û MIHWÎ DE

**Amadekar**

**Imad Shukur Mahmood MAHMOOD**

**Şêwirmend**

**Yrd.Doç.Dr. Ömer ÇIFTÇI**

**VAN - 2017**

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

**TEZ KABUL TUTANAĞI**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

**Yrd. Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ** danışmanlığında, Imad Shukur Mahmood DAWODI tarafından hazırlanan **"Têgeh û Zaravayê Îrfanî di Helbestên Fexradîn Iraqî û Mehwî de"** adlı bu çalışma, **27/04/2017** tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan(Danışman)** | : Yrd. Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ | İmza: ……………………. |
| **ÜYE** | : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ | İmza: ……………………. |
| **ÜYE** | : Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ | İmza: ……………………. |
| **ÜYE** | : ……………………….…… | İmza: ……………………. |
| **ÜYE** | : ……………………….…… | İmza: ……………………. |

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

27/04/2017

Prof. Dr. Mahmut DEMİREL

**Enstitü Müdürü**

**NAVEROK**


NAVEROK ........ 7
KURTE ........ i
ÖZET ........ ii
ABSTRACT ........ iii
SİPAS KİRİN ........ iv
PÊŞGOTIN ........ v
DESTPÊK ........ 1
1 NASANDINA IRFAN Û SOFÎZMÊ Û ÇAVKANIYÊN WAN ........ 2
1.1 Nasandina Sofîzmê û Irfan ........ 2
1.1.1 Nasandina Sofîzmê ........ 2
1.1.2 Nasandina Irfanê ........ 5
1.1.3 Cudahiya Navbera Sofîzm û Îrfanê ........ 7
1.1.4 Cudahiya di Navbera Irfan û Dîn (Olê) de: ........ 10
1.1.5 Çavkaniyên Sofîzma Îslamî ........ 11
1.1.6 Nêrîna Irfanî ya di derbarê zanist, Dab û nerîta (kevneşopiya) xaneqayê: ........ 15
1.2 Dîroka Sofîzmê ........ 20
1.2.1 Zuhid (Terkedinya) ........ 20
1.2.2 Çûna Zuhdê Ber bi Zêdegaviyê di Xelwetgeriyê (Îzolebûnê) de: ........ 23
1.2.3 Xwe Azardan (Xwe Êşandin): ........ 24
1.2.4 Zêdegavî di Xwe Birçîkirinê de: ........ 25
1.2.5 Bêxewî ........ 26
2 NÊRÎNA IRFANÎ YA DI DERBARÊ ZANIST, EDEPÛ DAB Û NERÎTA(KEVNEŞOPIYA) XANEQAYÊ ........ 28
2.1 Nêrîna Irfanî ya di Derbarê Zanist, Edep ........ 28
2.1.1 Ilm û Zanist ........ 28
2.1.2 Zanist û Sofîzm ........ 28
2.1.3 Awez (Eql) ........ 32
2.1.4 Şerîet: ........ 33

2.1.5 Irfan û Şerîet: ........................................................................................ 34
2.1.6 Hinek ji Niwandinên (Nîşandanên) Arif û Sofiyan:............................................ 37
2.1.7 Çakiyên – Qenciyên- Şerîetê: ................................................................ 37
2.1.8 Edebiyata Irfanî:.............................................................................. 38
2.2 Dab û Nerîta (Kevneşopiya) Xaneqayê:........................................................... 40
2.2.1 Çile Nişînî .................................................................................... 42
2.2.2 Hirî Poşî, Peşmîn (Xirqe)...................................................................... 42
2.2.3 Nerîta Peşmîne, (Xirqe) Dirrandin:............................................................. 43
2.2.4 Sema, Hilperrîn (Semah)........................................................................ 44
2.2.5 Bergirîkirina li Semayê, Hilperrînê (Semahê) .................................................. 46
2.2.6 Hokarên Rêdana sema, Reqsê (Semahê) li ba Arifan: ........................................ 50
3 ÇEMK Û ZARAWEYÊN IRFANÎ DI HELBESTÊN(FEXREDÎNÊ IRAQ Û MEHUYÎ) DE 52
3.1 Tevbe (Tobe) ...................................................................................... 53
3.2 Xwenîşandan Ango Tezahûr (tecelî ).............................................................. 57
3.3 Hogiriya Xidugirtinê ( Ons ) ..................................................................... 62
3.4 Amaje (Nîşane).................................................................................... 66
3.5 Berfirehkirin (Best ) ............................................................................. 69
3.6 Neman Helandin (Fena) ............................................................................ 71
3.7 Man (El beqa)..................................................................................... 74
3.8 Yek Xwdê Perestî ( Tewhîd )....................................................................... 77
3.9 Bibxşandin û Dest Beredayî (Cud û Sixa).......................................................... 81
3.10 Xweda (Heq)...................................................................................... 84
3.11 Aadegî (Hizûr).................................................................................... 88
3.12 Rastî (Heqîqet ) ................................................................................. 91
3.13 Taka (Reca) Hêvîdarî ............................................................................. 94
3.14 Reza (Riza)....................................................................................... 97
3.15 Mestî (Suker)..................................................................................... 99
ENCAM ................................................................................................. 101
Çavkanî ............................................................................................... 103

**KURTE**

Mehwî (1837-1909m) yek ji wan helbestvanên kurde ku xwedî rolekî diyar ê serdema xwe de bûye û helbestên wî bi awayeke giştî rengdaneyekê wî yê waqiî ango rastî ya wê demê li Silêmaniyê hebûye, pêşdeçûna helbestên Sofiyane heta astekê jî wek helbestên olî tê pênase kirin, Şêx Fexredînê EIraqî (602-690k) jî kesekî mezin ê helbestvanê Irfanî bûye li Îranê, bê ku ti gumanek hebe kesekî herî mezin û hûnerîtirîn arifê sedsala heftemîn a wêjeya farisî bûye, Eraqî ji ber hogirî li gel yekitîbûn (Wehdet El vucûd) de bû ku digehe xizmeta (Sedreldîn Qumî) û piştre jî li İbin Erebî para xwe verdigre û her wisa jî dibe sedemê nasyarî di navbera Eraqî û Mewlanayê Romî, di vê lêkolînê de em dixwazin helbestên Mehwî bi navê helbestvanekî kurd li gel helbestvaneke fars ê bi navê Fexredînê Eraqî ku yek ji helbestvanên irfanî ne, bi taybet ji aliyên Irfanî û Sofîzmê ve me xwast bînin ber behsê. Ji ber ew du helbestvanene di nav wêjeya Irfanî de xwedî cîhekî taybet û diyarin, ev ji aliyekê, lê ji aliyeke din ve ew du helbestvane bûne çavkaniyek bo helbestvanên piştî xwe, ev yek li gel hemû astengî û pirsgirêkên bo wan ji aliyê kesayetiyên olî û civakî yên derdora wan ve hatine avakirin, heta astekê mijûl bûn wek Hellac û hevalên wî, ku rastî hikmê darve kirinê bibûn û hatibûn kuştin, lê ew du helbestvanane serê xwe ne tevandin, bi wî awayî naha em dibînin ku geheştine bilindayî û lûtkeya helbest û wêjeya Irfanî, heta astekê bîr û ramanên helbestên wan li gel piraniya helbestvanên piştî wan ve hatiye dubare kirin, ev jî buye sedem ku kesayet û navûbangê wan di dîrokê de nemir be û herdemê navê wan hebe, ji ber vê jî bi vê ponijandina li ser naveroka helbestên wan jî vê rastiyê misoger dike.

**ÖZET**

Mehuyî (1837-1909m) oldukça önemlî Kürt şairlerin başında gelmekle birlikte, önemli rolü olan ve kendi döneminin önemli simalarından biridir. Şiirleri genel anlamda Kürt edebiyatına önemli katkılarda bulunan ve kendi döneminin gerçeklerini yansıtan Süleymaniyeli bir şairdir. Şiir sanatındaki gelişimiyle sofizmi önemli oranda işleyerek yazmış olduğu şiirleri dini içerikli şiirler olarak ele alınmaktadır. Diğer taraftan Şeyh Fahrettini Eraklı (602-690k) da önemli bir sima olarak irfanî içerikte şiirleriyle tanınan İranlı bir şairdir. Hiç bir kuşkuya yer bırakmayacak şekilde yedinci yüzyılın önemli bir arifi olarak Fars edebiyatının vazgeçilmezlerindendir. Eraklı kendi anlayışındaki birlik ya da başka bir ifade ile tanrı birliğinin (vahdet-i vucud) savunucusu olduğundan dolayı Sadrettin Kumi'nin ögrenciliğini yapmış, ardından İbnî Arabi'den de gerekli dersleri almış ve ondan dolayı da Eraklı ile Mevlana Rumi'nin tanınmasına vesile olmuştur. Bu çalışmada Kürt şairi olarak Mehwi'nin şiirlerini ve onun Fars şair olan Faxredîn Eraklı ile olan bağını gerekli mukayeselerle ele almaya, her iki şairin de Irfani yönlerini analiz etmeye çalıştık. Özellikle irfani ve Sofizme ilişkin olan bağ ve benzerliklerini izah etmeye çalıştık. Çünkü her iki şair de irfani edebiyatta oldukça özel ve önemli bir yere sahiptirler. Diğer taraftan da her iki şair de kendilerinden sonraki şair ve edebiyatçılar için önemli bir kaynak olmuşlardır. Öte yandan kendilerine engel olabilecek bir çok dini ve toplumsal soruna ragmen gerekli gelişimi sağlamış ve rüştünü ıspatlamış şairlerdir. Benzer durumda olan Hallac-ı Mansur idam cezasına çarpıtılmasına rağmen onlar bu yoldan dönmemişlerdir. Dolayısıyla bu iki şair tüm toplumsal ve dini dogmalara boyun eğmemiş ve irfanî edebiyat ve şiirin zirvesinde yer edinmişlerdir. Ayrıca kendi düşünce ve dünya görüşleriyle kendilerinden sonra gelen önemli bir çok şaire kaynak olmuş ve onların görüşleri kendilerinden sonra gelen birçok şairde tekrar dillendirilmiştir. Dolayısıyla bu iki şairin edebiyat ve şiir dünyasında tarihe mal olmuş olmaları ve ölümsüzleşmeleri oldukça anlaşılır bir durumdur. Tüm bu yönlerinden dolayı bu iki şair üzerine yoğunlaşmak ve şiirlerini analiz etmek, araştırmamızı bu çerçeveye oturtmak oldukça anlaşılır ve yeterli bir gerekçe teşkil etmektedir.

**ABSTRACT**

Mahwi (1837-1909m) is one of the most important poets in his tie , in general his poems are the reflection of Mahwi's time, meaning his poems are Mystic and religious. Shek Fakhraden Iraqi (602-690k) is one of the important mystic poets in Iran , with no doubt he was one of the greatests and artistics mystic poets in the Persian literature. As he was interested in (Wahdat Alwjud)(Universe United) , he became friend with (Sadradeen Quni) then he make use of Abnu Alarabi's talent and his connection wsith Abnu Alarabi led to the creation of a friendship with Iraqi and Mawlana Rumi.

In this research Mahwe's poetry (a Kurdish Poet) with Fakhradeen Iraqi (a Persian poet) are being indulged together. As these two poets holds a special place in the literature o mysticism, this is one side, in the other side one should say are becoming a source for the following poets to come after them, in addition there were many obstacles created for them from the religious and the social figures in their time, to the extension they were about to be hanged as Halag and other figures who were hanged because of their mystic believes. but the two great poets didn’t backup and became two of the most important poets in the field of Mysticism . Many poets after them followed their trace and this proves their greatness.

**SİPAS KİRİN**

Berî her tiştekî ez pir spasiyên xwe ji mamostayên birêz ên beşa kurdî ya zankoya Yuzuncu yilê dikim, ku bi awayekî bê rawestan û bê westandin û bi awayeke ji dil li gel me de di wan du salên dawiyê de xwe di ber me de westandin, herwaha di cîhê xwe de ye ku ez spasiyê ji birêz ( Yrd. Doç.Dr. Ömer ÇIFTÇI ) re bikim, ji ber erkê serpereştî kirina vê lêkolîna min girte sitûyê xwe, herwaha spasiya yek bi yek endamên malbata xwe dikim ku berdewam alîkarê min bûn di piroseya xwandinê de, spasî ji bo hemû wan heval û dostan piştevanê min bûn, heta bi tenê peyvek jî alîkarê min ez spasiyê wek deynek dizanim, dawiyê de jî ez vê lêkolînê pêşkeş dikim bi ruhê paqij ê wek perperokê ango ji birayê xwe yê canemerg û xwedê rihmê lê bike (Azad) re .

**PÊŞGOTIN**

Sofîzm û Irfanî mijareke dûr û dirêje û xwedî dîrokeke dirêj û dikare bê gotin qasê dîroka mirovahiyê xwedî raboriyekê ye, ev mijar di pêşerojê de bi awayekî hîn zêdetir û rêxistinî û tejî dê bê rawekirin, mijar û rengdana Sofîzm û Irfanî di wêjeya kurdî de bi awayeke giştî, li ser bingehê ponijandineke dûr û dirêj pêwîstiya xwe bi lêkolînê heye, di beşekî piraniya pirtûkên wêjeyî de gelek babetên wek sofî, xelîfe, şêx, zahîd, zuhd, teqwa, perestiş, peşmîne poşî, çelenşînî, goşegirî, terîqat, şerîet, wan peyvana hemû tên dîtin. Dîroka wêjeya kurdî dîrokekî dûr û dirêj li gel wan çemkane de heye, ku pêwîstî bi şirove û lêkolînên zanistî û pisporane heye, netewa kurd wek neteweke misliman peyvendiyên wî yên bihêz hene li gel tevgerên biryarî yên netewên misliman, helbestvanên kurd di qonaxên cuda de stranên xwe yên helbestî ve beşdariya xwe li wêjeya Sofîzm û Irfanî de kiriye.

Helbestên Sofîzmî dahênaneke, ku îlhamê xwe ji naveroka felsefeya Sofîzmê vergirtiye, wê demê wêneyê dahênana felsefeya Sofîzma amêz, zêdetir xwe davêje bo remz û romantîzmê, heta naha sînorek bo helbestên Sofîzmê hatiye danîn, lê di rastiyê de ev ne tişteke zanistiye, ji ber gelek helbestvanên din jî hene ku xwedî bandoreke bilindin di pêşdebirinê de û dewlemend kirina helbestên Sofîzm û irfanî de, lê navê wan pir diyar nîne, Mehwî yek ji wan helbestvanane ku di nîvê sedsala nozdemîn de li Kurdistanê rolê helbestvanên Sofîzm û Irfanî yên netewên misliman pêşxistine ku di sedsala sêzdemîn de destpê kiriye .

## DESTPÊK

Mehwî di destpêka hatina meydana melayetî û xelîfeyetiya Şêx Behadîn de wek melayekê û xelîfeyê şêxekî navdar ê terîqeta neqşîbendî ber bi gelek pirsgirêkên mezin hatine û heta astekê baş serkeftin li hember hemû pirsgirêkan bidest xistine û di qada helbestên irfanî de serkeftî bûye, ji aliyeke din ve Fexredînê Eraqî helbestvaneke Îranî ye, di qada Irfanî de xwedî paye û maqamekî bilinde, xezelên Eraqî xwedî vekişîneke taybetî ne di wêjeya Îranî de û bi taybet di wêjeye Irfanî de xwedî giringiyeke zêde ye.

Armanca giştî ya tezê pêktê ji nasandina Irfanî û Sofîzmê û piştre jî aşkera kirina dîroka Sofîzm û Irfan û çend danûstandin û kiryarên irfanî ku ji aliyê arif û Sofiyan ve hatiye pêkanîn, armanca taybetî ya teza me ew e ku nasandina bi hûrgilî û tejî ya çemk û zarawayê Irfanî kirine, bi taybet ew çemk û zarawayên ku di navbera her dû helbestvan de dûbare bûne, Babeta irfanî û Sofîzmê, bi taybet jî çemk û zarawayê Irfanî giringî û taybetmendiyekî xwe ya zêde heye, di wêjeya netewên din de gelek lêkolîn û babet û pirtûkên ku di vê derbarê de hatiye nivîsandin hene, lê di nav kurd de, her çend helbestvanekî zêde yê arif jî hene, lê lêkolîneke wisa zêde jî li ser nehatiye kirin, ew yek jî bû sedem ku em zêdetir ber bi vê babetê ve gav bavêjin,

Di vê tezê de ji ber alozî û berfirehbûna mijarê me sûd ji çend rêbazeke lêkolînên tezan vergirtiye, ji wan jî rêbazê vesf, piştre jî di beşa sêyem de me sûd ji her du rêbazên rawekirin û muqayesekirinê vergirtiye, bi awayeke ku ji aliyekê ve rawekirin bo beytên helbestî me pêşxistiye, ji aliyeke din ve jî her du helbestvan me li gel yek muqayese kirine .

Ev lêkolîne pêktê ji destpêk, kurte û sê beş û encamp û lîsteya çavkaniyan, di destpêkê de beşa destpêkê bi awayekî kurt li ser babetê hatiye nivîsandin û piştre jî kurte ango puxteyek li ser tezê hatiye rawe kirin, di berdewamê de jî beşa yekem tê. Di vê beşê de bi awayekî teorîk li ser Irfan û sofîzm behs hatiye kirin Di beşa duyem de çend babetekî irfanî û dab û kevneşopiya irfanî hatiye nivîsandin, Di beşa sêyem de jî çemk û zaraweyên Irfanî hatine rawe kirin.

# 1 NASANDINA IRFAN Û SOFÎZMÊ Û ÇAVKANIYÊN WAN

## 1.1 Nasandina Sofîzmê û Irfan

### 1.1.1 Nasandina Sofîzmê

Eger em bixwazin nasandineke kurt û zanistî ji bo Sofîzmê bikin, pêwist e em awirekê li dîroka derketin, geşbûn, pêşveçûn û kamilbûna Sofîzmê di serdem, çax û cihên cuda de bidin. Çimkî rêveçûna fikrê Sofîzmê di qonaxên cuda yên mirovatiyê de, rastî guherînên sereke hatiye.Ev ji aliyekî ve û ji aliyê din ve, Sofîzm ji olekê heta oleke din û ji navçeyekê heta navçeyeke din dîsa cuda ye.Bi taybetî di warê reftar û tevgerên sofiyan de.Vê yekê jî kir ku çend tarîfên curbicur û nerînên cuda derbarê Sofîzmê derkevin holê. Hinek nivîskarên vê mijarê tarîfên wan derbarê halê Sofiyan e û hinekên din jî ji nerîngeha "Yekîtiya Hebûnê" (Wehdet el Wucûdê), dest bi bingeha karên xwe kirine. Lewma em jî naxwazin di rêveçûna karê xwe de, tenê tarîfan tomar bikin, lê emê li gor têgihîştin û lêfikirîna xwe hinek ji wan tarîfan berçav bikin ku bi nerîngeha nivîskar û lêkolînvanên Sofîzmê, bi guhdan û bi çavekî zanistî lê dinerin.

Di destpêkê de, Sofîzm ji xwedêperestiya xwerû û terkedinya (rebenî - zahidî) û jixwedêtirsiyê re dihat gotin. Li gor nasandinên ku di wan serdeman de derbarê Sofîzmê derketin holê, bîr û baweriya wan bi vî rengî bû ku Sofîzm ji "Xwedêperistina xwerû (zahidî) û dilovanî (mehebet) û (marîfetê) pêk dihat. Piştre jî " *navê Sofîzmê ji xwedêperestan li dilovanan hat kirin ku ew jî hin kes bûn ku Xwedê ne ji ber buhiştê û ne ji ber dojehê diperistin, bi wateya ku Sofîzm ji xwedêperistineke tund û qewîn peyda bû û bi tundtirîn forma Yekîtiya Hebûnê (Wehdet el Wucûdê) bidawî bû*."[1]Beşekî zêde yê nivîskaran çavkaniya Sofîzmê vedigerînin ser (zahidiyê) û bi taybetî jî "*Zahidiya îslamî çavkaniya dîtina Sofîzmê di civaka îslamî ya nû de bû di wê dema ku zahidî ji çarçoveya şerîetê derneketibû.Sofîger mijûlî ravekirina destnivîsên olê bi şêweyeke nû bûn*."[2]

---

[1] - Qasim Xenî, *Tarîx Tesewif Der Îslam û Tetewrat û Tehewilat*, Çapê Nuhum, Celd Duwem, Entişarat Zewr, Tehran,1383, r. 179.

[2] -Maeruf Xeznedar, *Mêjuy Edebî Kurdî*, Bergî Çawarem, Çapî Duhem, Çapxaneyî Aras, Hewlêr, 2010, r. 233.

Nerîna Nikolson derbarê Sofîzmê wiha ye ku "*Tarîfên pir û curbicur ji aliyê nivîskarên Fars û Ereb ve li ser Sofîzmê hatine kirin, lê piştî wan hemû nasandinên dirêj ku li ser Sofîzmê hatine kirin, em dikarin bêjin: Tarîfeke diyarkirî ya Sofîzmê nîne, ji bo vê mebestê jî mînaka gumanlêkirina wêneya fîl di şeva tarî de (Mesnewî Manewî bergê sêyem) tîne, bi wateya ku, çimkî Sofîzm diyardeyeke psîkolojîk e û girêdayî hestên takekesî ye, herkes li gor hest û psîkolojiya xwe tiştekî li ser dibêje. Hemû jî nikarin nasandin û tarîfeke kurt û xwerû û babetî ku bi hemû nasandinan re li hev bike pêşkêş bikin*"[3]

Ji ber vê hokarê, emê çend pênase ango tarîfan derbarê Sofîzmê berçav bikin:

Sofîzm: Yanî "*Dijwariya çêjê yan rahênanê û derûn (nefs)ê û ew hewldanên bi armanca vegerandina siruşta mirov ji reftara nelihev ber bi reftara bedew ve wek (xweparastina ji sûc û çewtiyan, bêhnfirehî, zelalî û dilmezinî) ku ev jî dibin sedema pesindan û bilindbûna nefsê li dinyayê û xelata qenciyê di dinyaya axiretê de*" [4]

Ebû Seîd Ebûlxêr, Sofîzmê wek veqetîn an vebirrîna ji erk (teklîfê) dibîne û dibêje:

*Teklîf bir mird derwîş nîst* *Wesiyet hemîn yek suxen û bîş nîst*[5]

Yanî

Erk ne ji bo mirovê derwêş e Şîretkatî her ev e û ne tiştekî din e

Herwiha Îbrahîm Ehmed Şiwan li ser Sofîzmê dibêje: "*Sofîgerî rêyeke sereke ye ber bi baregeha mezin a Xweda, paseporta wê terikandina cîhana şênber e û buxçikê wê jî qinyatkirin e (zêde xerc nekirin an mesref nekirin) û berê wê edeb e û qonaxa wê ya*

[3] - Qasim Xenî, *Tarîx Tesewf Der Îslam û Tetewrat û Tehewilat*, r. 180- 181.
[4] -Ibnê Cuzî, *Teblîs Eblîs*, Tercumî Elî Rêza Zekawtî Qeraguzlu, Çap Duwem, Entişarat Danêşgah, Tehran 1381, r. 136.
[5] -J. A. Nîkilson, *Îrfan Arfan Mosilman*, Tercumeî Esedulah Azad, Entişarat Ferdusî, Meşhed, 1372, r. 117.

*dawî jî dîtina Heq e bi çavê dil û arambûna di bin sîbera wî de ye û lixweveger e piştî nebûn an nemanê (fenayê)."*[6]

Di cihekî din de jî (Umerê Kurê Osmanê Mekkî), Sofî wek (kurê demê) dijmêre û 700 kes ji şêxan jî hemfikr bûn ku dem di cihê xwe de sûd jê tê wergirtin. Herwiha (Ebû Hefesê Hedad) dibêje: "*Sofîzm li berçavgirtina toreyan e û (Tstrî) jî dibêje: Sofîzm bi çavekî kêm temaşekirina nefsê û xwe dûr girtine e ji mal û saman e. (Nûrî) jî dibêje: Sofîzm xwe dûrxistin e ji hemû xweşiyên nefsê û sofî jî bi îsrar e li ser vê reftarê. (Cunêd) dibêje: Sofîzm mirin e di xwe de û jiyan e di Xweda de. (Rûeym) Sofîzmê wek tarûmarbûna nefsê dibîne. (Semnun) jinavçûna mal wek Sofîzm dibîne û (Şeibî) dibêje: Sofîzm veqetîn e ji xelkê û xwe bi Xweda girtin e û pêwendî û xwe pêvekirin e, bi wateyeke din têkilîhevbûna wî bi zatê Xwedê re ye. (Nesr Abadî) pênaseyeke kurt a din ji vî warî re aniye holê û ligel torre û nerîtên îslamî re hev pêngav e, ew xwestekên derûn û dûrketina ji zindîqtî û bilind ragirtina pileya şêxan û berdewambûna li ser lûbandin û dûa û xwedûrgirtina ji şîrovekariya encamên karên rewakirî (mecazî.)"*[7]

Mihemed Wesman di kitêba felsefeya sofîrgerî de, baweriya Marûfê Kerxî wek kevintirîn tarîfa ku li Sofîzmê hatiye kirin, tîne û dibêje: Marûfê Kerxî gotiye: "*Sofîgerî destgirtina bi rastiyan û bêhêvîbûn e ji wê yekê ku di destê xelkê de ye."* [8]

Herwiha Umer Şêx Nûredîn Muftî jî di kitêba Heqîqeta Tesewifê de dibêje: "*Sofîger ji kesekî re tê gotin ku tenê bide ser rê û rêbaza hezretê pêxember (S.X), tevger û rabûn û rûniştina wî li ser sineta pêxember (S.X) be."*[9]Ev bawerî çavkaniya sofîgeriyê dibe ser ola Îslamê. Tevî ku Sofîzm xwedî reh û kokên kevintir û dêrîntir e jî. Herwiha (Ebûbekirê Kittanî) 222 koçî miriye, dibêje: *"Tasawuf heme xelq ast her kira xelq bêştir tasawuf bestir." Ango Sofîzm hemû reftar e, yê ku reftara wî zêdetir bû sofîgeriya wî*

---

[6] -Îbrahîm Ehmed Şwan, *Şêirê Ayînî û Sofîgerî le Şêire Kurdiyekanî Mehwî da*, Çapî Yekem, Çapxaneyî Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2001, r. 29.
[7] -Ebdul Baqî Gullpî Narlî, *Tesewf Der Yeksed Pirsiş û Pasox*, Tercume Tofîq Haşimî Sobhanî, Entêşarat Ehya kitab, Tehran, 1380, r. 17- 18.
[8] -Mihemed Osman, *Felsefeyî Sofîgerî*, Çapî Yekem, Çapxaneyî Rojhilat, Hewlêr, 2013, r. 114.
[9] -Omer Şêx Nuredîn Muftî,*Heqîqetî Tesewif*, Çapî Yekem, Silêmanî, 2012, r. 27.

*zêdetir e*"[10] Di warê halê sofiyan de jî, Ebû Tûrab el Nexşebî dibêje: "*Sofî di cîhana halê xwe yê taybet de ye û têkiliya wî bi cîhana şênber û madî re nemaye û havên e jî ji bo ronîdarkirin û zelalkirina hemû nezelaliyan*." [11]

Di encamê de em dikarin bêjin mumkin e Sofîzm wek rewteke ruhî li ber çav bê girtin û di kûrahî û hinavê hemû olan de derbas bibe, lê em nikarin bingehên hizrî yên Sofîzmê tenê li ser tekane baweriyeke dînî pîvan bikin, çimkî felsefeya nû ya Platonî wergirtî ji hizra Plato mînakeke berçav e ji bilî rê û rêçikên dînî, ku kariye guhertineke mezin di rewta fikrê Sofîzmê de bike. Ew Sofîzma ku di ola Îslamê de hebû bi lênerîna li wê kartêkirina wê ya sereke, berfirehî di wateya Sofîzmê de berçav dibe. Lewra bi hûrbûna di vê mijarê de, em nikarin ji nerîngeheke tenê ve li Sofîzmê binerin, çi ji nerîngeha dînî ya petî ve be yan a felsefî. Lewra em dikarin bêjin: Sofîzm têkilîhev e bi ruhê ol û felsefeyê, nexasim jî felsefeya Platonî ya Nû.

### 1.1.2 Nasandina Irfanê

Wateya peyva Irfanê nasîn, venasîn û wergirtina zanistê ye. Wateya giştî ya peyvê jî wek têrmeke Irfanî dikare wiha bê ravekirin: Zanistwergirtin li ser bingeha dil û li derveyî ravekirin û anîna belgeyên eqlî, ku di encamê de bi gihîştina bi Xwedê bidawî were, ev kirde wek karê Îrfanê tê hejmartin.

Irfan têkilîheviyeke ji dibistanên curbicur ên felsefeya cîhanê. Bi nerîna hinek nivîskar û zanayên vî warî, peyva îrfan ji" *(mîsîk) an "gnosîsm" hatiye wergirtin û peyv bi xwe jî tê wateya (sosret û ecêb, nihênî û veşartî.) Arif xwediyê nerîna xwe ya taybet e. Lewra pêwendiya rasterast a takekes û gihîştina bi Xwedê bi rêya kişfkirin û dîdevanî (şahid) û ezmûna batinî (tecrûbeya navxweyî) dipesinîne û rê jê re xweş dike*"[12]. Lahîcî arif wek mirovê bêkêmasî û kamil wesf dike û Camî arif wek kesekî dijmêre ku gihîştibe pileya bê navçîbînî (mak) an (zat) û navên Xwedê û sîfetên xwedayî. Hinekên din jî arif wek gihîştiyê pileya nemanê (fenabûnê) û vêga negihîştiye bi pileya mabûna Xwedê

[10] -Êbrahîm Ehmed Şivan, *Şêrî Ayînî û Sofîgerî le Şêire Kurdiyekanî Mihuyî da*, r. 27.

[11] -Îbrahîm Ehmed Şivan, *Şêrî Ayînî û Sofîgerî le Şêirê Kurdiyekanî Mihwî de*, r. 27.

[12]- Ebdul Refîq Heqîqet, *Tarîx Irfan û Arêfan Îranî*, Çapê sêhem, Entişarat Kumeş, Tehran, 1375, r. 35.

dinasîne. Masûm Elî Şa di (Terîq el Heqayiq) de, li ser arif dibêje: "*(Arif êi ser spartina xwedayê xwe ye, ji ber ku divê serê xwe pê bispêre, neku daku ji ceza (ezabê) dûr be, yan li benda xelata dinyaya axîretê be.* Ebû Turab Nexşeyî derbarê arif dibêje*: Arif keseke tutişt aramiya wî ya derûnî têk nade Umerê Sehrewerdî tedbîr û xwesteka arîf di tedbîr û xwesteka Xwedê de dinere*" [13]

Bertrand Russell arîfan wek hestyarên petî dibîne û bi baweriya Russell arîf perdê ji ser tu rastiyekê ranakin, lê zanist û bîroke û rêya zanistî ye (mentiqî) perdê ji ser rasteqîniyê radike, bi wateyeke din arîf ji wan kifşkirin, têgihîştin, zanist û rêyên zanistî tenê riwangeheke hestyarî diyarî me dike. Li gor dîtina Russell, îrfan hestyarî ye, hest jî zihnî ne. Bi wê wateya rasteqîn a berçavkî derveyî cîhanê di zihnê de pêşkêş nakin. Li vir jî dîsa Russell dibêje: "*Îrfan kêm zêde pêk tê ji kûrahî û tundûtûjiya hest ji bîr û bawerî derbarê cîhanê ku ew ne xawendarên wê ne*" [14] Helbet arîf halê xwe bêhtir bi têgihîştina îdrakî dijmêrin ne wek hestyarî, lê bi baweriya W.T. Eastyês nêzîk ji vê baweriyê dibêje: Eger pê gotin zihniyeta xeyalan baştir e, çimkî têgihîştina zêdetir tîne holê wek ji zihniyeta hestyar

R.M.Bak ezmûna tecrûbeya îrfanî bi ber çavê wan e dibîne "*haletên îrfanî jî di berfirehiya cîhanê de, di dem û çax û datayên mezhebî yên curbicur de wek hev in û her wan ezmûnên îrfanî yên berçav dike wek belge"*[15]. Li hember vê nerînê jî, profesor G. H Loya Ezmûna îrfanî wek zihnî dijmêre û William James rexne dike, çimkî bi baweriya William James "*ezmûna îrfanî berçavane ye û li gor Loya, James taqîkirina xwerû ya rasteqîn ligel şîrovekarî û belgeyên gumanawî têkil kiriye*"[16], lê Eastyês li ser wê baweriyê ye ku ezmûnên îrfanî bi giştî çi asoyî û çi derûnî (psîkolojîk) ne ezmûneke berçavane û ne hestyarî ye, lê di pileyeke pir zihnî de ye. Vekolînên wî di akamê de digihin asta zihnî bûn û xeyalîbûna wî. Bi wateyeke giştî îrfan pêk tê ji "*hewldan bo gihîştina bi pêwendiya rasterast a takekes ligel Xweda, her vê hoyê jî wiha kir ezmûnên*

---

[13]- Etaella Tededîn, *Cilwehay Tesewif û Îrfan der Îran û Cehan*, Entişarat Tihran, Tihran 1375, r. 363-364.

[14] -W. T. Astîs, *Îrfan û Felsefe*, Tercumey Behadîn Xremşanî, Çapê Sûm, Entêşarat Sirûş, Tihran, 1367, r. 2-3.

[15] -Çavkanîya Berî, r. 23.

[16] -Çavkanîya Berî, r. 25.

*îrfanî temenê wê bi qasî temenê mirovatiyê be û ne taybet be bi tu mezheb an firqeyekê*"[17]

Her ji ber vê yekê ye jî ku îrfan ezmûna takekesî ye û pêwendiya navbera îrfan û kirdgar e, ne mumkin e tenê di yek riwangeyê de bê temaşekirin, jixwe eger ji yek alî ve bê temaşekirin, êdî nezanistî û çavkanî û nasandina îrfanê dertê holê, ne tenê ev, lê "*tundiya olî, neteweyî jî rola wê piştguh dibe ji bo têkdana rastiyan*"[18] Li gor nerîngeha nasandinan, mumkin e bê gotin her mirovek arîf e çimkî cewhera îrfanê di hundirê mirov de kêferatê dike. Elî Şerîetî dibêje: "*Eger mirov cewhera îrfanî lê bibire, rasterast mirov temamtir û hişyartir û bihêztir ji giyan ji bereyên dîtir ên siruştê derdikeve*"[19].

### 1.1.3 Cudahiya Navbera Sofîzm û Îrfanê

Li ser aliyên cudahiya Sofîzm û Îrfanê çend bîr û bawerî û têbînî û ezmûn hatine nîşandan. Lê heta niha bîr û baweriyeke wekhev an bîr û baweriyeke yekbûyî derbarê cudahiyan an wekheviyek di navbera Sofîzm û Îrfanê de nîne, ev jî ji ber wan taximên pir ku di Sofîzm û Îrfanê de hebûn. Hemû hewldanên ku hatine kirin bo rohnkirina wekhevî û cudahiya van herdu babetan, tenê wek hewldaneke takekesî tên hejmartin û di asta bîroke û çêja takekesî de asê mane, çimkî eger em tenê di wateya peyvê de jî li cudahiya navbera Sofîzm û Îrfanê bigerin, "*Sofîzm wateyeke wê ya berfireh heye, bi şêweyekê têgeha sofî li ba nivîskar û vekolerên ewropî wek kesên hizr vekirî, ku mezheba wî nebe hatiye gotin*" [20]

---

[17] - Ebdulheseyn Zerîn Kub, *tesewf Îranî der menzer tarîxî yê an*, tercumey Mecedeldîn Keywanî, Entêşarat suxen, Tihran, 1383, r. 20.

[18] - Sebur Ebdulkerîm (Şikar), *Rengdaneweyî Kesayetî û Dunnyabînî Helac, le Şêre Kilasîkî Kurdî û Farsî da Betaybetî Layî Mehwî û Hafizî Şêrazî*, Çapî Yekem, Çapxaneyî Kemal, Silêmanî, 2009, r. 33.

[19] - Çavkanîya Berî, r. 34.

[20] - An Marî Şîmel, *Ebad Îrfan Îslamî*, Tercumeyî Ebdulrehîm Gewahî, Entişarat Ferhengî Îslamî, Tihran, 1377, r. 193.

Dîsa têgeha sofî bixwe jî nakokî li ser heye di aliyê wateyî de nikare bê paralel kirin bi wateya hirîpoşî (lixwekirina cilên ji hiriyê `sûfê` çêkirî), çimkî Sofîzm ji celebê aveke rewan e û berovajî sekinîna wê, hertim di tevger û şepêl û kêferatê de ye. Ti carî ji tevgerê nakeve û ji her kaniyekê avê vedixwe, berdewam bazinê hizra xwe berfireh dike. Bi wateyeke din ji her gulistanekê gurzek gul hildigire, herwiha di destpêka pêrewa (zuhdê) de têgeha Sofîzmê derket holê û dûre jî xwe bi ser wê taxima ku bi xwedaperestiya xwerû ya dinyanexwestan (zahidan) naskirî bûn sepand, ev jî demekê serî hilda ku ne dihat kirin berfirehiya asta hizrî ya sofiyekî bê derbirîn. Lewra jî ew bîr û nerînên ku derbarê têrma Sofîzmê hatine berçavkirin çend baweriyên biguman yên bêbingeh in. Çimkî têrm bi xwe ji aliyê sofiyan ve nehatiye bikaranîn, belkî ji aliyê kesên dî û aliyên din ve bi ser wan de hatiye sepandin. Neku her ev komekê ji sofî bi hevsengî yan beramberî xwedaperest û zahid û nimêjxwênan daniye û her ev yek jî wek xala cudahiya navbera Sofîzm û Îrfanê de daniye. Li vir nerastiya vê baweriyê derdikeve, li gor Seyd Yehya Yesrebî, çimkî Sofîzm bi baweriya navborî "*Mebesta wê ne xwedaperistin û nimêj û rojî û tew ne dîn jî bû*"[21]

Ev jî tê wateya ku Sofîzm her carê bi awayekî û bi rengekî xwe ligel bîr û bawerî û hizrên curbicur nîşan daye û meydana xwe ya hizrî û felsefî hino hino berfirehtir kiriye. Merc e dema kesek bixwaze bi bîrokeya hirîpoşî Sofîzm û Îrfanê ji hev cuda bike, divê Cuneyd û Helac û Bayezîd û Rabîe û arîfên din yên mezin ji bîr û hizra xwe derxe û wan bixe rêza gelek hirîpoş û zahidan ku tu tiştekî nû pêşkêşî cîhana hizrî nekirine. Di encamê de ewa cihê baweriyê be Sofîzm û Îrfan ne hêjayî ji hev cudakirinê ne, belkî tenê di bikaranîna navê wan de ji hev cuda dibin. Dabeşkirina Sofîzmê ji bo du beşên bîrokeyî û kirdeyî (teorî û pratîkî), ji bilî pencereyekê bo çûna nav mijara hizrî û waçan (elkelam)ên îrfanî ne tiştekî din in…..

Bayezîdî Bustamî ti cudahiyek di navbera sofî û arîf de nedaniye, hertim têgeha arîf li şûna sofî bikar aniye, lê berovajî (zuhd)ê ji Sofîzm û Îrfanê cuda kiriye û di vî warî de gotiye: Got ji bo min qet ji wê ne baştir e, ku xwedan hîç be ne xwedan xwedaperistin e û ne xwedan zanist û ne kirde, dema xwedanê gişî be ligel giştî dibe û

[21] - Seîd Yehya Yesribî, *Dîn û Îrfan*, Entişarat Ferheng û Endîşey Îslamî, Têhgran, 1379, r. 286.

got ew çîrok kar divê û nivîskar bi xwe tiştek ji destê wî nayê û got arîf "aşiq" ji marîfetê dibêje û di kolanan de digere heta mearîf "maşûq" derdikeve. Mearîf "maşûq" nûnerê arîf e "aşiq" û arîf "aşiq" nagihe bi marîfetê heta ku bîra mearîf "maşûq" neke…herwiha di heman cihî de gotiye: "*Arîf difirre û xwedaperistina xwe pê re dike*"[21]. Bi heman şêweyê li cihekî din jî dibêje:"*Arif "aşiq" bi tutiştî dilxweş nabe, ta negihe bi mearîf "maşûq" dildara xwe* "[22]

Sufyan Sewrî di nasandineke kurt de bixwe hezkirîtirîn kes bûye di vî warî de di tevahiya nivîsandin û bîr û baweriyên xwe de cudahî di navbera (zuhid) û (sofî) de kiriye û sûd jî ji du têrm an têgehên sofî û arif wek hevwate wergirtiye û gotiye: "*Xoşewîstirîn kes pênc kom in zanayekî xwedêperest û "melayekî sofî û samandarekî nefsbiçûk û hejarekî şikrdar û derûn pakekî sunet"* [23]

Tevî ku ji wan pênc komên ku hatine navê arif nehatiye, lê mumkin e bê gotin ku têgeha sofî ku di wan pênc koman de hatiye hevwate ye ligel (arif), bi şêweyeke zelaltir, neanîna navê arif di wê dabeşkirinê de, ji bilî hevwatebûna sofî û arif di bîr û baweriya Sefyan Sewrî de, tu wateyeke wê ya din tune. Zalnun Misrî û Buşra Hafî û Îbrahîm Edhem û çend kesên din têgeha sofî û arif wek hevwate bikar anîne

Bi baweriya Yehya Yesrebî, cudahiya navbera sofîzm û îrfanê bi temamî ne zelal û ne rewşen e û gelek bîr û baweriyên cihêreng tê de cih digirin. Hinek bi sedema parastina arîfan hezkirina xwe ji tohmetbarkirina wan û herwiha bi sedema pîrozragirtina zanayên dînî ew dabeşkarî kirine, zelal e jî" *ji sedsala duyem a koçî bi şûnde sofîzm û îrfan bi yek wateyê sûd ji wan hatiye wergirtin û ne pêkan e ji hevdu bên cudakirin*"[24] Lewma bi baweriya me jî bê binema ne, tu belgeyeke selmandî tune cudahiyê navbera sofîzm û îrfanê bike, bi şêwazeke zelal û rewan, ev di aliyê teorî de, lê di aliyê pratîkî de (kirdarî) pêkan e cudahî bi indazeya hejmara sofî û arifan hebe, çimkî her sofiyek û her arifek li gor têgihîştina xwe li hember meseleya erkên îlahî tevgeriyaye. Lê belê di aliyê

---

[22] - Ferîdaldîn Etar Nîşawpurî, *Tezkîret alewlya*, Teshîh Rênold Nîklson, Çapê Duwem, Entişarat Dinyayê Kitab Têhran1370,r. 85.
[23] - Fredeldîn Etar Nîşapurî, *Tezkîret Alewlya*,r.193.
[24] - Seîd Yehya Yesribî, *Dîn û Îrfan*, r. 33.

teorî de, herdu yek tişt in, lê ji navçeyekê heta navçeyeke din mumkin e dîsa cudahiyeke biçûk derkeve holê.

### 1.1.4 Cudahiya di Navbera Irfan û Dîn (Olê) de:

Ewanî irfanê bi vî awayî tarîf dike: "*irfan zanistek e guh dide (wîlayeta) rasterast û dîtina (şahidan) û nêzîkbûnê û pêwendiyê û irfan beşa pêwist a dîn e*" [25]

Seyd Heyder Amlî dînê îslamê wek irfana petî û xwerû dijmêre û Xezalî jî Irfanê wek dînê petî û xwerû dibîne û Mewlana irfanê wek navik û sîsika dîn dibîne û li hember van jî Ibn Erebî xwedayîbûna dîn û mirovîbûna îrfanê ji hev cuda dike.

Ibn Erebî bi xwe yek ji zana û kesayetiyên pile yek ên Îslamê ye. Baweriya wî bi hemû rave û şîroveyan heye, lê nerîna wî wiha ye ku dîn û îrfan du tiştên cuda ne. Ew ekolên ku hatine avakirin li ser lêgerîn û rêvebirin (rêveçûn û reftar) û giraniya çêj û rahênanê ji dînan in ango girêdanî olan in. Dînên esmanî li ser hîm û bingeha (wehî-siruş)ê wek dînê xwedayî dibîne û di vî warî de dibêje: "*Dîn du cure ne, cureya yekem dînê îlahî û cureya duyem jî dînê mirovanî ye. Dînê îlahî ew e ku Xweda û pêxember û cînişînên pêxemberan xelk jê re bangewazî kirine, lê dînê mirovanî ew e ku mirov bi xwe ew afirandiye û Xwedê jî mora erêkirinê lê xistiye.Dînê îlahî Xwedê hilbijartiye û di ser dînên dîtir re daniye…nîşaneya rehbaniyet û giraniya çêj û rahênanê mirov dahênan kiriye û afirandiye, çiyayek ji şîretkarî û rêçik û rêbazan li ser hîm û bingeha hîkmetê hatiye danîn. Ti pêxemberekî bi xwe bi awa û rêç û rêbazên naskirî bi navê hilbijartin (mîsyonê) nehatiye ragihandin.Lê ji ber ku kok û bingehên wî bi naveroka destûra îlahî re teba ne û ne hevdij in. Xwedê jî ew wek dînê îlahî û rewakirî mor kiriye. Mirov jî bi peyketina wê giraniya rahênanê bextewer bûne û bi dijayetîkirina wan jî dibin sedemê nerazîbûna Xwedê*" [26]

---

[25] - Etaella Tededîn, *Cilwehay Tesewif û Îrfan Der Îran û Cehan*, r. 23.
[26]-Seîd Yehyî Yesribî, *Dîn û Îrfan, r*. 58- 59.

Klemensonîrfanê di ser îmanê re digire û bawer dike ku "*bîrmend û mesîhiyekî rasteqîn e, paralelî îmanê dide ser şopa îrfanê û hewl dide wê bidest bixe*"[27] Ev jî wê yekê nîşan dide ku îrfan ji ola Îslamê tenê nehatiye wergirtin û ti mezheb û tayifeyek ne xwediya wê ye, lê ew zikmakî ye û her bi xwe dikare bi awayekî serbixwe hebe.

Estyes dibêje: "*Bi awayekî asayî her arifek di kultûrekê de halên xwe hevaheng bi dînekî re ku di hembêza wê de perwerde bûye, şîrove dike*" [28] Navborî tew li ber çav girtina wê yekê ku irfan rewşenbûn e (îşraq) e pirsyara “gelo irfan di bingeha xwe de îrfanî ye” diguhere û dike gelo dîn di bingeha xwe de îrfanî ne. A.A.Bert jî digihe wê "*encama giştî derbarê têkiliyên îrfanî ji aliyekî ve û dînên fermî (Mesîhiyet û Budîst û…hwd) ji aliyekî din ve, ew e ku irfan di hemûyan de serbixwe ye. Yanî mumkin e bêyî tu dînekî ji dînan jî hebûna xwe biparêze*"[29.]

Bi kurtî em dikarin bêjin Îrfan ne tenê dîn e. Mercê here sereke yê dîn misogerkirina dîdara Xwedê li dinyaya axiretê ye. Arif li ber bidestxistina wê dîdarê ranaweste, lê bi rêwresm û hin kirdeyan dest pê dike ku wan kirdeyan di ser ferzên dînî re digire. Lewra mumkin e ew nerîn jî bê nîşandan, eger merc be irfan û dîn yek tişt bin hingê diviyabû tevahiya mirovayetiyê, ewên ku misilman in li dinyayê li ser wê rêbazê bin, yan hemû arifên cîhanê bi hemû dînên cuda jî dibûn misilman. Bi wateyeke dîtir îrfan û dîn du tiştên cuda ne û mumkin e bê gotin têkiliya irfanê bi dîn re tune, binavkirina sofîzm û îrfanê wek hîkmetê ji aliyê şêxê îşraqê bi tena serê xwe cudahiya irfanê ji dîn nîşan dide.

### 1.1.5 Çavkaniyên Sofîzma Îslamî

Pirbûna terîqetan, bîr û baweriyên cuda û tew hevdij derbarê Sofîzmê derxistiye holê û ev bi xwe berfirehiya xeleka hizrî ya wan terîqetan nîşan dide. Sofîzm rabûn û tevger e ber bi lûtkeyê, tevgerek e ji nizmtirîn û bêmirêstirîn pileya mirovatiyê ber bi bilindtirîn pileya bilind nîşandana kamilbûna Xweda pêgihîştin e, armanca rêya Sofîzmê

[27] - Mihemed Îlxanî, *Tarîx Felse Der Qern Weset û Rinesans*, Entişarat Ferheng û Erşedî Îslamî, Tehran, 1383, r. 54.

[28]- Seîd Yehyî yesribî, *Dîn û Îrfan*, r. 286.

[29] - Çavkanîya Berî, r. 286.

ne gihîştin û pêwendiya ligel Xwedê ye, lê armanc bi Xwedê bûn bi xwe ye. Ji bo gihîştina bi wê kamilbûna mirovayetî bi tena serê xwe tenê ew pileya bi Xwedê bûn e çend rê û rêbazên wê yên cuda cuda hene (Rêya ber bi Xwedê bi qasî hejmara nefs an giyanên mexlûqan e `aferîdeyan`) rêya gihîştina bi rasteqînê ne tena rêyeke berteng e ku bi biçûktirîn jirêderketin negihe armancê, lê her kesek û bi her cure û rêbazekê dikare pê bigihe (Rêya ber bi Xwedê bi qasî hejmara nefs an giyanên mexlûqan e `aferîdeyan`).Rêyên gihîştina bi Xwedê bi qasî hejmara nefs û mexlûqan in. Rêya gihîştina bi Xwedê ne rêyeke berteng e bi piçek derketina ji wê rêyê bi aliyekî de bikeve, lê her kes bi her rê û şêwazeke taybet dikare rêya rasteqîn bibîne bibe xwedayî. Bi têbînî kirina bi berfirehiya asta têgihîştina wê gotinê, Hellenist, realist, idealist, û ji bilî van jî bi her baweriyek û dînek û mezhebek ji famkirin û dîtina rasteqîniyê û gihîştina bi Xwedê cureya pêwendiyan bi Xwedê ve ne bêpar e. Dînê Îslamê ne dînek e tenê ku rizgarker be, lê her dînek, yan her riwange û bawerî eger merc jî be xwediyê dînê taybet jî nebe û tew riwangeya zanistdostî (felsefe) û baweriya xwe ya taybet hebe û bawer be her ewqasî besî wê ye, ku dikare di dîtina rasteqînan de beşdar be, bi wateyeke dîtir rêya îrfanê, yan sofîzmê rêya wan hemû rêbazan e û giştgir e.

Çem û aveke rewan e û bi zevî û mezarên hemû bîr û bawerî û hizrên cîhanê de derbas bûye û her kesî li gor pêwistiya xwe sûd jê wergirtiye û ji şeraba wê ya rasteqîn vexwariye. Bi vî halî jixwe mumkin e wek hinek lêkolînvan an sofî bi xwe di wê baweriyê de ne ku Sofîzm tenê ji Quran û sineta pêxember hatiye wergirtin, gelo mumkin e hemû bîr û bawerî ne îslamî bin, gelo em dikarin Sofîzmê bi tevahî ji Quran û sinetê bêpar bibînin, gelo mumkin e em bawer bikin Sofîzm û îrfan bi tevahî ji dînan û şaxên din ên ji bilî dîn hatine wergirtin? Yan bi wateyeke din em wan wek perwerdeya destê ola Mesîhî bibînin û tenê Mesîhiyetê wek sedemê derketina Sofîzma îslamî bibînin?

Destpêkên Sofîzmê di Îslamê de bixwe di destpêkê de bi hedîs û ayetan dest pê kir û hino hino bi dînên rabirdû û bîr û baweriyên zanistdost (feslefî) û tew hinek reftarên neolî jî xemilandî bû.Ew şitla nû ya hizra rizgariyê ji temamiya çavkanî û bingehên çi dînî û çi nedînî bû. Bû dareke stûr, her rojê liq û şaxên wê serê wan digihîşte esmanan û

berhema wê bêhtir û bêhtir dibû. Bi awayekî hemû dinyaya îslamî û tew dinyaya Ewropayê jî nuximand.

Humayî bi sûdwergirtina ji tedeyyûnê baweriya wî wiha bû "*Xweparêzî, zuhid haletek e di hemû dînan de hebû û di nav hemû neteweyan de bi cureyekî taybet nimûneyên wê derketine, lewra di dînê îslamê de jî xwe bi rengê Sofîzmê nîşan da*"[30]Rabit hiyom dibêje*: "Ola Îslamê jî wek her oleke dîtir çend arifên taybet bi xwe hebû. Misilmanan bixwe sofî ji wan re gotiye. Nêzîkiyeke berçav di navbera sofiyên misilman û Mesîhiyetê de tê dîtin.Di nav sofiyên navdar ên misilman de bi dirêjiya dîrokê hinek derwêş ku taybet bûn bi terîqeta wan li hawirdora wan kom bûne. Û cîbicîkarên fermanên wan bûn. Van jî wiha kir ku raya giştî û bala xelkê bikşînin û cemawerekî zêde li dora xwe kom bikin. Gelek bîr û bawerî hene ku bawer dikin Kok û bingehên Sofîzma îslamî ji îrfana mesîhiyetê û hizra nû ya Platonî û Sofîzma hindî çavkanî girtiye"*[31]Bi baweriya sofiyên misilman hîm û bingeh, yan koka Sofîzmê vedigere dema jiyana pêxember (S.X).

Sofîzm bi wateyeke giştî ji curekî xwedêperistin û giraniya çêj û rahênanê hatiye sazkirin ji teqwa û xweparêzî û zuhidê ye. Ji bo vê mebestê jî mînak kêm zêde ji hemû dînên din wergirtiye. Wek îraniyên kevin û hindî û çînî û yewnaniyan. Van bixwe jî gelek kirde encam dane ku mirovên asayî mitûmat mane, çimkî ew kirde ji hizrên xelkê cuda bûn û daxwaz ji xelkê kirine ku xwe ji xweşiyên dinyayê dûr bigirin û xwe bihepişînin nav tekye û xaneqayan û di xilwetê de bin û guh nedine nefs û hewes û arezûyên xwe û derûna xwe pak bikin.

Ev kirdar di piraniya dînên din de jî tên dîtin, lewra jî ne mumkin e wek liqekî, yan ser bi dînekî taybet bê danîn. Lê ruhê xwedêperistinê di her dîn û neteweyekê de peyda bûye û bi awayekî ji awayan mînakên wê hebûn û di her dînekî de bi navekî hatiye binavkirin.Di Îslamê de jî, navê Sofîzmê li ser hatiye danîn. Guman jî tê de nîne

---

[30] - Etaella Tedeîn, *Cilwehay Tesewif û Irfan Aer Îran û Cehan*, r. 346.
[31] - Rabert Hyom, *Edyan Zindey Cehan*, Tercumeyî Ebdulalrehîm Gêdas çapê Nuhum, Neşrê Ferhengê Êslamîyê Tehran, 1379, r. 373.

ku bandor û karîgeriya felsefeya îraniyên kevin û hindî û yewnaniyan li ser vê Sofîzmê hebû.

Tevî pejirandina wan gotinên li jor, Humayî *dinivîse: "Tevî wê pişaftin û tevlîhevbûna hizrî bi bîr û baweriyên ruhî yên gelên din, Sofîzm bi wateyeke taybet, rabûneke hizrî ya nû ye li jêr ala Îslamê pêk hatiye û şêweyeke taybet û serbixwe wergirtiye û mumkin e wek milkê Îslamê bê hejmartin*." [32]

Martin Lings bixwe di destpêkê de kesayetiyeke mesîhî bû dûre bû misilman, her di vî warî de nerîna piraniya lêkolînvanên rojava tîne û dibêje bi baweriya wan Sofîzm di her dînekî de serbixwe ye, lê Martin Lings berovajî nerîna wan e û dibêje: Baweriya wan lêkolînvanan bi tevahî berovajî ye, çimkî sofî ji resenî û hêza wan a livîner bêpar kirine û ji deryayekê ber bi cokika deskird a dûr ji deryayê danîne. Ew cokikan wek îrfana arifên nemisilman şîrove dike li ser îrfana îslamî bandora wê hebû, lê ew bandor û karîgerî têkildarî qaşilê (qalikê) tenê bû, lê ne bi naverokê re, ji ber ku "*îrfana îslamî beriya wan cokikan hatiye avakirin.Bi baweriya Lings îrfana îslamî girêdana wê tevahî ye bi (wehî-siruşeke) taybet ku ji hemû tiştên dîtir serbixwe ye û dûre bi belgeyên olî û hedîsên pêxember (S.X) guhdan pê hatiye kirin, herwekî çinîna gulan ji baxên din jî jê re şîn hatibû*. [33]Bi baweriya Lings, taybetkirina irfana îslamî ligel cîhangîrbûna Îslamê hevdij dernakeve.Lings hemû îrfana arifên cîhanê wek tîrêjekê di xeleka hebûnê de dide nasîn. Ku hemû ber bi (navend- nihênî rasteqîne) gav diavêjin heta ku ji wê xelekê nêzîktir dibin, di warê hizrî de jî ji hev nêzîk dibin û di dawî de di xala rasteqîn û nihênî ya xelekê de dibin yek xal û navenda xeleka Xweda a tîrêjder ku naveroka rasteqîn e.

[32] - Celaledîn Homey, *Tesewf der ,Êslam*, Çapê Duvum, Êntêşaratê Hemê, Tehran, 1366, r64- 66.
[33] -Ebdul Refîq Heqîqet, *Tarîx Îrfan û Arêfan Îranî*, r 56.

### 1.1.6 Nêrîna Irfanî ya di derbarê zanist, Dab û nerîta (kevneşopiya) xaneqayê:

Fon Kremez "*çavkaniya Sofîzmê vedigerîne ser (Buda) yê Hindî*"[34]

Hartman pir baweriya wî bi" *kartêkirina Hindiyan dihat û Horten jî di wê baweriyê de ye ku Bayezîd û Cunêd û Helac di bin bandor û karîgeriya (Birehmen)an û (Hindiyan) de bûn*"[35].

Asîn Plasyos û Nesink û Torandra jî "*Karîgerî û bandora Mesîhiyetê di bicîhatina irfan û Sofîzmê de li ber çav girtine*."[36]

Merks û Niklson dibêjin:"*Derketina irfan û Sofîzmê ji bîrokeya nû ya Eflatonî dest pê dike*"[37] Winfeld û Brawin jî *"Reh û kokên Sofîzmê dibin ser feslefe ya nû ya Eflatonî"* [38]

Etawallah Tedeyyûn karîgeriyên hizra Budayî û fikrên nû yên Platonî li ser Sofîzma îslamî dûr dibîne û tew xwe jê bêrî jî dike.

Nivîskarên Îşraqî jî ku bi tena serê xwe têkilîheviyek ji du qutb (cemserên) farisên kevin û fîsagorsiyan bû, hertim sîberên wan li pêşiya çavê arifên îslamî bi awayekî ji awayan winda nebûye.

*Zwalnun Misrî û Ebûsehil Tstrî ser bi cemsera Platonî Fîsagorsî û Bayezîdî Bîstamî û Helacû Ebûlhesen Xirqanî ser bi cemserê farsî kevin bûn*." [39]

Baweriya Mergs "*bi karîgeriya hîkmetên yewnanî hebû. Baweriya Karadû bi kartêkirin û bîr û baweriyên dînê mesîhî û hîkmetên Yewnanistanê û dibistanên Hindî û îranî û tew yahûdî jî hebû*"[40].

---

[34] -Ebdulhuseyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiye*, Çapê Yazdehum, Entişarat Emîr Kebîr, Tehran, 1383, r. 13.
[35] -Çavkanîya Berî, r. 13.
[36] - Ebdulrefîq Heqîqet, *Tarîx Îrfan û Arifan Îran*, r. 56.
[37] -Ebdulhuseyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiye*, r. 13.
[38] - Hena Faxurî û Xelîl Cer, *Tarîx Felsefe Der Cehan Îslamî*, Tercumey Ebdulhemîd Ayetî, Entişarat Emî û Ferhengî, Tehran, 1386, r. 285.
[39] -Ebdulhusêyn Zêrîn Kub, *Erzêşê Mîrasê Sofiyê*, r. 13.
[40]-Seîd Yehyî Yesribî, *Dîn û Îrfan*, r. 42.

Hinek rojhilatzan û çend lêkolînvanên wek Ibn Xeldûn "*çavkaniyên îrfan û sofîzmê li ser hîm û bingeha (Wîlayetê) yan di mezheba şîe de wêne kirine*"[41]. Sofîzm li ba ehlê sinet û cemaetê di çarçoveya ruh û xwedêtirsî û teqwayê de dizîvire. Lê li ba mezheba şîe tewereke dîtir lê zêde dibe, ku ew jî hîm û bingeha sereke ya wê mezhebê ye û ew jî (wîlayet) û hezkirina îmaman bû û heta radeyekê bi şêweyeke zêdegavî bû. Bi riwangeya mezheba şîe "*Îmam hertim pêşewayê wan bû û di hemû qonaxên jiyanê de emr û nehiyên wî bê dudilî pêwist e bêne cîbicîkirin. Îman li ba sofiyan, wek îmamê dewranê, welî emr, qutb, pîrê kamil, yan mirovê kamil tê ravekirin.*"[42]

Ibn Xeldûn bawer dike ku babeta qutbîtî û ebdalî ji bîr û baweriyên şîeyên Îsmaîlî hatiye wergirtin û li hember îmam û rênîşander radiweste û rohntir jî dike hirîpoşên (sofîger) Iraqê ji bo dirustkirina hevkêşeyekê di navbera îmam bixwe, rênîşander qutb qutkirine û li hember neqîb (rênîşanderan) jî ebdal (pîr) anîne holê. Herwiha "p*êwendiya sofiyan bi Îmamê Elî (Xwedê jê razî be) red dike û bi bîra me tîne ti yek ji eshabeyên pêxember rêçik û rêbaz û terîqeta wan a taybet nebû, lê ew xwedaperisttirîn kes bûn û rêberên kesên dîtir bûn, bêyî ku beşek ji dîn cuda bikin û xwe ji misilmanên dîtir ciyawaz nîşan bidin*"[43].

Bi çespandina hevşêweyekê di navbeyna wan herdu teweran de, dîsa ne mumkin e em bîrokeya Sofîzmê vegerînin ser (teşeyyuiê - Şîebûnê), karîgeriya mezheba şîe ji destpêka Sofîzmê ve diyardeyeke bêguman e, lê bi awayekî tevahî jî nebû. Çimkî pêwist e bê gotin" *îmamên şîe 12 îmam bi taybetî Îmamê Sadiq ku di edebiyatên şîe de hatiye binavkirin, amaje dide dijatiyeke berdewam a îmaman bi sofiyan re*"[44]hewisa "*Miqdus Ardbîlî di salên 999 koçî de koça dawî kiriye û Mîrza Hisên Nûrî û Mihemed Baqir Meclsî di salên 1110ê koçî de koça dawî kirine û Mela Tahir 1098ê koçî de koça dawî kiriye" Bi dehan feqe û gotin û bêjeyên din bi Sofîzmê re dijatiyeke wan a berdewam*

---

[41] - Celal El dîn Homayî,*Tesewf Der Îslam*, r. 63.
[42] - Ebdulrehman Ebin Xeldun, *Moqedemêyê Abên Xeldun*, Tercumeyê Muhemed Pervîn Kenabadî, Çapê Heştum,Êntêşaratê Êlmî û Ferhengî, Têhran, 1375, r. 983- 984.
[43] - Seîd Yehyî Îprebî, *Dîn û Êrfanê*, r. 42-43.
[44] - Etaalla Tedîn, *Cêlvêhayê Tesewf û Êrfan der Îran û Cehan*, r. 332.

*nîşan dane"*[45].Petroshevsky "*derketin û peydabûna Sofîzmê di çarçoveya dînê Îslamê de dibîne û her wê jî wek rewta kamilbûna wî dînê mezin dibîne*"[46].

Quşîrî çavkaniya sofîzma îslamî li ser hîm û bingehên fêrkarî yên Quran û hedîsên pêxember (S.X) wek wêneyekê li hember kirdeyên sofiyan dideyne. Li hember vê baweriyê jî, Niclson bawer dike "*rabirdûyeke sofîzmê ligel îslamê tune, lê ji hinek ji çavkaniyên neîslamî hatiye wergirtin û tenê beşekî wê yê biçûk vedigere bo fêrkariyên quranî û îslamî*" [47] Suhrewerdî di Ewarif el Mearif' de dibêje: Navê Sofî di Quranê de nehatiye, lê di hejmareke zêde ya ayetan de amaje bi sofiyan hatiye kirin û pesinê wan daye.

Bi baweriya hinek nivîskaran Sofîzm di sedsala yekem a koçî de peyda bû û teşe girt, di rewşekê de karîgeriya fîlosofên yewnanî di destpêkên sedsala duyem a koçî de ket ser wan. Ev jî bi saya wan felsefeyên ku hatin wergerandin ser zimanê erebî û her ev jî bû sedem ku sofîzm di wê serdemê de ji hizrê yewnanî bê cudakirin. Yek ji jiyannûsan "*têgeha misilman û îmandar û xwedêperist û sofî wek hev dideyne û sofîzmê ji her cure felsefeyeke hindî, yewnanî…hwd dûr dibîne*"[48]

Keywan Qezwînî nivîskarê (irfan name) destpêka îrfan û sofîzmê di dawiyên sedsala yekem de dijmêre û heşt kesan jî wek wê serhildana hizrî dibîne û yek li pey yekî navê wan rêz dike. Ew kes jî pêk tên ji "*Weys Qernî, Herm Bin Can, Hesen Besrî, Amir, Ebû Muslim, Mesrûq, Eswed Bin Zêd û Rebî Bin Xesîm*" [49]

Teha Ebdilbaqî Sirûr di pirtûkekê bi navê (Helac Şehîdê Sofîzma Îslamî) de dibêje "*Peydabûna sofîzmê ji Quran û reftara pêxember çavkanî girtiye û bi baweriya navborî dûre sofîzm ber bi aliyê netewe û dîn û mezhebên cuda cuda de çûye, tew bi aliyê rojhilat û rojava de çû û li ser bingeha rastiya xwe, ku Quran û sinet bû*"[50].

---

[45] - Etaella Tedîn, *Cêlvêhayê Tesevuf û Êrfan der Îran û Cehan*, r. 332.
[46] -Çavkanîya Berî, r. 336-337.
[47] - Çavkanîya Berî , r. 327.
[48] - Çavkanîya Berî, r. 24.
[49] - Ebdulbaqî Sruş, *Helac Şehîd Tesevufê Êslamî*,Tercumêyê Huseyn Derayê, Êntêşaratê Esatîr, Têhran,1372, r. 33.
[50] -Ebdulhusêyn Zêrîn Kub, *Erzêşê Mîrasê Spfiyê*, r. 14.

Zerîn Kub derbarê derketina sofîzmê ji çavkaniyên neîslamî dibêje "*Hin çavkanî û bingeh hene ligel hinek hizr û bîr û baweriyên neîslamî pêwendiya wan heye û jixwe dibe ku di hinek cihan de ji wan wergirtibin, lê ti yek ji wan lihevçûnan amaje bi cihê sofîzmê nake*"[51].Navborî digihe wê encama ku sofîzma îslamî ne berhema ti yekê ji van lihevçûnan bû, lê bi xwe pelekî serbixwe ye û çavkaniyên wê jî Quran û hedîs in. Sofî jî hinek caran çavkanî û kokên xwe vedigerînin ser eshaban û bi taybetî jî Îmamê Elî û eger ne wiha bûya ew rewt bêhn û hilma wê ya îslamî nedibû." *Îmam û feqiyên mezin wek Îmamê Şafiî û Ehmedê Kurê Henbel û Îmamê Xezalî bi çavê çespandinê li wan temaşe ndikirin, sofîzma îslamî bi awayekî ye, eger em şax û paxên neîslamî jê cuda bikin, dîsa bi tena serê xwe xwediyê rê û rewiştek bilind û ruxsareke ronak e*"[52]. Lê Zerîn Kûb piştî mijareke kurt derbarê kirde û reftarên sofiyan dibêje "*Kirdeyên sofiyan û pêxember (S.X) wek hev in û ne berovajî hev in. Heman tişt in ligel xweparêzî û zuhidê û xwehînkirin (rahênanê.) Tevî ku karîgeriya kultûrên neîslamî jî li ser wan hebû, jixwe eger ev karîgerî nebûya, êdî qet îro tiştek bi navê sofîzmê û kesên wek Eyn el Qada û Mewlewî û Şebstrî û Xezalî nedibûn*" [53]

Zerîn Kûb wek nivîskarek navdar di wê baweriyê de ye ku mijara peydabûna rasteqîn a sofîzmê îslam û Quran e û çavgirtina ji vê mijarê rewa nabîne, herçiqasî karîgeriya hinek babetên din li ser hebû wek mînak zanist û huner û şaristaniyet…hwd, lê divê ew yek li ber çav bê girtin ku lêborîn (tolerans) û hêsankarî (tesahul) ku du kirdeyên sofiyan bûn hertim cihê ziyanê nebûn, lê pir caran dibe sedema pêşketin û pêşveçûnê. Herwiha ew babetên (zanist û huner û şaristaniyet) pêwendiyeke wan a berçav ligel aliyê ruhî û bawerdarî (bawermendî) yê wan tune, lê babeta sofîzmê di nav dil û derûna bawerdarên dînî de cihgirtî bû. Tevî ku hinek babetên neîslamî jî xwe qît dikin di navenda sofîzmê de, wek bilind ragirtina pileya pîr û şêx di ser a pêxemberan re, tew yek bûn ligel xweda û behs û xwesteka nûra Mihemedî û…hwd ti yek ji van reheke wî ya îslamî û quranî nîne û nebûye ti ayeteke eşkere û hedîseke dirust ji bona

---

[51] -Ebdulhusêyn Zêrîn Kub, *Custêcu Der Tesewfê Îran*, Çapê Çaharum, Êntêşaratê Emîr Kebîr, Têhran, 1369,r. 21.
[52] -Çavkanîya Berî, r. 21.
[53] -Qasim Xenî, *Tarîx Tesewf Der Îslam û Tetetewrat û Tehewlat*, r. 59- 60.

wan nebûye, heta wek wê baweriya jirêderketî tekez bike. Em di vê nivîsara li ber destê xwe de dixwazin radeya dijatî û hemfikirbûnê ligel van cure bîr û bawerî û hizran zelal û rohn bikin.

Bi awirdanekê li ser wan baweriyan em digihin wê yekê ku bêjin: Zalnun Misrî, Helac, Şiblî, Bayezîd ev arif hemû bi awayekî baweriya wan bi bingehên (wehdeta wucûdê) hebû û ji bilî xweda tiştekî dî nedidîtin. Zenun yekem kes bû daku ji nav lepê rexneya rexengiran rizgar bibe pena xwe bir ser nihêniya sofîzmê, Cuneyd jî ew berfireh kir û Şîblî ew bir ser minareya mizgeftan Cuneyd jî digot " *me ew zanist û derzên xwe di quncikên avsark û malan de bi nihênî digotin, Şîblî hat û li ser mînberê ragihand û eşkere kir. Bi saya wê jêhatîbûna wî Bayezîd hat û hizra yekîtiya hebûnê ragihand û bû bi rêberê rêbwarên suker Mensûrê Kurê Helac zêdegavî kir û dengê "Ena el Heq" bilind kir. Zenun Misrî şarezayiyeke wî ya baş di zanista kîmya û felsefeyê de hebû û bi taybetî jî sûd ji felsefeya nû ya Platonî wergirt û aliyê felsefeya sofîzmê bi destê kesên navdar wek Xezalî û Ebûhamid û Ibn Erebî û Sehrewerdî hat geşkirin. Qewl û pêrewa navbera şerîet û sofîzmê li ser destê kesên wek Quşîrî û Serac û Hicurî û Ebûhamid û Xezalî hate kirin*" [54]

Yan Ripka di pirtûka (Tarîx Edebiyat Îran) de li ser zarê Arberî ve dibêje: Niclson di dawiyên jiyana xwe de bi tenê hêmaya nû ya Platonî wek çavkaniyek ji sofîzmê re hejmart û her ew amaje jî bûne sedem ku Alwîs Masînyon baweriya wî wiha bû çavkaniya sereke ya sofîzmê ola îslamê ye, lê piştî xwendin û têgihîştin û nirxandina temam bo babetê gihîşte wê nerîna ku hizra mesîhî û felsefeya yewnanî karîgerî li ser sofîzma îslamî kirin Arbery pevguhertina hizrê serbest yê zahidên misilman û mesîhî di sedsala duyem a koçî de texmîn kir û hokarên dîtir wek Platonî û Fîsagorsî û Heremsî û Gnosî û ji wan bîr û nerînan bûn ku karîgeriya wan li ser bîr û baweriyên îslamî hebûn, lê di destpêkê de karîgeriya ola mesîhî li ser hebû. Asîn Plasyus jî bi temamî bawer dikir ku karîgeriya ola mesîhî li ser felsefe û îrfana îslamî hebû, Horten derbarê dizekirina hizra hindiyan diaxive û ji aliyekî din ve jî raya wî wiha ye "*ku îranî hejmartina sofîzmê*

[54] -Yan Rîpka, *Tarîx Edebyat Îran*, Celd Ewel, Eercumey Ebu Qasim Horî, Entişarat Suxen, Tehran,1383, r. 417- 418.

*xeletiyeke kujer e, çimkî neteweya Ereb jî bi awayekî ji awayan di wê bizavê de beşdar bû. Ne mumkin e ji hizrên ereban çav bê girtin û ew karîgeriya mezin a Ereban bê înkarkirin. Herçiqasî helbesta farsî di wateyên xwe yên herî kûr de, xwe ji bo sofîzmê terxan kiriye*"[55]

Di encamê de bi têbînîkirina wan hemû bîr û baweriyên ku li ser peydabûn û çavkaniyên sofîzmê hatine nîşandan, em dikarin bêjin Quran û sinet û dînê mesîhî û çavkaniyên Îrana kevin û hizra nû ya Platonî û Fîsagorsî û Manewî û Gnosî û Hellenistiyan û hîkmeta Îşraqê û…hwd ti yek ji van bi tena serê xwe û bi şêweyeke rasterast nikarin di peydabûna sofîzmê de bi rolekê rabin. Lê heta radeyeke kêm an zêde bi awayekî şert û mercên jîngehî û çandî û ramyarî û mezhebî û civakî û karîgerî hebû li ser derketin û belavbûn û guherîna hizra misilmanan. Bi wateyeke dîtir sofîzm û îrfan peydabûneke zikmakî û serbixwe ya cîhanî ye û têkildarî ti dînekî nebû û dîroka wê jî li ser binemaya vedîtin û têgihîştin (keşf) û (şihûd) yan tecrûbeya îşraqî li ser bingeha xelwetgerî (rahênanê) tê danîn û car caran aliyên wê yê xilwetgerî bêrengtir dibe.

## 1.2 Dîroka Sofîzmê

### 1.2.1 Zuhid (Terkedinya)

Redkirina dinyayê (zuhid) û xelwetgerî (îzolebûn) di bingeh de yek bû ji kirdarên sofîzmê bi awayekî sofîzm her wek zuhid dihate hejmartin.Ji bilî xelwetgerî û xwedûrkirina ji xelkê, tiştek nedihat ber zihn û xeyalê wan.Ev tewer heta wê çaxê dirêj kişand ku hîn jî sofîzm ligel mijarên bîrokeyî tevlîhev nebûbû û her di çarçoveya bîr û baweriyên îslamî de mabû.

Her van karan sofîzm ji çarçoveya wê derxistin. Zuhida îslamî jî girt û ji kêsim û çarçoveya wê ya sereke ya îslamî derxist.

Senay giraniya çêj û rahênanê wek yek ji taybetmendiyên rêbaza sofîzmê yên herî sereke dibîne, bi wateya kedîkirina hespekî kumêt rave dike. Bi baweriya Senay, *"Rêbaza betal*

---

[55] -Seîd Mehdî Zerqanî, *Afaqhay şêir û Endîşey Senay*, Neşr Ruzgar, Tehran, 1378, r. 160.

*ji rahênanê ne kedîkirî ye û ti car û ti demê nagihe armancê û ji xeynî giyayê dojehê ne tiştekî dî ye*"[56]

Zuhid di destpêkên ola îslamê de ji ber ayetan hatiye dariştin li ser tirsê (xofê) û rewişta pêxember (sîreta resûl) û xelîfeyên raşidîn û hevalên sîfetê (eshab sîfe) bû, di destpêkê de bi zuhideke hevkêş û destûrdayî û pesendkirî dihat hejmartin, bi giştî li ser bingeha sadetî û nêtpakî (îxlas) û li dora jiyan û reftarên pêxember dizîvirî.

Îzedîn Mehmûdê Kaşanî di pirtûka (Mîsbah el Hîdaye) di beşa şeşan de dinivîse"*Guman tê de tune ku xelwetgerî û xwedûrgirtina ji xelkê di nav sofiyan de bi awayekî belav bû û tiştekî dirustkirî bû û ev jî yek ji qenciyên wan bû. Ji bilî hevalîtiyê (sohbetê) di heyama pêxember (S.X) de, dab û nerît (sinet) nebû û lewra jî hevalên wî wek hevalên (sohbet)ê girêdayî kiriye ne bi tiştekî din ve*" [57]

Ew arezûya ku dinyanexwestan ahidan di serdema Benî Umeyiye ji ber zahirperestî û zêr û zîv perestî û guherîna xelafetê bo seltenet û kêf û xweşî bûn, ev hemû di dinyaya îslamî de bûne sedema derketina hizrê redkirina dinyayê yan zuhidê." *Bi wateyeke din ev bizav wek şoreşekê bû li hember zêdegavî û bihederdan (Îsrafa) karê desthilatdarên Benî Umeyiye*" [58]

Di nîvê yekem ê sedsala duyem a koçî / heştem a zayînî "*Xorasan bû cihê derketina plangerî û şoreşê li dijî Emewiyan û di heman demê de li Sûriyê rahîbên kilîseyan û grûpên curbicur ên mesîhî ku reng û bêhna îrfanê li ser wan diyar bû, hertim di bizav û tevgerê de bûn li dijî Emewî û Asyaya Navîn jî ku bû navenda Budîzmê di rewşa derketina nerazîbûnan de bû, lêbelê li Xorasanê hêj fêrgehên dînî yên îranî di şêweya agirperestî û Manîxwazî de her ber bi geşbûnê diçû. Hîkmetên Xwedayê hindî li rojhilat û mesîhiyeta nestorî ji rojava ve di rewşa pêşveçûnê de bûn û gihîştibûn*

[56] -Mehmud bin Elî Ezedîn Kaşanî, *Misbah Elhîdayê û Mofetah Alkfayê*, be Teshîh Êfet Kirbasî û Mihemed Reza Bozurg Xaliqî, Entêşarat Zewar, Tehran, 1385, r. 115.
[57] -Ebdulhuseyîn Zêrîn Kub, *Erziş Mîras Sofiyê*, r. 45.
[58] -Yan Rêypka, *Tarîx Edebyat Îran*,r. 415.

*Xorasanê. Tevahiya van şert û mercan, daxwaza zahidan bûn, encama van karîgerî û kartêkirinan bû sedemê pêkanîna dibistana sofîzma îranî*"[59]

Ew di quncikan de şemitîn û xelwetgerî û perestin e û dinyanexwestina wan a zêdegavî bû sedemê çandina tovê sofîzmê. Rê û rêbazên wê grûpê li ser binemaya tirs (xof), xwedaperestî ya zêdegavî û îbadat hatibû danîn, piştre jî karwanê wan ber bi babeta evîn (işq) û bîra rizgarî û îrfanê birêket. Ew karîgerî jî ji ber hevsînorbûna dinyaya îslamî ligel Îran û Romê bû, bi baweriya zahidan beşekî zêde yê kirdeyên wan li jêr karîgerî û kartêkirina derveyî dîn bûn. Pêşî jî bi wêneya zuhida hindî û mesîhî dest bi lêgerîn û dev ji dinyaberdanê kirin. "*Di encamê de ev bû sedemê rakêşanê (cizbe) û jiyana tevlîhev a hestan. Tevî azara derûn (nefs) û derûnpakî (Îxlasê) di peristin û hewl û têkoşîna bo gihîştina bi Xweda de. Di encam de bi forma yekîtiya hebûnê (wehdet wicûd)ê de xwe derxist*"[60]

Lê behskirin û gengeşekirina babeta zahidan ji aliyê ereban ve "*tew beriya îslamê jî xwe nîşan daye. Ji bo vê armancê jî, (Udeyê Kurê Ziyad) wek mînak hatiye wergirtin ku di serdema Sasaniyan de li Îranê jiyaye, karîgeriya du tewerên îranî û mesîhî li ser wî hebû*"[60] Tew dinyanexwestin û quncikgirtin û xelwetê vedigerînin bo "*çaxê Deqyanusê Kelbî li Yewnanistana kevin ku hevçaxê Iskenderê Maqdonî bû*"[61].

Can Bî Nas ku lêkolînvanekî amerîkî ye di kitêbekê de bi navê (Dîroka puxt a olan) nivîsiye "*Ji bilî sofî ku di sedsala heştem a zayînî de peyda bû û nasnavê xwe ji sûf (hirî) wergirt, di çaxê Emewiyan de jî hin kes hebûn li jêr karîgeriya rêbaza xwedaperestên mesîhî navê wan wek zahidên îslamî hatiye, xwedaperest û dinyanexwestên mesîhî bi cilûbergên hirî (sûf) li dinyayê digeriyan û hejarî û parsekî dikirin û xwe spartibûn destûra Încîlê, bi vîn û xwestek û muqederata xwedawend û li*

[59] - Ebdulbaqî Gullpî Narlî, *Mulana Celal Eldîn Zindêganî*, Asar û Guzîdeyî Ez Anha Mutercêm Tufîq Sobhanî, Çapê Çaharum, Entêşaratê Pejuhişgahê Ulum Ensanî û Motaleat Ferhegî, Tehran, 1386, r. 232-133.

[60]- Şefêî Kedeknî, *Tazyanehay Sluk*, Çap pencum, Neşrê Agahiy, Tehran, 1385, r. 48.

[61] -Kamil Ehmed Nijad, *Tehlîlê Asar û Nizamê Gencuyî*, Çap Duvum, Entêşarat Peyam, Tehran,1375, r. 175.

*siberoja xwe nedifikirîn, ji ber ku Îsayê Mesîh ew fêr kiribûn ku (li siberoja xwe nefikirin, sibe bixwe lixwe difkire, xirabiyên îroya me ji bo îroya me bes in*"[62].

Ev jî heman ew diruşm bû ku li Çînê Taioistan û li Hindistanê jî Mehawîran dişopandin û xwe ji nexweşiyên dinyayê dûr kiribûn û xwe hînî birçîtî û hejariyê kiribûn, çimkî bawer dikirin ku ev kirdara wan vîn û xwesteka Xwedê ye. "Can Bî Nas" di wê baweriyê de bû ku "*Sofîzma îslamî hirî lixwekirin û sazkirina xaneqa û rûtbûn (tecerûd) û taketî (teferrûd) xwe ji rahîb û kilîseyên wan wergirtiye. Ne tenê ev belkî sema û muzîka ku di xaneqa de tê encamdan wek wergirtî ji kilîseyan dijmêre*"[63]

### 1.2.2 Çûna Zuhdê Ber bi Zêdegaviyê di Xelwetgeriyê (Îzolebûnê) de:

Terkedinya û xwedûrkirina ji xweşiyên dinyayê û berê xwedana qiyamet û gihîştina bi yekîtiya hebûnê (wehdet elwucûdê) ya reha bû sedemê terkedinya û xelwetgeriya vê terîqetê.Ew kesên ku meraqa heqîqetê dikin, tekane rêya gihîştina bi wîsala (heq) di zuhd û xelwetgerî û cudabûna ji xelkê û li şikeftê jiyanê de dibînin.

Ebû Rebî Wastî dibêje: "*Min ji Dawûd Tayî re got şîretekê li min bike. Kerem kir: Li dinyayê rojî bigire û dev ji çêja nefsa xwe berde û ji destê xelkê bireve, wek çawa ji destê şêr direv* "[64] Zahid bawer dikin, tekane rê ji bo derbasbûna ji xwestina dinyayê û jiyana dinyayê û gihîştina bi hogirî û asûdehiya derûn (nefsê), rêya xelwetgeriyê ye. Herwiha "*Armanca sereke ya zahidan xilaskirina xelkê ji destê hez û arezûyên nefsê ye. Di demekê de ku ew guh nadin xilaskirina rewşa civakê, qasî ku di fikrê dinyaya axiretê de ne. Demeke wan a kêm ji bo gihîştina bi pêdiviyên vê dinyayê heye*"[65]Xelwetgerî û îzolebûn di nav misilmanan de ne tiştekî xerîb bû. Pêxember (S.X) ji xwe re beriya (beisetê) di şikefta Heraa de maye û xelwet girtiye. Di şikeftê de mabûna wî berdewamiya wê hebû, heta wê dema ku Xwedê nûra pêxembertiyê di sînga wî ya pîroz de bi cih kir."*Sifyan Sewrî, Îbrahîm Edhem Dawûd Tayî, Fezîl Bin Eyad, Silêman*

---

62 -Etaella Tedeyn, *Cîlwehay Tesewf û Irfan û der Îran û Cehan*, r. 346.
63 -Çavkanîya Berî, r. 347.
64 -Ebdulkerîm Bin Mewaz Qoşeyrî, *risaley Qoşeyrî*, tercumeyî Ebu Elî Hosên Bin Ehmed Osman, Çap Nuhum, Entişarat Êlmî û Ferhengiy Tehran,1385, r. 36.
65 -Tunî Liyn, *Tarîx Tefker Mesîhî*, Motercim, Rubret Eseryan, Çap sêvum, Neşr Ferzan, Tehran,1386, r. 279.

*Xewas, Yûsif Esbat, Huzeyfe Mereşî û Buşra Hafî, ev komek bûn ji wan kesên ku xelwetgerî ji têkilbûna bi xelkê re baştir didîtin*" [66]

Lê ev kirde heta serdema derketina nûra pêxemberîtiyê ligel ola Îslamê berdewam bûye. Ji hingê bi şûn de êdî paşmak û şûnwarên rahênan û xelwetgirtina di şikeftê de nema. Pêxember jî ji ti yekî ji hevalên xwe re negotiye ku wî karî encam bidin.Lê emrê nekirina wê kiriye.Tevî wê rahênan û xelwetgeriyê û çil rojan rûniştina di xelwetê de, bi hênceta pêrewkirina karê pêxember armanca Sofîzma îslamî bû, ku hawara xwe bigihînin vî karî û ewqasî jî herine pêş û zêdegaviyê tê de bikin, heta endazeyekê ku bigihin asta xwe êşandinê.

Şêx Şehab el Dîn Suhrewerdî derbarê rahênan û zuhd û sofî û cudahiya wan ligel (Burehmenan) û fîlosofan dibêje:"*Eger xelwetgerî (îzolebûn) û bîr li xizmeta şerîet û pêrewkirina pêxemberê Xwedê be, ev dibe sedemê rohnkirina derûn, jixwe eger ne bi vê mebestê be, êdî xelwetgerî û bîr û zîkrê sofiyan tevî ku diçe xaneya axaftina derbarê pinhan (nepenî-xeyb) û kerametan (mûcîzeyan), ji rêya rast a Xwedê jî dûr dikevin û şeytan wan han dide, daku rahênaneke zêdetir encam bidin*"[67]

### 1.2.3 Xwe Azardan (Xwe Êşandin):

Sofiyan nefs wek yek ji dijminên mirov yên herî serhişk didîtin. Bi endazeyekê ku bîr û fikrê sofiyan, heta radeya xwekuştinê dibire pêş, bi awayekî ku Termizî bo derbasbûna ji şerê nefsê xwe avête nav deryaya (Ceyhunê)Sofî di wê baweriyê de ne ku, tew eger perestinek jî li ser daxwaza şewqa nefsê bê dariştin, wê jî wek kêşe û kelemên rê dibînin. Nefsê wek şeytan dibînin, nefsê wek seg û rovî û mişk wêne dikin.

Komek ji sofiyan wek Udey Bin Musafir salên dirêj di çolistan û veşargehan de jiyan derbas dikirin.Heta wî cihê ku digotin lawir û ajel bi wî re hertim di çûnûhatinê de bûn.Ebû Turab Nexşebî li biyabanê bû dostê dirindeyan. Komeke din jî li goristan û mizgeftan jiyan derbas dikirin. Di rastiyê de rev û bazdana ji destê xelkê û hogirbûna bi teba û ajelan re fakterê aramiya wan a derûnî bû.

---

[66] -Mihemed Xezalî, *Ehya Olum El dîn*, Celd Duvum, r. 303.
[67] -Çavkanîya Berî, r. 160.

Ebû Talib Mekî ku yekî din e ji sofiyên navdar, vedibêjin ku parêzî li goşt xwarinê kiribû, hertim giya û riwek dixwarin, bi endazeyekê ku vedibêjin rengê çermê wî veguherîbû ser rengê kesk. Nîzam el Dîn Xamoş "Bi piranî cil û bergên wî bi dohn û lewitî bûn, çimkî di dema xwarinê de eger cil û bergên wî qirêj bibûna paqij nedikirin û bi gotina Ebû Suleymanê Daranî nabe kesên hejar û feqîr li şûna paqijkirina dil û derûna xwe, hewl bidin cil û bergên xwe paqij bikin. Şêx Ehmedê Refahî "*rê nedida mirovên hejar û nedar û xizan serdana hemamê `serşokê` bikin, tew ew ji kuştina kêç û spiyan dûr dixistin û di heman demê de hejarî û birçîtî û lixwekirina cil û bergên dirriyayî wek yek ji nîşanên gihîştina bi meqamê salik û arif didît*"[68]

Ebû Yaqûb dibêje:"Li bajarê (Şuş) li odeya Helac me kêçên wiha derdixistin derve û me giraniya wan dipîva, giraniya her yekê ji wan kêçan nîv daniq bû. Ev jî nîşana zuhd û heybeta wî bû"[69]

### 1.2.4 Zêdegavî di Xwe Birçîkirinê de:

Kêm xwarin, kêm razan, kêm axaftin, di yasaya Sofîzmê de destpêk e ji bo dîndariyê: Di vî warî de Cunêd Bexdadî girîngî û guhdaneke mezin ji birçîtiyê re datîne û dibêje:"*Me ew Sofîzma xwe bi birçîtiyê bidest xistiye Şeqîq Belxî ew kesê ku birçîtî danî (Dî Kot) çil şev birçîtî dilê wî ronîdar dike*"[70] Yekî dî Dî Kot xwarina dirhemek goşt dilreqî bi dû de tê. Gelek kes li jêr pêrewkirina hedîseke pêxember (S.X) ku vedibêjin û dibêjin xwe ji xwarinên baş û xweş biparêzin, çimkî şeytan di reh û xwîna Adem de li wan digere.

Ji ber vê yekê jî hemû xwarinên xweş li xwe heram dikirin û tew xwe ji vexwarina ava zelal û sar jî diparastin û ji xeynî ava germ aveke din venedixwarin. Her bi vê yekê jî razî nedibûn, lê kûzên xwe yên avê dixistin bin erdê de, da hewa lê nexe û avê sar neke.

Bayezîd dibêje: *Hêsantirîn rahênan ku min ji xwe re danîbû, heramkirina vexwarina avê bi dirêjiya salekê bû Di vegotineke din de, hatiye gotin ku Bayezîd salekê*

---

68 - Ebdulhuseeyn Zêrîn Kub, *Mîras Sofiyê*, r. 157- 159.
69 - Luyîs Masonî, *Mosayb Helac*, Tercumeyî Seîd Ziya El dîn, Dihşerî, Entêşarat Camî, Tehran1383, r.70.
70- An Marî Şîmêyli, *Ebad Irfan Îslamî*, r. 280.

*ne razaye*"[71]. Ji xwe eger tu li van cure reftaran hûr bibî, eşkere dibe ku ev cure kirdar ne ji dûr û ne ji nêzîk ve pêwendiya wan bi pêxember re nebû, lê zêdegavî bûn.

Bi şêwazeke din em dikarin bêjin ku, tevger û reftara pêxember (S.X) û hevalên wî û pêrewkerên wî tucarî ne bi vî cure û awayî bûn. Çimkî her dema ku tiştek bi dest wan diket dixwarin. Pêxember (S.X) ji goşt û şêraniyê hez dikir. Car caran goştê mihan jî dixwar, ava sar vedixwar û digot ava şêlû ziyanê digihîne maîdeyê û tîbûnê naşkîne. Her ji ber vê yekê jî bû li ava sazgar digeriya û sûd jê werdigirt û digot: "*Erkan li ser xwe bi giranî wernegirin, çimkî Xwedê jî bi giranî li ser we digire, ji ber ku di dema berê de hinek kes hebûn erkên xwe li ser xwe giran kiribûn, Xwedê jî li ser wan giran kir*"[72]

Ibn Xeldûn di vî warî de dibêje: "*Eger kesek bi birçîtî û rahênanê xwe rahênan bike, êdî ew rewişt û kirde dibe beşek ji siruşt û zatê wî yê însanî, çimkî nefs diguhere û veguherîn bi ser de tê. Nefs hogirî her tiştekî bibe, tevlî xûyên wî dibe. Ibn Xeldûn di wê baweriyê de bû ku, divê birçîtî kêm be yan hino hino be, heke na metirsiya mirinê peyda dike*"[73]

Ibn Xeldûn di wê baweriyê de ye ku birçîtî bandoreke xirab li ser mejî û hest û laşê mirov çêdike û dibe bar li ser saxlemiya laş û safîbûna ruh jî.

### 1.2.5 Bêxewî

Bêxewî wek stûnekî din ji stûnên eslê Sofîzmê tê hejmartin. Eyn el Qeda di namîlkeya (Lewayîh) de derbarê bêxewiya sofiyan dibêje: "*Aşiq wek maşûq tucarî naraze, ji bo wî xew û bêhnvedan ne rewa ye. Razana aşiq li hember maşûqekî ku hertim hişyar e, eyb û nankorî û kêmasî û qisûr e. Aşiq ranaze û razana wî ecêb e.*

*Ey bira aşiq, yan di meqamê firqet û cudahiyê de ye, yan di bereya wîsal û bi hev gihîştinê de ye. Jixwe eger di bereya firqet û hîcranê de be, ji ber perîşanî û xem û derdan xew qet û tucarî ji wî nêzîk nabe.*

---

[71] -Ebufrec Ebn Cozî, *Teblîs Eblîs*,r. 163.
[72] -Çavkanîya Berî, r. 118.
[73] - Ebdulrehman Bin Xeldun, *Moqedemey Ebn Xeldun*, Celd Ewel Tercumey Muyed Xwarzemî, Çap Şeşem, Entêşarat Êlmî û Ferhengî, Tehran, 1386, r. 165.

*Şermit nayed ke der xemiş xwab kunî .....  Wange zi xemiş du dîde pir ab kunî*

*Der mîkedeaş eger biyayî barî  ..... Bayid ke wizu tu az mî nab kunî*"[74]

Bi hêviya dîtina cemala Zulcelal em serî datînin ser balîfê û radizin. Şah Şûca Kirmanî çil salî bi hêviya dîtina hezkiriyê xwe raneket, lewma jî vedibêjin ku cemala Zulecelal di xew de dîtiye û di xweşiyê de got:

*Der xwab xeyal tum era yad kunîd ayd bir min dil mera şad kunîd*

*Dil pindar ke min tera yafteam bîdar şud hezar firyar kunid*[75]

Perwerdegar, min dîdara te di hişyariyê de dixwest, lê belê niha min te di xewnê de dîtiye, ji ber vê yekê "Şah Şûca" bi hêviya dîtina cemala yar serê xwe datanî ser balîfê.

[74] -Eyîn El Qeza(Bîta) Resaley Lewayh be Teshîh, Rehîm Fermeş, Kêtabxaney Menuçehr, Tehran, r 70-71.
[75] -Çavkanîya Berî, r 71.

# 2 NÊRÎNA IRFANÎ YA DI DERBARÊ ZANIST, EDEPÛ DAB Û NERÎTA(KEVNEŞOPIYA) XANEQAYÊ

## 2.1 Nêrîna Irfanî ya di Derbarê Zanist, Edep

### 2.1.1 Ilm û Zanist

Mezinahiya fêrkirin û fêrbûnê ji wê yekê eşkere dibe ku, zanist yek ji bilindtirîn pileya kirde û sîfetên xwedawend e, vêce fêrkar jî misogerî xwesteka fêrbûna baştirîn kirdeyan dike, stûxwarbûn ji bo daxwazên xwedawend, dibe sedemê bidestxistina pileya cînişîniyê (xelafetê.) Xezalî li ser gewreyî û mezinahiya fêrkariyê dibêje: "*Merc e fêrkirina zanistê, di barekê de stûxwarkirin û bendîtiya Xwedayê mezin hêja be. Di barekê din de cînişînên wî ye.Ew cînişînî mezintirîn cînişînî ye, çimkî Xwedayê mezin zanista xwe ku ji taybetmendtirîn sîfetên wî ye, ji bo dilê zanayan vekirî ye*"[76]

### 2.1.2 Zanist û Sofîzm

Di sedsalên destpêka Îslamê de, serwextbûna bi Sofîzmê bi derbasbûna ji şerîet û zanista xwedayî (îlahî) pêk dihat, "*lê di sedsalên çar û pênc ên koçî de gelek meşayix peyda bûn, ku ew qonax (zanista xwedayî, yan şerîet) derbas nekiribûn, bi awayekî rohn û eşkere lê mikur nedihatin, wek mînak em dikarin Ebûlhesenê Xerqanî wek yekî ji wan kesan bijmêrin*"[77]

Ew zanist û hişmendiya ku bi ser hemû edebiyata farisî ketibû, bi derketina hizrên Sofîzmê ber bi paş ve vegeriya, û êdî rewaca hizrên Fîrdewsî nema, hinek sofî jî fêrî zanistê bûn, lê tê de negihîştin.

*Awezî dûrbînî xom taqîkirdewe   Gwaye min xom şêt dekem pirş û bilaw*[78]

Ebû Seîd Ebû Elxeyr dibêje:"*Yekem pêngava sofî dirrandina kitêban û ji bîra xwe birina zanistê ye*"[79]. Herwiha dijberên Xezalî derbarê jirêderketina bicoş a felsefeyê (Tehafut Elfelasîfe) û gawirkirina (tekfîra) fîlosofan, ji aliyê Ettar ve yek ji wêneyên berçav yên Xezalî ye ku, ji bo dijayetîkirina zanistê ji aliyê sofiyan ve hatiye nîşandan.

[76] -Mihemed Xezalî, *Ehya Olum El dîn*, r. 46.
[77] - Yugnî Edward Wîç, *Tesewfû Edebyat tesewf*, Tercmey Sîrwîs Eyzdî,Entişrat Emir Kebîr, Tehran, 1356, r. 85.
[78] - Mewlana Celal El dîn Romî, Celd Duwum, Bîtî, 2332
[79] -Qasim Xenî, *Terîx Tesewf der Îslam û Tetewrat û Tehewlat*, r. 59.

Lê Xezalî tevî teqezkirina wekheviyê di navbera kar û kirdeyên pêxember û sofiyan de, di misogerkirina îlham û zanistê (marîfetê) di pêşketina fêrbûnê di Sofîzmê de berçav dike.

Xezalî dibêje: "*Sofî ji bilî halê xwe yê niha derbarê tiştekî din naaxive. Ji ber vê jî bersiva sofiyan li ser kêşe û tewerên wekehev cuda ye. Lê zana kesek e ku bi wî awayî di (Heq) de têdigihe wek ku heye, ji bo dîtina rastiyê berê xwe nade halê xwe yê takekesî, çimkî eger tu derbarê xalekê ji sed sofiyî pirsekê bikî, tê sed bersivên cuda werbigirî. Lê gava zanist şewq bide, hemû cihan digire û hîcaban didirrîne û arasteyên cuda tune dike*"[80]

Ebdullah Xefîfê Şîrazî yek ji alîgirên zanistê bû, tevî ku sofiyên dîtir ne bi dîtin û nerînên wî re bûn, wî hewl da xwe ji tomet û navxirakirinên wan biparêze, heta di dawî de gihîşte wî cihê ku gava sofiyên din rastî kêşe û pirsgirêkên dihatin, diçûne ba wî ji bo çareserkirina wan.

Tevî wêrankirina binyatan (bînayan), zanyariyên Xezalî li ser zanistên hizrî (îlmên eqlî) hebûn.Ev jî bû sedemê rexnekirina wî ji hêla sofiyên din ve. Dije-eql û rev û bazdana ji zanistê ji hêla sofiyan ve tiştekî asayî û normal bû. Hinek ji wan ji ber bazdana ji navxirakirinê bû. Xwe ji zanist û her cure nivîsandinê diparastin. Ebûlhesen Şazlî "*tevî zanista wî û wê mezinahiya ku wî hebû, xwe ji nivîsandina kitêban diparast*"[81]

Lê grûpekê ji sofiyan zanist û her cure lêkolîn û vekolînek wek şerm û kêmasî didîtin. Heta wê radeya ku kesekî naskirî wek Ebûl Seîdê Kindî "*ji bo tomarkirina hedîsan rêya wî dikeve karwanserayekê, ji tirsa mebesta xwe eşkere nake û vedişêre. Heta rojekê ji nişka ve daxwaznameya wî ku di nav qolê xwe de veşartibû jê ket xwarê, bi eşkerebûna wî sofiyên rêhevalên wî ew şermezar kirin û te`in lêdan. Bi hesret jê re digotin şerma xwe binuximîne*!"[82].

---

[80] - Ebdulkerîm Sruş, *Qises Erbab Merêfet*, Çap Pencum, Entêşarat Ferheng Sîrat Tehran,1379, r. 158.
[81] -Ebdulhusêyn Zerîn Kub, *erziş Mîras Sofiyê*, r. 158.
[82] -Ebdulhusêyn Zêrîn Kub, *erziş Mîras Sofiyê*, r. 161.

Ew babetên ku me amaje bi wan kir nîşan didin ku mijar û babetên zanistî û nivîsandin û lêkolîn, heta radeyeke çawa li ba hinek sofiyan kirêt û nefretlêkirî bûn. Sofiyan hertim bargiraniya xwe bêhtir dixistin ser çêjê (zewqê) û xweşiyê (wecdê), ew çêj û xweşî (zewq û mewacid), dibûn sedemê xewn û xeyalên wan, wan ew xewn û xeyal wek îlham dijmartin, her bi wê rê û tedbîrê tevdigeriyan, di gelek baran de jî, bêhtir wan ew di babetên şer`î de wek bilindtir û li jortir didîtin. Lewra Bayezîdê Bistamî dibêje: "*Sofiyan zanista xwe ji cawîdanî û nemiriyê werdigirtin, lê vebêjer (muhdis) û şerîetxwaz (şerîetdaner) zanista xwe ji miriyan werdigirin*"[83].

Ewên ku xwe ji Sofîzmê bêrî kiribûn, rexne li wê rijdiya sofiyan li ser çêjê (zewqê) û xweşiyan (mewacidan) dikirin, wiha dihesibandin ku pêwistiya wê babetê bi pûçkirina şerîetê û bidûvçûnê (mutabetê) heye, "*tevî wê jî razî bûn bi çespandin û selmandina çêjê (zewqê) û xweşiyan (mewacidan) ji ber cudahî û pirrengî ji çêj û bûnan (zewq û mewacîdan) tê, wiha dihate pêş çavê wan ev dibe sedemê jirêderketin û jinavçûna girseyê (mirovên asayî*" [84].

Ibn Qeymî el Cewzî ji çêj (zewq) û xweşiyê (wecdê) wek {qewl bîma lem yerşehû Allah} hizr dike û xwe dûrgirtina ji zanist û baweriya bi çêjê (zewqê) wek karekî rast û dirust nabîne. Ew tenê çavkaniya ji hev kirin û diyarkirinê wek zanist dijmêre û her karekî ku ji çêj (zewqê) û xweşiyê (wecdê) û tiştên bi wî rengî ku ligel pirtûk û dab û nerît (kîtab û sinetê) negunce û li hev neke wek kar û dava şeytên dibîne.

Ibn Qeym el Cewzî gotin û axaftinên sofiyan wek hemfikrên kufir û gawiriyê dibîne û dibêje: "*Piştî Quran û hedîsan ti tiştekî din ji bilî dudiliya axêveran (mûtekelîman) û raya jirêderketiyan û xeyala sofiyan û pîvandin (qiyas) û felsefeyê tune*"[85]

Ew di wê baweriyê de bû ku her kesek bi piştevaniya hewes û arezûyên xwe ji wê mebesta ku pêxemberan jê re hilbijartine bê pêwist û bê niyaz bibîne, ji her kafirekî ji kufara ji hemûyan li pêştir e.

---

[83] -Çavkanîya Berî, r. 160.
[84] -Çavkanîya Berî, r. 161.
[85] -Ebdulhusêyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiy*, r. 16.

Helbet di nav sofiyan de fêrkirina zanistê hatiye piştrastkirin, bi şertê rê û tedbîr hatiye danîn. Reb`î Bin Xeysem dibêje: Fêrî feqetiyê bibe, dûre îzolebûnê hilbijêre. Mutref Bin Abdullah dibêje: Mezinahiya zanistê ji mezinahiya îbadet û peristinê jî zêdetir e. Yûsif Bin Asbat li wê yekê mikur tê ku mirov beşekî ji zanistê fêr bibe, ji wê yekê baştir e ku heftê carî beşdariyê di şerekî dijî dîn de bike. Ji Meafê Kurê Omran hatiye vegotin ku gotiye: "*Li gor min, nivîsandina hedîsekê ji şevnimêj û şevşiyarmana ji bo nimêjê çêtir e*"[86]

Cunêd Bexdadî dibêje: "*Her rêyek dibe du beş, yan bi zanistê yan bi rewiştê, her karek eger baş be jî, nezanî û famkorî ye eger rewişteke baş pê re nebe, zanist bêyî rewiştê jî be, xoşewîstî û şeref* e"[87]

Xezalî dibêje: "*Xelkê derbarê zanistê çend bere dirust kirine, lê hemû li ser wê yekê kok in ku zanist erk û wacib e, wêjevan (mûtekelîm) zanistê wek zanista wêjeyê (kelamê) dibîne. Xwe bi sûdwergirtina ji wê yekê ku, ji tekperestiya Xwedê têgihîştine, ji zat û sîfetên Xwedê dizanin, feqiyan wek zanista fiqihê dijmêrin, herwiha ew kesên ku hedîsan vedibêjin, bîr û baweriya wan wiha ye ku (kîtab û sunet) ew zanist e ku xulaseya hemû zanistan e, sofî jî ku çend rêbaz in, hinek ji wan bawer dikin ku hal û meqam zanist e, hinekên din jî zanîna niyetpakiyê (dilsozî û îxlasê) û afatên nefsê û têkilkirina îlhamên xwedayî û şeytanî wek zanist dibînin"* [88]*,* lê baştirîn zanist li ba Xwedê zanista şerîetê ye, ango fêrkirin û fêrbûna Quranê (Xeyrukum men teileme elqurane û eilemehû) yên herî baş ji we, ew kes in ku Quranê fêr dibin û kesên din jî fêr dikin.

Di encamê de em digihin wê baweriyê ku, hemû taxim û rêbazên Sofîzmê li ser wê yekê kok in ku zanist erk e, pêwist e li ser her kesî fêrî zanistê bibe, lê rêbazên cuda li ser çiyetî (mahiyeta) zanistê nakok in û ne hemfikr in, çimkî hinek ji wan zanistê wek zanista şer`î (dînî) dibînin, hinekên din jî derketina ji hedîsan wek zanist binav dikin, tew her sofiyek girêdayî hedîs û fiqihê bûya wek paşketî dihat binavkirin, hinekên din jî baweriya wan bi (zewq) û (wecdê) hebû ku ev (zewq û wecd) dibûn çavkaniya xewn û

---

[86] -Ebu Ferec Ebn Cuzî,*Telbîs Eblîs*, r. 114.
[87] -Ebu Hasan Osman Hucuyerî, *Keşfê Mehcur*, r. 604.
[88] -Mihemed Xezalî, *Ehya Olum El dîn*, Cild Ewel, r. 54.

xeyalên wan, ev xewn û xeyal jî di ser şerîetê re digirtin. Lewra em dikarin bêjin ku zanist di ehlê Sofîzmê de xwe bi çend şêweyên cuda derxistiye ku, pir cuda bû ji wan zanistên li ba zanistên petî bû, lê digel felsefeyê di hinek teweran de nêzîkatî hebû ku, di naveroka tewerê de hatiye nîşandan, di tewerê din de jî kêm zêde emê amajê pê bikin.

### 2.1.3 Awez (Eql)

Awez (eql) di warê wateya peyvê de, bi wateya têgihîştin û agehdarî û lênerîn û lê hûrbûn û famkirina tiştan e. Eql di felsefeyê de dibe du şax an liq, eqlê hizrî (teorîk) û eqlê kirdeyî (praktîk.) Jixwe mebesta herdu liqan têgihîştina rasteqîneyan e. Awez (eql) di warê exlaqan de, hêzek e bi têgihîştina ji cîhanbîniyê, em dikarin rast û nerast ji hevdu cuda bikin. Di warê kelamê de, pîvana jihev vekirin û hukmdan di mirov de ye, bi riwangeya Quranê: "*Kesek têdigihe û têgihîştina wî heye, ewê din hokar û belgeyên olî (mentiqî) tîne, lê girîngtirîn wateya awez (eql) bi riwangeya Quranê, tenê hokar anîn û belgeyên oldarî (mentiqî) yên Quranê ye*"[89].

Ji ser zarê Fuzeylî vedibêjin ku gotiye: "*Gotine bingeha olê çi ye? Gotiye awez (eql) e, gotin bingeha eql çi ye?Got aramî û hêminî ye, gotin bingeha aramiyê çi ye? Got bêhnfirehî ye ango (sebr) e*"[90]. Nerîn û bîr û baweriyên Xezalî yên cuda li ser awezê (eql) hebûn. Ev di demekê de ye ku eger berawerd bikî bi felsefeyê, çimkî bi baweriya Xezalî herwekî çawa têgihîştina hestên mirov amraz jê re pêwist e, bi vî awayî jî pêwistiya eql bi amrazekê heye, amraz jî dil e, yan awez bixwe ye ango (eql) e. Bi dîtina Xezalî "*Awez û şerîet bi hev re hevpêwist in, Xezalî di destpêkên fikrî yanî beriya pêgihîştina temamî ya fikrî berê xwe da Sofîzmê û li dijî felsefeyê derket, ango beriya guhertina hizrî û gava li (Nîzamiye) ya Bexdayê ders digot dijatiya wî bi felsefeyê re hebû*"[91].

Mewlana Romî bi şêweyeke giştî ne ligel awez û felsefeyê ye, herçiqasî di navbera awezê giştî û beşî (eqlê kullî û cuziî) de cudahiyê dike, awezê giştî (kullî) di ser

---

[89] -Nasir Sobhî Qeramekî û Mehmed Îrvanî, *Olum nefes ez dîdgahî danêşmendan Îslamî*, entişarat senciş , Tehran, 1381, r. 115- 116.

[90] -Ebdal Refîq Heqîqet, *Tarîx Îrfan û Arêfan Îran*, r. 268.

[91] -Mihemed Mensur Nijad, *Eqil Der Sê Dînîy Bozurg Asmaniy Zerdeşt, Mesîhî û Êslam*, Entişarat cewan, Tehran, 1383, r. 193- 194.

awezê beşî (cuziî) re digire, lê wateyeke zelal bo awezê giştî (kullî) pêşkêş nake, di hinek mesele û babetan de bawer dike ew hemû cîhan e, carina jî wek beramberê hizra ewliyayî dijmêre, helwesta sereke ya Mewlana bi şêweyeke giştî ev e, "*awez ango eql xizmetkarê dîn e û merc e li bermaberê dîn derkeve*))[92].

### 2.1.4 Şerîet:

Şerîet çiraya rê ye û rê ronîdar dike, jixwe eger tu bêyî çira gav biavêjî, bêguman ber bi biyabana matmayîn û windabûnê ve diçî. Cîbicîkirina şerîetê ne tenê li ser mirovên asayî û sofî û arifan ferz bû, lê li ser pêxemberan jî ferz bû.Ne tenê wiha, lê li ser pêxemberan dijwartir û girantir bû, bi awayekî ku hinek rêwresm û peristin jî hebûn ku li ser pêxemberan erk bûn, lê belê ji mirovên asayî re ne ferz bûn.

Sofî herçiqasî şerîetê wek çira û mûma rê dibînin û çûna di wê rêyê de, wek gihîştina bi armanca rasteqîn dijmêrin, hertim teqez dikin ku rê bêyî şerîetê nayê birrîn, lê bi riwangeya sofî û arifan gava rêgeh gihîşte rasteqînê, ango ew lûtkeya armancê, mebest e. Êdî dab û nerîtên îbadetê (şerîetê) ji ser wan tên hilgirtin û jê têne veqetandin, lewra jî Dema heqîqet derket, şerîet bi dawî dibe.

Ebdilhekîm Tebîb Afxanî di pirtûka (Lênerînek li Hatina Sofîzmê) de di wê baweriyê de ye ku: "*Pêşî Sofîzm li ser hîm û binemaya rêçikê (terîqetê) hatibû damezrandin, ti pêwendiyeke wê bi tewerên şer`î û peristin û erkan (ferîzeyan) re nebû. Dûre hino hino behsa şerîetê jî li tenişta rêveçûna terîqetê derket holê. Xezalî yekemîn kes bû ku têkoşîneke mezin kir li dijî cudakirina (terîqet û şerîetê*"[93]

Seîd Nefîsî derbarê vê tewerê dibêje: "*Heta sedsala 5ê koçî Sofîzma Îranî li ser hîm û binemaya rêçikê (terîqetê) bû, û ti pêwendî û nêzîkatiyeke wê ligel şerîetê nebû. Ev bawerî heta destpêka derketina hizra Xezalî bû, çimkî dûre Xezalî bixwe bû hokara sereke ya têkilîhevkirina terîqet û şerîetê. Em dikarin bêjin ku temamiya wan pirtûkên ku di vî warî de hatine nivîsandin wek (Lilemi – Serac Tosî, Keşif Mehcûr – Hicûrî,*

[92] -Çavkanîya Berî, r. 203-205.
[93] -Etulah Tedîn, *Cêlwêhayê Tesewf Der Îran*, r. 116- 117.

*Rîsaleya Quşeyrî, Menazil el Sairîn – Xwace Ebdullah Ansarî) derbarê terîqetê ne, tekane gotinek derbarê şerîetê û rohnkirina tewerên wê nayê dîtin*"[94].

Sofîzm li Îranê hertim li ser bingeh û binemaya terîqetê bû, ne ya şerîetê. Bi wateyeke din bêhn û hilmeke wê ya zanistdostî (felsefe) hebû, ne ya ol û mezhebê, "*Hîkmeta Sofîzmê di ser olê re bû, ti cure îbadeteke wê ya wek nimêj û rojiyê ya taybet bixwe nebû*"[95]

### 2.1.5 Irfan û Şerîet:

Arif ji bilî wehiyê, ku bingeha wê li ser pabendbûna bi şerîetê hatiye danîn, berê xwe didin nava (batinê) mirov, ew zanista ku ji wir ve hatiye bidestxistin, wek zanista navxweyî (batinî) tê naskirin. Arifan beşek ji dahênan (bîdeit) wek (xirqe, xaneqa, sema, xelwet, sir, zîkr…hwd) kirine wek beşekî ji dab û nerîtên şer`î, jixwe ti yek ji van teweran nakevin qalibê şerîeta Îslamê bi şêweyeke reha, tew teqezî jî li ser nayê kirin, û wek dahênan (bîdeit û zendîqtî) û gawirî tên hejmartin, çimkî dikevin qalibê zêdegavî û dahênana di olê de, her dahênanek jî di olê de dikeve qalibê jirêderketinê û her ji rêderketiyek jî ber bi agir ve diçe.

Ebû Nesrî Serac tekez dike ku ev babet beşek ji lutfa Xwedê ye. Îzedîn Mehmûd Kaşanî ev babet wek dahênan, zendîqtî û (bîdeit) dîtiye, lê bi baweriya navborî, "*Ji ber ku ne berovajî (sinetê) ye, wek dahênana pesendkirî (bîdeita hesen) dibîne*"[96]Arif di vî warî de dibêjin: Ol li pirbûnê dinere, lê zanistvan li yekîtiyê (wehdetê) dinere. Ew ji bo piştrastkirina babeta xwe, gelek belgeyan tînin û ji wan jî vegotin (rîwayet), saxteya-mechul, *"Hesenat el Ebrar, Seyat el Muqrebîn*"[97]

Bi riwangeya arifan ew tiştên ku bi riwangeya şerîetê nehatiye pesendkirin tenê rûyê derve yê tiştî ye, rûyê navxweyî yê tiştî nagire, Xwedê herkesî ji rehmeta xwe nêzîk bike rengekî ji dînbûnê ya ser siruştî (fewq tebiî) ango (sukr)ê diyarî wî dike. Di wê navberê de jî takekes dikare berovajî şerîetê bipeyive û tevbigere, "*ew reftar herçiqasî li*

---

[94] -Seîd Nefîsî,*Serçaweyî Sofîzim der Îran û Cehan*, r. 130- 131.
[95] -Ebdul Refîq Heqîqet, *tarîxê Êrfan û Arêfanê Îran*,r. 40.
[96] -*Încîlê Îsa Mesîhî*, tercumeyî Hezarey nu, neşr Îlam, r. 133.
[97] -Emam Muhamad Bin Elî Şukanî, *Elfiwad Elmecmuet Ehadîs Elmezue*, Bitehq Elşeyx El Elamet Ebd Elrahman bin yehya El maelş El Miyanş, 85,r. 139.

*dijî şerîeta Xwedê ye, lê kesê ku rê pê hatiye dayîn erk li ser wî nîne, ji ber ku ew mezher û nîşandana amadebûna (hizûra) Xwedê li her cihî ye, kesê ku rê pê hatiye dayîn ew kes e ku Xwedê ew di yekîtiya (îtihada) xwe de helandiye*"[98]. Bi baweriya Xezalî mirovê kamil, marîfet tîrêja zuhdê û redkirina dinyayê tê de venamirîne,"*hin kesên ku bi hênceta marîfetê nimêj û rojiyê terk dikin û şerîetê bêyî girîngî dijmêrin, wan wek ji rêya rast derketî dide nasîn, çimkî ew gelek behane û hêncetan tînin ku, qaşo pêwistiya Xwedê bi kirdeyên evd û bendên wî tune*"[99].

Xezalî ji vê jî bêhtir tekeziyê dike û dibêje: Xwediyên dilan gava kirdeyekê encam didin bi riwangeya fiqihê tekezî li ser nayê kirin, wek vexwarina şerbeta helal di tepsikeka bi rengê şerabê de, yan terkedinya ango zahidek ku hezkiriyê xelkê ye cilê kesekî din di hemamê de li xwe dike, ewqasî radiweste, heta ku diziya wî eşkere dibe û xelk jî wek diz lê binerin. Xezalî tekeziyê li ser wan babetan dike û dibêje: Ew babet li dijî pîvanên Îslamê ne û her li wê gorê jî li dijî şerîetê ne.

Mela Muhsin Feyz Kaşanî li ser zimanê Ibn Cuzî ji pirtûka (Telbîs Iblîs) vedibêje ku: "*Bi bihîstina wan babetan ku Xezalî amaje daye wan, bi riwangeya fiqihê cihê rexnekirinê ye. Herwiha Şêx Ebas Qumî di pirtûka (Sefînet el Bîhar) de rexneyên Ibn Cuzî tîne ber behsê û bi bêdengiya xwe tekeziyê li ser wan dike*"[100]

Niclson di pirtûka (Sofîzma Îslamî û Tarîxî An) ku ji aliyê Ebû Ala Efîfî ve hatiye wergerandin, ji zimanê Xezalî ve û nêzîk bi wê wateyê vedibêje: "*Sofî bi esl û kokê ji mirovên mezin ên sedsala 5ê koçî ne, hevçaxên xwe rexne dikin ku xeyalên xwe yên derewîn wek (zanista xwedayî – ilmê îlahî) dijmêrin, dilxwazî û xwestekên xwe yên derûnî (nefsanî) wek (hezkirina xwedayî – mehebeta îlahî) dibînin. Zendeqekarî wek (hejarî – feqîrî) dibînin û şik û gumanê wek (derûnpakî-sefa) dijmêrin, xwebêrîkirina ji*

---

98 -Luyîs Masonî, *Mesaêd Helac*, Tercime Seyd Ziyaedşn Dihşerş, Tehran, neşir camî, r. 54.
99 -Ebu Hamad Xezalî, *Tecelî Enver*,tercumey Yunis Yezdan Perest, Entişarat Êhsan, Tehran, 1380, r. 82.
100 -Ebdulkerîm Sruş, *Qises Erbab Meirîfet*, r. 15.

*olê wek (derûn kuştin – fenaya nefsê) dibînin, herwiha piştguhxistina şerîetê wek (rê û rewişta sofiyane) dijmêrin*"[101]

Ezedîn Nefîsî di kitêba (Elînsan el Kamil) de dibêje: "*Çavlêkirina pêxemberan û perwerdeya ewliyayan, ji ber wê yekê ye heta girse (mirovên asayî) li ser gotina çê û kirdeya çê û reftara çê hemfikr bin, da dilq an dirûvê wan baş bibe, çimkî heta dirûv rast nebe, derûn û hundirê mirov jî rast nabe, çimkî riwalet-heyet (dîmena derveyî ya mirova) wek çarçoveyekê ye, derûn jî wek amrazekê daxilî nav riwaletê dikin, dûre çarçoveya dirust dibe, ew tiştê dixin nava wê de jî dirust wek çarçoveyê dertê, eger çarçove xwar be, ew tiştê ku dixin nava wê de jî xwar dibe*" [102].

Ebû Seîd Xeraz dibêje: Her derûneke (nefseke) veşartî (batinî) berovajî riwaleta (zahira) şerîetê be pûç e ango (batil) e. Ji Ebûbekirê Deqaq hatiye vegotin ku gotiye: "*Min bangeke nediyar dibihîst, digot her kirdeyek ne li gor şerîetê be gawirî û kufir e*"[103].

Eyn el Qeza tevî tundrewiyê di îrfanê de di parçeya 121ê ya (Temhîdatê) de dibêje: "*Navbera evd û kufirê yanî gawiriyê de nimêjkirin e. Ev jî ji belgeya hedîsên pêxember wergirtiye ku, pêxember gotiye: Nimêj stûna olê ye, her kesê ku nimêj neke, ola xwe ji dest dide*"[104]

Şems Tebrêzî derbarê wan kesên ku şerîetê piştguh dikin dibêje: "*Komekê wiha didîtin gava amadebûna dil (hizûra qelb) bidest dixistin, ji riwaleta nimêjê bê niyaz dibûn, gotin: (Teleb elwesîle beide hisûl elmeqsûd qebîh) ango telebkirin û xwestina amrazê piştî bidestxistina armancê kirêt e û ne di cihê xwe de ye. Herwiha Şems dibêje:*

---

[101] -Yusif Qerzavî, *Sîma Xezalî Ez Nezerê Moafiqan û Moxalifen*, Tercumey Ferzad Hacî Mîrzayî, Entişarat Ehsan, Tehran, 1379, r. 118.
[102] -Ezdîn Nefîsî, *El- Însan Kamil*, be Teshîh Marîsan Moler, Tercumey Ziya el Dîd Dehşerî, Çap Heştum, Entişarat Tihuriy, Tehran, 1386, r. 140.
[103]-Ebu Ferec Ebn Cuzî, *Telbîs Eblîs*, r. 228- 229.
[104] -Rêza Esed Pûr, *Ez Şur û Şigift*, Neşir Ehl Qelem, Tehran, 1380, r. 73-75.

*Tevî belgeyên wan, em dibêjin: Rast e ew gihîştine pileya kemalê û serweriyê (wîlayetê) û amadebûna dil (hizûra qelb), lê nekirina nimêjê kêmasî û qisûra wan e*[105].

Hinek arif û sofiyan bi çavekî kêm berê xwe didan şerîetê û pêrewiya xwe kêm dikirin, lewra jî kêm hindik wek derketiyên ji şerîetê dihatin hejmartin.

### 2.1.6 Hinek ji Niwandinên (Nîşandanên) Arif û Sofiyan:

1. Hinek sofiyan ji bo her nimêjekê destnimêj digirtin.

2. Hinekan di zivistanê de û di atmosfera derve de xwe paqij dikirin.

3. Hinekan ji wan nimêja sibehan bi destnimêja şevê bicih dianîn, ango şev heta spêdeyê ranedizan.

4. Taximek heta çend rojan ranedizan, her li ser destnimêjekê dibûn.

5. Komekê jî li ser qamk ango tiliya mezin a piyên xwe nimêj dikirin, qaşo bihîstibûn ku pêxember (S.X) carekê wiha kiriye.

6. Hinekan jî bi çend rojan û çend hefteyan di halê rakêşerî (cizbe) û bêhişî (xilse) de dibûn.

7. Taximek ji wan li ser çiyan bi gotina (Allahûekber) destpêka nimêjê ji hişê xwe diçûn û nikarîbûn nimêjê bi cih bînin, nimêja wan ji dest wan diçû.

8. Hinek ji wan "*reqs û sema dikirin, bi giştî di bicihanîna nimêjê de bi kêmasî bûn û nimêj nedikirin*"[106].

### 2.1.7 Çakiyên – Qenciyên- Şerîetê:

1. Şerîet nasînera heqîqetê ye.

2. Şerîet awezê (eql) tîrêjdar dike, yanî ronaka derveyî lêhûrbûnên hizrî ye.

3. Şerîet derxer û nîşandera pileyên terîqetê ye.

---

[105] -Nesir el dîn *Sahêb Zeman, Xet Sêvum*, r. 462-463.
[106] -R. K. Marî Şîmel, *Ebad Irfan Îslamî*, r. 265.

4. Şerîet bingeha sereke ya terîqetê ye û heqîqeta Sofîzmê derdixe.

5. Şerîet fermana Xwedayê mezin û dab û nerîta şandiyê wî ye.

6. Şerîet navenda jiyana mirov e û hevkêşa pêdiviyên şênber û wateyî (madî û manewî) ye.

### 2.1.8 Edebiyata Irfanî:

Edebiyata irfanî yan edebiyata Sofîzmê, beşekî zêde ji kelepûra wan pexşan û helbestên edebî ye. Ji bo vê mebestê jî helbestvanên arif helbestên xwe di bin bandor û karîgerî û kartêkirina Sofîzmê de hûnandine.

Ji bo nasandina vê cureya edebiyatê, pêwist e em pêkhênerên wê, ango Sofîzm û Irfanê nas bikin. Sofîzm wek çavkaniyeke hizrî di sedsala duyem a koçî de derket holê û bû îdeolojiyeke berbelav.Kokên wê yên pêşin vedigerin hin kesên ku nêzîk bûn ji pêxember û (Ehlê Sefa).Ji aliyekî din ve jî, di serdema xelîfeyên cihnişînên pêxember û bi taybetî jî Îmamê Osman de, hino hino ber bi terkedinya û zuhdê pêngav da, heta ku kemîneyeke – hindikahiyeke- hizrî pêk anîn.Yekem pêngav jî di wê navê de derket holê şermezarkirina dinyayê û xwestekên derûn (nefsê) bû.

Dûre hezkirina Xwedê û gihîştina bi heqîqeta reha bû navenda xwestekên wan û dawiya kirdeyên wan bû. Ji vir bi şûnde şîretkarî û fêrkariyên wan dibin du beş. Beşek ji wan mijûlî pend û şîretkariyê (edebiyata fêrkarî) bûn û beşê din jî mijûlî evînî (edebiyata evîndarî) bûn. Dûre kelepûr û berhemeke berçav li jêr navê edebiyata irfanî li pey xwe hîştin, ku ji bîr û hizrên wan diza."*Sofîzm bixwe sûd (havil) ji kangeha çêj û îlhamê werdigire, helbest bi helbest û helbestvan bixwe jî her li dora vê tewerê bûn, lê bi awayekî giştî Sofîzm û sofî di destpêkê de terkedinya û xweparêzkar bûn. Pir xwe nêzîkî çarçoveya helbest û helbestvaniyê nedikirin, tevî ku helbestên hinek sofiyên kevin, bi helbestên Sofîzmê ve hatine zeliqandin wek (Zenun Misrî), Yehyayê Kurê Mûaz), lê ti yek ji wan helbestan ne ji ziman û vegotina sofiyan bixwe bû. Tew sofî bixwe baweriyê pê nakin. Ji aliyekî din ve jî ewqas pend û hizrên Sofîzmê jî tê de nayê dîtin, sofiyên mûtedil*

*(nerm, ne radîkal) jî di destpêkê de hezkirina xwe ji helbestê re nîşan nedidan, tew xwe ji xwendina Quranê bi deng û bihîstina helbestan diparastin*"[107].

Yekemîn destpêkerê helbesta Sofîzmê Ebû Seîd Ebûl Xeyr e (357-440 k miriye.)Ebû Seîd berovajî dijatiyên feqe û şerizanan û tew sofiyan jî, li ser mînbera şîretkariyê gelek helbest dixwendin. Ji bo hemû helbestan jî ravekirin û şîroveyeke îrfanî li wan dikir. Lewra jî em dikarin bêjin ku, helbesta îrfanî ji sedsala 5an a koçî ve û di serdema Ebû Seîd Ebûl Xeyr li Xorasanê bû babeteke diyar û berbelav. "*Piştî serdema Sultan Mehmûdê Xeznewî û kurê wî Sultan Mehmûd, Sofîzm li Xorasanê bû babeteke diyar û tevahî, tevî ku feqiyan xwendina helbestan û bi taybetî helbestên xezelî li ser mînberan monopole kiribûn, lê vegotina beytên evîndarî û vegotina çîrokên evîndarî di nav sofiyan de berbelav bû. Çarînên (Eynulqezat Hemedanî, Ebû Seîd Ebûl Xeyr (Mîhneyî), Ewhedê Kirmanî), herwiha xezelên arifên wek (Senayî û Ettar) wêneyeke berçav û berbelav e ji wan helbestên ku di xaneqayan de dihatin xwendin*"[108].

Piştî Ebû Seîd, Senayî tê. Senayî di sedsala 6an a koçî de rabû bi anîna kêş û sirwe û qafiyeyên irfanî ji bo nav qesîdeyê, bi vî karî jî derwazeyeke nû vekir. Bêhtir qesîdeyên Senayî mişt in bi rakêşerî (cizbe) û hal û rewşa qelenderî û şermezarkirinê, di çarçove û pêkanîna qesîdeyê de mecalekî irfanî jê re pêk anî. Etarê Nîşapûrî di çarçoveya Xezel û Mesnewî de beşên xezel û mesnewî anî ber behs û gengeşeyê ku, evjî xaleke destpêk û girîng e. Edebiyata îrfanî herwekî di destpêkê de bi kurtî me amaje pê kir dibe du beş, ku ew jî helbesta fêrkarî (teilîmî) û edebiyata evîndarî.

Helbestvanên sofî hewl dan serxweşî (sukrê) û dilxweşî (wecdê) û çend haletên irfanî yên dîtir, di çarçoveya xezelê de bi cih bikin. Herwiha pend û şîretkarî û bîranîn û terkedinya ji rêbwarên terîqetê re dihûnandin. Li wê gorê jî Senayî û Ettar wek helbestvanên arif ên dîtir, hem xezel û cizbeya wan heye, hem mesnewî û fêrkariyên wan hene we (Hedîqet Elheqîqe) ya Senayî û (Mentiq el Teyr) ya Ettar)

---

[107] -Ebdul Husêyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiye*, Çap Heftum, Entişarat Emîr Kebîr, Tehran, 1373, r. 140.
[108] -Çavkanîya Berî, r. 142.

Serkird û rêberê helbestvanên arif, Mewlana Celaledînê Romî çi di warê helbesta evîndarî ya îrfanî û çi di warê helbesta fêrkarî de ango di her du waran de serkeftî û bêmînak û hêja bû. Eger em li (Mesnewî Manewî) binerin, ew yek ji me re zelal dibe ku, ev berhem yek e ji girîngtirîn û baştirîn û dewlemendtirîn kelepûr, mîrat û berhemên edebiyata Sofîzm û Îrfanê. Piştî Mewlana Romî yekem kesê ku edebiyata fêrkarî tevî şêweya Mesnewî bike "*Kurê Sultan Weled e ku wek (Behaa el Weled) tê naskirin ku pirtûka wî jî (Weledname) ye.Piştî wî jî Şêx Mehmûd Şebstrî ye, pirtûka wî jî bi navnîşana Gulcarî Nihênî (Gulşen Raz) e*"[109].

Bi awayekî giştî cihekî Sofîzm û irfan yê mezin di dirustbûna guherînê di edebiyatê de hebû. "*Wan qesîde ji çirrava derew û sextekariyê rizgar kirin û gihandin zîrve û mezinahiya pend û şîretkariyê, zêdegavî di evîna şehwet û arezûyê de gihandin hezkirina esmanî, mesnewî kirin amraza fêrkarî û perwerde û îrfan û rewiştbilindî, çarîne kirin derbirîna halet û rewşên derûna mirov, kûrahî û sadeyî diyarî pexşanê kirin, çîrok û vegotin kirin çarçoveyeke wateyî*".[110]

## 2.2 Dab û Nerîta (Kevneşopiya) Xaneqayê:

Sofîzma Îranî, beşek ji sincî û dab û nerîtên xaneqayan ji (Manewî) yan wergirtin. Peyva xaneqa di zimanê erebî de ji şîroveya peyva (xanegah) a farisî hatiye.Manewiyan cihê raz û niyaza xwe wek xanegah binav kiribûn. Ev xêz ku di pirtûka (Hidûd el îlm min elmeşreq îlal mexrîb) ku derbarê bajarê Semerqendê hatiye nivîsandin, ji bo selmandina vê nerînê "*Di wê de derbarê xanegaha Manewiyan e, ku wan wek (Nexuşak) binav dikir*"[111].

Li gor Nefîsî, yek ji cudahiyên Sofîzma Îranî û welatên din ên îslamî, hebûna xaneqa û dab û nerîtên ku têkildarî xaneqayê ne. Bi riwangeya Nefîsî, xanegah erebîkirina xanegaha Manewiyan e ku, cihek bû ji bo çavpêketin û kombûna murtezayên Manewiyan. Lewra jî xaneqaya Îraniyan di bin bandora vê xanegayê de bû.

---

[109] -Ebdul Husêyn Zerîn Kub, *Donbalê Sofîzim*, Entişarat Emîr Kebîr, Çap ewel, Tehran,1357, r. 273.
[110] -Ebdul Husêyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiye*, r. 129.
[111] -Ebdulrefîq Heqîqet, *Tarîxê Îrfan û Arifanê Îran*, r. 44.

Xaneqa û karwanseray û tekiye di dema berê de ne beşek ji dab û nerîtên Sofîzmê bûn, lê gava bûn desteyên curbicur hino hino di nav Sofîzmê de jî belav bûn û geşe kirin. Xaneqa bi baweriya piraniya zana û nûseran di "*destpêka sedsala pêncem de hatiye nav Îslamê û Ebû Seîd jî wek damezrênerê wê tê hejmartin. Helbet ev mijar jî hatiye wergirtin ji çîroka çavpêketina emîrê xaçperestan ligel du sofiyan, qaşo xaneqa ji aliyê wî emîrê xaçperestan ve bû û di pirtûka (Nefehat el Uns) de navê wî hatiye*"[112]

Ji ber ku belgeyên piştrastkirî li ser nînin, em nikarin wê bikin belge û pişta xwe pê girê bidin.Lê sofî heta radeyekê gumana rastiyê li vê baweriyê dikin. Di xaneqayê de jî murîdan di bin çavdêriya rêber û rênîşanderiya şêx de, rêya parêzgarî û dîtinê dest pê dikirin û di nav terîqetê de ber bi kemalê diçûn.

Dûre diçûn nav desteya biratiyê û piştre jî şêx hirî poşî (xirqe) li wan murîdan dikir û cihekî taybet dida wan. Pêwendiya navbera murîd û şêx de heta dawiya jiyanê berdewam dikir. Murîd xwestek û îradeya xwe di xwestek û îradeya şêx de nefî dikir û ew bixwe ti hilbijardeyeke wî nebû. Bi rastî wî şêx wek cihnişînê (xelîfeyê) Xwedê didît û bi temamî fermanên şêx cîbicî dikir.Ev cure ji reftarkirinê her bi lezgînî di nav Îranê de geşe kir, heta wê radeya ku "*di sedsala çaran û pêncan) de tenê li Xorasanê bêhtirî 200 xaneqa û zawiye hebûn*"[113].

Yekî din ji pêwendiya navbera murîd û şêx de ew bû ku, fermandariya şêx li ser îradeya murîd hebû, bi awayekî ku murîd şêxê xwe wek agehdarê temamiya kar û reftarên xwe didît. (Swamî Muktananda) derbarê rûhanî bûna xwe li ser murîdên xwe dibêje: "*Gava ez di warê fîzîkî de ne amade jî bim, şagirtên min amadehiya min dibînin. Hokara wê jî ew e ku ez ligel şakêtî (hêza rûhanî) têkil bûm û bûm yek, şakêtî li temamiya dinyayê, li rojhilat heta rojava û ji başûr heta bakur dirêjahiya wê heye û ti kes ne ciyawaz e. Ji ber ku ez di nav murîdên xwe de bi cureya şakêtî amadeyiya min*

[112] -Celaleldîn Hemayî,*Tesewf Der Îslam*,r. 108.
[113] -Ebdulrefîq Heqîqet, *Tarîxê Îrfan û Arifan Îran*,r. 98.

*heye. Ew amadehiya min li her cih û demekê hest pê dikin, bêyî têbînîkirina cihê jiyana min û wan*"[114]

### 2.2.1 Çile Nişînî

Yek ji edet û adabên xaneqayê ew bû ku çilenişînî li ser salik (mirîd) dihate ferzkirin. Salik bi emrê şêxê xwe dest bi çilenişînî û xelwetgeriyê dikir.Fermanên şêxê terîqetê bi hûrbînî cîbicî dikir. Pirtûkên îrfanî nimûneyeke berçav ji van tevger û reftaran, ango çilenişînî di wan de heye. Ji bo vê mebestê jî girîngtirîna van xelwetan berçav dikeve, ku ew jî (Çileyên Ser û Binî) ya (Ebûl Seîd Ebûl Xêr) e ku, di nav murtezayên hindî de berbelav bû

Ew belgeyên ku sofiyan ji bo çilenişîniyê dianîn ji ayeta Quranê pêk dihat ku Xwedayê mezin gotiye (We îz Mûsa weidena erbeîne leyle/ Beqere 51).

Şemsê Tebrêzî bi tundî rexnê li wan kesan dike ku ji bo çilenişîniyê rûdinin û dibêje: ((Ebdilqadir Sehrewerdî bi sedema astengiyekê ji bo çile rûniştibû. Çend caran îlham jê re hat: Di îlhamê de jê re digotin ev astengiya te bêyî wê çareser nabe, ji bilî vî şêxê ku te dibim ziyareta wî.

- Ez li ku wî bibînim?

- Bangek bi guhê min de hat û got tu wî nabînî

- Çawa bikim?

- Ji çile derkeve derve û tevlî civakê bibe, çimkî ew qefle qefle ji bo niyaz û amadehiya wî diçin"[115] Pêwistî û erkên çile nişîniyê:*" Dema destnimêjê, Dema rojiyê, Xwarina kêm, Kêm raza, Kêm axaftin, Nefîkirina bîreweriyan, Dema xelwetê*"[116].

### 2.2.2 Hirî Poşî, Peşmîn (Xirqe)

Xirqe, yan peşmîne ango hirî poşî, di destpêkê de di nav misilmanan de ne tiştekî berbelav û rêk û pêk bû. Hinekan ev kar wek curekî ji durûtî (riyakarî) û xwenîşandanê

---

[114] -Sewamî Mogtanend, *Şoma be Koca Mîrevî*, Tercumey, Ehmed Beyt, Neşr Nesl Nu Endîş, Tehran,1383, r. 232.

[115] - Nasreldîn Sahêb Zeman, *Xet Sêvum*, r. 317- 318.

[116] -Etaella Tedîn, *Cilwehay Tesewf û Îrfan Der Îran û Cehan*, r. 653.

wesf dikirin. (Îbn Sîrîn) ev cure kar wek çavlêkeriya bîrmendên Îsa Pêxember didît, hertim doza li xwekirina cilên pempû dikir, çimkî şêwaza pêxember bû. Malik Bin Enes jî ew wek cilekî xirab didît, çimkî ti xêrek tê de tune. Hesen Beserî û Îbn Semak "*hertim rexne li wan kesan dikirin ku peşmîne (hirî) li xwe dikirin*"[117].

Cunêd Bexdadî hertim "*cilên melayan li xwe dikir. Hevalên wî jê re digotin ey şêxê terîqetê gelo ne baştir e ji ber xatirê me tu cilên pînekirî li xwe bikî? Cuneyd jî bersiva wî da, eger min bizanîba ku karek û xêrek ji destê cilên pînekirî tê, minê ji hesin û agir cil dirust bikirana û li xwe bikirana, lê her kêlî di derûna min de bangek tê û dibêje: (Leyse el îtibarû bîlxirqe inema el îtibarû baxirqe*"[118].

Îzedîn Mehmûd Kaşanî di kitêba (Misbah el Hîdaye), di beşê pêncem de dinivîse: "*Yek ji tîtal û adabên sereke yên Sofîzmê lixwekirina peşmîne, hirî poşî (xirqe) ye, lê ev kar di nav ehlê sinetê de bê belge ye*"[119].

Ev nivîsar wê yekê zelal dike ku, xirqepoşîn ji destpêka dîroka Îslamê ve ne berbelav bû û eger hin kesan ev cil li xwe kiribin jî, ji aliyê misilmanan ve tûşî navxerakirin û te`in û niçan dihatin û bi guhertina olê dihatin tawanbarkirin

### 2.2.3 Nerîta Peşmîne, (Xirqe) Dirrandin:

Nerîta sereke di semahê de ji xirqe dirrandinê pêk dihat, bi wî awayê ku pêwist bû xirqe ji laş bikin û bidirrînin û ber bi aliyê qewalan ve biavêjin, ku jê re digotin "*temzîq xirqe*" [120]Arif her dengekî awazdar ji qewal bibihîsta, rasterast bîranînek ji roja (eleste) vedikir, keftelefteke rûhî ber bi aliyê Heq jê re dirust dibû.Ew arifên ku gihîştibûn halê wecd her bi bihîstina dengê defê re dest bi sema û çepiklêxistinê dikirin, ta balindeyê rûhê xwe ku di zindana laş de asêmayî bû azad bike û vegere cîhana xwe. "*Ev adaba ku di nav civatên semahê de geş bûbû, bû adabeke sereke. Xuya dike ku ev adab jî bo serdema erebî ya cahilî ku, bi şêwaza wan her dema jin û mêrek evîndarî hevdu bûn, eger berq`i (rûpoş-hîcab) û cilên xwe dirrandiba, hingê evîna wan*

---

[117] -Ebdul Husêyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiy*, r. 41-42.
[118] -Etaella Tedîn, *Cilwehay Tesewf û Îrfan Der Îran û Cehan*, r. 201.
[119] -Êzeldîn Mehmud Kaşanî, Mosbah El-hedaye û Meftah El-kefaye, r. 106.
[120] -Mohemed Kazêm Yusêf Pûr, *Neqdê sofî*, r. 285.

*berdewam dibû, eger wiha jî nebûya êdî evîna wan bê encam dima. Mirîd jî di dema pêkanîna sema û reqsê (semahê) de, dema xirqe bi ser qewal de dida jê re digotin (xirqe sehîhe) û carina jî wiha jî bû ku xirqe ji ber xwe ve ji ber mirîd dihate der û wek (xirqeya mumezeqe) dihat binavkirin û xirqe dirrandin jî wek (çirb) yan (cirh) yan (temzîq) dihat binavkirin*"[121].

Eger dirrandina xirqeyê ji aliyê şêxekî ve rû bide êdî razîbûn li ser komelê/civatê erk bû, lê eger xirqe ji aliyê komelê/civatê ve dirraba êdî razîbûna şêx ne erk û pêwist bû. Hinek caran xirqeya (mumezeqe) didirrandin û di nav xwe de dabeş dikirin, yan dişandin xaneqayên din.Sehrewerdî di pirtûka (Ewarif el Mearif) de hedîseke pêxember (S.X) tîne û "*li gor wê hedîsê nerîta xerqe dirrandin û semakirinê pesend dike. Herwiha Ebûl Mefaxir Baxerzî amaje dide hedîseke bê belge*"[122].

### 2.2.4 Sema, Hilperrîn (Semah)

Xirqe, semah, sema û çend dab û nerîtên din di nav sofiyan de berbelav bûn, beşek ji nûser û zanayên şerîetê wek çakî yan qencî (muhsînat) binav dikin. Tevî ku ev cure tevger û reftar berovajî şerîetê ne, bi wateyeke din ev adab bi ti awayî di olê de amaje pê nehatiye kirin. Di hemû terîqetan de jî ne wekhev in, lewma jî yek hukmê wan jî nîne, lê her terîqet û grûpek ji wan adabên taybet bi xwe hebûn ku nîşandera xala bihêz a wê bû, "*ev dab û nerît ligel şerîetê hevdij bûn û ev yek jî bû sedema dijwariyê ji bo sofiyan û ew neçar kirin, da xwe pak bikin, lê hemû xwepakkirinên wan ne cihê qebûlkirinê bûn ji aliyê şerîetzanan ve, lewma jî hertim te`in û niç li wan dihatin kirin, tew li hin cihan bi gawirî û kufirê jî dihatin binavkirin*"[123].

Semah di aliyê bingeha peyvê de ji (semhê) ve hatiye, bi wateya bihîstinê û bi taybetî jî bihîstina hedîs û amojgarî û hinek caran bi maneya dengê xweş jî hatiye bikaranîn, lê di warê naverok û wateya wê ya îrfanî de tê wateya "*kêfxweşî û hal û sema*

---

[121] -Çavkanîya Berî, r. 276.
[122] -Çavkanîya Berî,r. 276.
[123] -Celaledîn Homey, *Tesewf Der Îslam*, r. 97-98.

*û hilperrîn û zîvirîn û guhdarîkirina muzîkê) Lê di adabên sofîgeriyê de tê wateya civata hilperrîn û xweşiya ligel teşrîfatê*"[124].

Sema, hilperrîn an semah rewşeke rûhanî ye, şadî û xweşiya manewî ye, bêyî baldana dinyayê, rû li cîhana jorîn e, ku di encama bihîstina awazên qewalan û hilperrîn û semayê de tê bidestxistin. Karîgeriya vê awazê li ser giyan û rûhê wî dibe sedema hilkişîna rûhê sofî. Çend amûrên wek def û ney û daholê di civatên sofiyan û di dema semahê de tên bikaranîn.

Ev civat bêhtir piştî çilenişîniyê û ji bo tazekirina hêza rûhanî û manewî hatiye sazkirin. Hinek caran ev serxweşiya sofiyan çavkaniya wê ji semahê di nav dengê balinde û dengê naqos û guveguva bayê û dengê sûlav û her awazeke din a siruştê de tê dîtin. Sofî kesek e bi her deng û vedengekê coş dibe. Ebû Osmanê Mexribî derbarê vê babetê dibêje: "*Herkesek propaganda (îdia) ya semayê, (semahê) bike û bi deng û awazên balinde û ruhberan negihe semayê (semahê), rast nabêje*"[125].

Karîgeriya muzîkê li ser mirov fermaneke zatî ye, her ji ber vê yekê jî Sadî Şîrazî di çîrokekê de zahidekî rexne dike, ku dengê xweş kar li ser nake û wî ji huştirekî kêmtir binav dike.

Sadî Şîrazî dibêje:

*Çe guft mera bilbil sehrî*

*Tu xud çe ademî kiz işq bî xeberî?*

*Auştir be şiîrê Ereb der haltust ve gurb*

*Ger zewq nîstra kuc tebê canewerî.*[126]

Helbet muzîk ne tenê ji bo tazebûna hestan e, lê ji bo laşsaxî û silametiyê jî pir girîng e, çimkî beşek ji nexweşiyên rûhî bi vê rêyê tên çareserkirin. Ji bo vê mebestê jî

[124]-Elî Ekber Efrasyab pûr, *Zîbayî Perest Der Îrfan Îslamî*, r. 25.
[125] -Mohemed Kazim Yusêf Pûr, *Neqd Sofiy*, r. 285.
[126] -Mesleh El dîn (Seîd), *Dîwan Xezelyat*,Çap Nohem, be Koşiş Xelîl Xetîb Rehber, Entişarat Mihtab, Tehran, 1377, r. 54.

komek ji jinan ku tûşî nexweşiyê bûn bi dengê neyê dihatin çareserkirin. Jinan bi bihîstina dengê neyê dest bi sema û hilperrînê dikirin heta bêhiş dibûn û di xew re diçûn. Gava ji xew hişyar jî dibûn, nexweşiya wan derbas dibû. Ev kar jî bêhtir tijekirina aliyê rûhî yê nexweşan bû. Bi wateyeke din gava ku aliyê rûhî yê mirov tûşî nearamiyê dibe, pêwistiya wî bi muzîkê heye ji bo aramkirina rûhî.

### 2.2.5 Bergirîkirina li Semayê, Hilperrînê (Semahê)

Ebû Seîd, Ehmedê Xezalî, Ruzbehan, Ewhedeldîn Kirmanî, Mewlana, ev arifên mezin ku ser bi dibistana evîndariya Sofîzmê tên hejmartin, hin kes bûn ji mezintirîn alîgir û geşekerên hilperrînê (semahê), bi rêya van kesayetiyan bû ku, hilperrîn wek nerîteke taybet bi Sofîzma Îranî dihate temaşekirin. Herçiqasî pêrewkerên din ên Sofîzmê ligel hilperrînê (semahê) ne xerîb û biyanî bûn. Lê hokarek bû daku pêrewkerên dibistana zahidên Sofîzmê wek Ebû Talib Mekkî, Ebû Nesrî Serac, Hecurî, Îmam Mihemedê Xezalî, Şehabeldîn Sehrewerdî bêhtir ji hev nêzîk bibin û beşek ji pêrewkerên terîqe û şerîetê hewla belavkirina hilperrînê (semahê) bidin û wê bi berfirehî nîşan bidin.

Bêguman hilperrîn û sema (semah), di destpêka sedsala sêyem de di nav sofiyan de bi awayekî di peristin û îbadetê de berbelav bû, yek ji tore û adabên Sofîzma Îranî bû. Şêxan hilperrîn û sema li şûna derketina şadûmaniyê datanîn.

Seîd Nefîsî di wê baweriyê de ye ku "*Sema ji dahênan Sofîzma Îranî ye, çimkî di Sofîzma Iraq û Cezîrê de ti cure behsek derbarê semayê li holê nebû, herwiha li Şamê, ta Afrîqayê fetwaya heramkirina wê jî hatibû dayîn. Semaya herî berçav û diyar di nav terîqeta Mewlûdiye de bû, di dema zikrkirinê de lingê xwe yê rastê dikin stûn û li dorawî dizîvirin. Her ev halet jî bû curek ji îbadet û peristinê jî û wek yek ji hîm û bingehên vê terîqetê tê hejmartin. Her ev hokar jî bû sedem ku ewropî semaya vê terîqetê wek derwêşên çerxa zen û semaker binav dikirin*"[127]

Humayî bawer dike ku "*Sema di pêşî de ne bi şêwazeke rêk û pêk bû, lê di destpêkê de şêx bi sedema parçe şiîrekê, yan awazekê, tevgerek nîşan dida, lê dûre ev*

---

[127] - Seîd Nefîsî, *Tesewf Der Îran*, r. 143.

*sema ligel pêkutana li ser zevî di haleta (wecdê) rasteqîn de gihîşte rewşeke rêk û pêk*"[128]. Her derbarê semayê, Rîtir dibêje: "*Semah ligel sema û muzîkê curek sergermiya civakî bû, ku di dema cejnan de dihate kirin, dûre bi rêya grûpekê guhertin bi ser de hat û bû şêwazeke cidî*"[129].

Dibe ku mumkin be bê gotin ku Ebû Seîd Ebû Xeyr yekemîn arif bû ku, bêyî tirs li Xorasanê civata semayê gerandibe. Wî bixwe jî sema kiriye û ferman kiriye bi ahenggêran bi def û tembûrê civatekê ji derwêşan re saz bikin. Ev arif bixwe çile digirt, tevî ku di dab û nerît û kultûra xaneqayê de tiştên bi vî awayî nebûn, herwiha rê ji pêkanîna wan re jî nehatibû dayîn. Lêbelê tenê sema û hal di civatê de dihat cîbicîkirin ku, şêx jî di navenda derwêşan de mijûlî semayê dibû.Ev karê Ebû Seîd bû sedemê derketina kêşe û fitneyan di navbera zana û sofiyên nerm de ku, mesele gihîşte gilîkirina li ba Sultan Mehmûd.Ew civat bûn sedem ku hem Ebû Seîd û hem derwêşên wî heta sînorê gawirî û kafiriyê dihatin birin.

Ebû Seîd Ebû Xeyr, Ehmedê Xezalî, Eyn el Qezat, Ruzbehan Beqlî, Senayî, Etar, Êraqî, Mewlana Sadî Şîrazî, Hafiz…van arifan girîngiyeke pir taybet didan semah û aheng û şewqa evîndaran, ku wek sema û zîvirîna derwêşan naskirî bû. Di vî warî de jî Tûsî (arifê sedsala 7an a koçî) dibêje: "*Her kesek semahê ne rewa bibîne, wek ku pêxember ne rewa dîtibe, her kesek jî sema û hebûna defê înkar bike, wek ku hebûna pêxember înkar kiribe*"[130]. Sema, heta radeyeke zêde di nav sofiyan de girîng bû.Heta wê endazeya ku sofiyan buhişt bêyî sema red dikirin.

Çêja semayê li ba sofiyan gihîştibû zîrveya asûdehiyê, asûdehî bi wê wateya ku di dema herî zêde ya nerehetî û nearamî û dijwariyên jiyanê de, bi pêkanîna civateke semayê veger e bo zîrveya asûdehiya derûn. Mumkin e ev jî vegere wê yekê ku sofî di dema semayê de êdî ji cîhana agehdar vediqetin û tê de namînin û dikevin halê bêhişiyê de, di vê halê de jî ji nexweşî û zehmetiyên jiyanê derbas dibin.

---

128 -Celaleldîn Homey, *Tesewf Der Îslam*, r. 111-112.
129 -Van Rîpka, *Tarîx Edebyat Îran*, Celd Ewel, r. 420.
130-Elî Ekber Efrasyab Pûr, Zîbayî Perest Der Îrfanê Îslamî r. 365.

Ji aliyekî din ve jî, sofiyan hemû pîroziyên xwe di semayê de didîtin, çimkî cîhana xwe ya agehdar wek cîhaneke şênber (madî) wêne dikirin. Li ba wan jî cîhana şênber wan ji cîhana rûhî dûr dixe û wan mijûlî xwestina dinyayê dike. Ji bo rizgarbûna ji xwestina dinyayê, tekane rê li ba wan sema bû.Tew sedema redkirina buhiştê ji aliyê hinek sofiyan ve bêyî hezkirin û semayê, girêdayî wê yekê ye ku hinek arif û sofî "*Semayê tînin rêza îbadetan, pir caran ji nimêjê zêdetir jî girîngiyê didin semayê. Bakuye Şîrazî Ebû Seîd rexne dikir, ji ber ku rê dida xort herin civatên semayê û, herwiha xoceyê Ensarî û Qeşîrî xwediyê kitêba (Esrar el Tewhîd) karîgeriyên Ebû Seîd qebûl nedikirin, lewma tûşî dijatiyê bûn bi rêbaza wî re*"[131].

Mewlanayê Romî herwekî Ehmedê Xezalî dema mijûlî muzîk û defê dibû, ev kar ji semaya evîndarane ji erk û wacibên olî bilindtir didît, Mewlana "*gava digihîşte vî halê bûn û sema (wecd û semahê) nimêj ji destê wî diçû, tew piştî hişyariyê jî sema û muzîk terk nedikir, lê nimêj nedikir*"[132]

Şêx Ehmed di nameya (Buraq elîlmah fî elred ala men yûherîmû elsemah bîlîcmah) de, ne tenê destûra semayê dide, lêbelê semayê wek yek ji erkan dijmêre û hedîs û rîwayetên sofiyan jî li ser tîne, lewra jî "*Sema û def û muzîk jî di hundirê mizgeftê de wek erk dibîne û bîr û baweriyên Ebû Henîfe û şopînerên wî red dike û desthilatxwaziyên wan wek berbend û rêgirîkirina suneta pêxember didît*"[133], Sema û hilperrîn car caran digihîşte halê telasê (cizbeyê) û di vê civatê de poşîn jî nedima. Ev ne tenê di nav mêran de, lêbelê di nav jin û mêran de jî dibû. Wêneyeke zêde û berçav di şiîr û helbestên Fexredînê Iraqî û Ewhedeldîn Kirmanî û çendên din de tê dîtin.

Emir Kemaleldîn Gazirgahî derbarê Ewhedeldîn Kirmanî dibêje: "*Ewhedeldînê Kirmanî yek ji mêrxasên mezin e ku, heta dawiya jiyana xwe ne bê çêj û sihra evînê bû. Piraniya demên xwe bi semayê dibir serî û wan demên ku agirê evînê digirt canê wî pêsîra xwe didirrand û sînga xwe rût dikir, kurê padîşah xwazyar û arezûmendê civata semayê ya wî mirovê mezin bû, derdora wî jî jê re gotin: (hogirî wê yekê bûye ku di*

---

131 -Mohemed Kazêm Yusêf Pûr, *Neqd Sofiy*, r. 281.
132 -Ebdul Huseyn Zerîn Kub, *Custicu der Tesewfê Îran*, R. 214.
133 -Çavkanîya Berî, r. 108-110.

*dema şewqê de cilên xwe û cilên kesên din bidirrîne û ew jî sînga xwe li sînga wî didin. Baştir e ku tu neçî civata kesekî bi vî rengî.)Wî jî bersiva wan da û got: Eger karekî bi vî rengî encam bide, ezê bi vê xencera xwe li sînga wî didim. Piştî ku beşdarî civata Ewhedeldînê Kirmanî bû, dilgiranê vî halî bû, lê ew mirovê mezin ji xwesteka Ewhedeldînê Kirmanî têgihîşt û di nava civata semayê de ev çarîne xwend.*

*Sehl ast mera bir ser xencer buden*

*Der pay dest mera bî serugerden buden*

*Ne amide ay ke kafir bukişî*

*Xazî çun tuyî, rewast kafir buden*

*Piştî vê yekê kurê paşê bê aram dibe û pêsîra xwe didirrîne û bi ser lingê wî de ket, şêx jî ewqasî dilcoşê wî bû, dema dest û dilê wî ji kar ketin, ev çarîne xwend*"[134].

Lewra mumkin e bê gotin ku, sema di nav civatên arif û sofiyan de berbelav bû, û destûrdayî bû bi taybetî jî arifên Îranê, tevî ku dijberiyeke mezin li dijî wan hat kirin û hinek caran wek rêwindakirî û ji olê derketî hatin binavkirin, lê her berdewamî pê dan û wek beşekî girîng yê olê û bigre ji olê jî baştir binav kirin. Wek kultûr û peristineke dînî jî bi vê babetê re tevger hatiye kirin û çend belge û şîrovekirinên cuda ji bo vê mebestê nîşan dane, lê sema li hinek welatên erebî û sinî mezheb jî, nemaze hatiye redkirin û pêrewkerên wê jî, wek kafir hatine binavkirin, bi taybetî li welatê Şam û Misrê, arifan di nav civatên sema û muzîk û defê de hemû bedewî didîtin.

Wan bedewî û xweşiya hemû tiştan di bedewiya muzîk û defê de didît, heta gihîşte wê astê ku buhişt û dojehê jî bînin nav mijar û babetên xwe û tew helbestvanên arif beşekî wêjeya xwe ji bo vê mebestê terxan kirin. Mehwî û Fexredînê Eraqî û Mewlana Romî û Hafiz, tew buhiştê bêyî evîn û semayê red dikin. Mehwî jî di dojehê de jiyan pê xweştir e ji buhiştê bi şertê ku evîna heqîqetê tê de be. Ji bo gihîştina bi evîna xwe jî çend rêwresm û reftarên wan hene, yek ji wan sema û def û ney e, ev amûrên muzîkê ku

134 -Elî Efrasyab Pûr, *Zîbayî Perest der Îrfanê Îslamî*, r. 378.

di semaya arifan de hatine bikaranîn, di helbestên Fexredîn û Mehwî de bi şêweyekî berçav tên dîtin.

### 2.2.6 Hokarên Rêdana sema, Reqsê (Semahê) li ba Arifan:

Arif û sofiyan gelek ayetên wek "*Febeşir îbadî elezîne yestemiûne elqewle feyetebnûne ehsenehû)) (Zimr 18-19) vê ayetê wek sedemê berbelavbûna semayê dibînin, herwiha ayeta (Inneke la tesmeiû elmewta wela tesmeiû elsûmme eldûaa) (Nemil/80) û (Weinnehûmû hûne elsemiû lemeizûlûn) (Şûeraa /212). Ji bo wesfkirina wan kesan bikar dianîn ku sema û reqs înkar dikirin, çimkî wan ji deng û awazên xweş ti çêjek wernedigirtin, ji ber ku guhê hundirê wan li hember rastiyan kerr bû*"[135].

Ebû Talibê Mekkî yek e ji wan kesên ku sema û dîlankirin wek babeteke berbelav jimartiye û cîbicîkirina wê jî baş dîtiye. Ew di wê baweriyê de bû ku, eger cîbicîkirina sema û reqsê û muzîk û stranê nebe sedemê tawana şer`î bê kelem e û destûrdayî ye. Di vî warî de çîrokekê derbarê peydabûna semayê jî vedibêje: ((*Ji dema Îbn Eta, Îbn Ebî Rebah, heta niha ev nerît li Hîcazê birêve çûye, Herwiha Suhrewerdî jî di pirtûka (Ewarif Elmearif) de li ser zarê Ebû Talib vedibêje, ku ew dibêje: Eger em sema û reqsê înkar bikin, gotina 70 kesî ji wan kesên ku bawerpêkirî ne red dikin. Lê em karekî bi vî rengî encam nadin. Çimkî em hin tiştan dizanin û fêrî wan bûne ku mumkin e hin kesên din bi wan nizanibin. Ji ber ku me ji heval û hevawayên wan bihîstiye, lê wan kesên din nebihîstine?! Seidî Şîrazî ligel pêrewkerên sema û reqsê bû.Bi vî awayî jî diyar dibe ku derbarê sema û dîlanê bi şêxê xwe (Şehabedîn Suhrewerdî) re ne hemfikir bû. Çimkî Sofîzma Suhrewerdî, Sofîzmeke zahidane ye, lê Sofîzma Seidî Sofîzemeke mişt sema û reqs û bêhişî bû*"[136].

Kurtiya Sofîzmê di sema û dîlan û wecdê de ye.Tenê di vê haletê de sema û govend dirûveke dînî werdigire û ji her cure reng û nezanî û xwenîşandanekê bêpar dibe. "*Arifê rasteqîn di civata bi vî rengî de, bi bihîstina hevokekê, yan awazeke dilrevîn ya qewalekî, yan bihîstina dengê zikrê yê mirîdan, ku civat girêdane û car caran jî radiwestin û piyên xwe bi rêk û pêkî li erdê didin, yan destê xwe li sînga xwe didin û*

[135] -Ezeldîn Mihemed Kaşanî, *Mosbah elhidaye û Mefteh El-kefaye*, r. 133.
[136] -Etalah Tedîn, *Celvêhay Tesevuf û Îrfan der Îran û Cehan*, r. 243- 244.

*hinek haletên din, ku taybet bûn bi van civatan digihin bûnê (wecdê) ji bûna xwe ya şênber cuda dibin û bêyî vîn û xwesteka xwe dest bi kêferatê dikin, ku di gewdeyên wan de ye, çimkî rêk û pêk e û hino hino dirêj dibe, heta digihe sema û reqs û dîlanê û bi bîra sofiyên perîşan hal, arif di vê demê de nêzîkî xwedayê xwe dibe, çimkî di wê haletê de ye ku perde û hîcab tên hilanîn*"[137]. Xezalî derbarê semayê dibêje: "*Binere ku sema haletekê di dil de saz dike, jê re dibêjin bûn (wecd) û wecd dibe miherikê (teşwîqkerê) endam û derdorê. Eger ne rêk û pêk be, jê re dibêjin têkdayî, eger rêk û pêk be jî jê re dibêjin sema*"[138] Xezalî di serdema xortaniyê de ku ji ber fêrbûna zanistê ew babet ji welatê (Tûs) guhastibû Nîşapûrê, wan çaxên ku jin ne anîbû serdana civatên semaya wecdê yên sofiyan dikir. Mela Mehmûdê Feyzî Kaşanî li ser semayê û nêzîkî baweriya Xezalî dibêje: "*Sema hin caran heram e û hin carên din jî destûrdayî ye û carina jî daxwazkirê ye û carina ne daxwazkirî ye, ji bo piraniya kur û keçan heram e, ji ber ku şehweta wan ya wecdê ya raketî dilivîne û dilê wan ber bi aliyê xirab ve dibe. Ne daxwazkirî ye ji bo wan kesên ku ber bi aliyê xirab ve naçin, destûrdayî ye ji bo wan kesên ku ji bilî çêjwergirtina ji dengekî xweş tiştekî din nakin, daxwazkirî ye ji bo wan dildarên ku şeyda û aşiqên evîna xwedayî ne û sema û stran karekî dike ligel wan, dibe sedemê tevdana vê evîna safî û şêrîn*"[139].

---

[137] -Hena Fexurî û Xelîl Cer, *Tarîx felse Der cehan Îslamî*, r. 282.
[138] -Muhamad Xezalî, *Ehya Olum Eldîn*, Celdê Duvum, r. 367.
[139] -Ebdulkerîm Seuş, *Qese Erbab Merêfet*, r. 24.

## 3 ÇEMK Û ZARAWEYÊN IRFANÎ DI HELBESTÊN(FEXREDÎNÊ IRAQ Û MEHUYÎ) DE

Aşkeraye ku di cîhana sofîzm û irfanî de du babetên giring hene, ya yekê maqamên sofîzm û irfanî ye, ya duyem jî rewş in. Li gel wan her du babetean jî gelek çemk û zaraweyên din jî hene ku bîr û ramanên zilamên mezin ên wê rêyê wan çemk û zarawane ti yekê jî li meqam û rewşan kêmtir nîne, pêwîste li ser her rêvîngekê rêger ê sofîzm û irfanî yê vê zaraweya rewş û meqamane ku di çend astekî cor bi corin tê de derbas dibin, wê demê rêvîng ji bo bigehe heqîqeta rizgariyê û hemû hêza xwe ya karînê û xwe damalîna ji mirov bûnê ve, pêwîste yek bi yek wan maqam û rewşane de derbas bibe. Maqam pêktê ji wê ast û mertebeyan ku yek ji yekê û berdewambûna ku rêvîngiya rêya sofîzmê re pêwîste tê de derbas bibe, ev jî tê wê wateyê ku rêvîng di maqamekê de ye ku pêwîste bi temamî şiyanê wê meqamê be û hemû erkên xwe bicîh bîne, heta wê dema ku amadebûna wî temam bibe, pêngavên pêwîst bavêje ber bi maqamekî din. Bo vê rê û rêveçûna rêvîngiya (salk) xwe hest bi kamilbûn ango geheştîbûnê dike û di wê maqamê de piştî ku ruhê wî molet dide bo ber bi astekî bilindtir ku pêngav bavêje, êdî di wê maqamê de namîne, ji ber wê rêveçûn û fenabûna ku bixwe hest pê dike di wê maqamê de, rêvîng berdewam çavdêriyê li nefs û merîfetên xwe dike, dema ku merîfetê wî geheşte astekî bilind û rabûn û rûniştinên wî hêdî hêdî ber bi bilindbûnê ve heldikşê, heta wê dema ku rêvîng hest bixwe dike ku êdî di wê maqamê de fenabûye û xwe di maqamekî bilindtir de dibîne.

Zarawayê rewş, ango hal û maqam heta naha jî rêveçûnên cor bi cor li ser hene, di wateyeke din de heta naha hejmara hal û maqaman bi rast û dirustî nehatiye zanîn ka çend hal û meqamin, lê hin kes dibêjin hejmara maqaman (deh) meqamin, hin kesên din jî dibêjin (panzdeh) maqamin û li gor nêrîn cuda jî hejmara maqaman ji wê zêdetire ji wê hejmarê, lê dikare bê gotin ku hejmara maqaman (deh) meqam bin, ew (deh) maqamane dibine sîvanek û maqamên din di bin vê sîvanê de komdibin, ev yek tê

wateyê ku dibin bin û bingehek bo maqamên din, di wateyeke din de eger ew (deh) maqame bi "*saqî darekî biçîne, wê demê maqamên din dibin çiq û şaxên wê*"[140]

Wa di derbarê maqaman de waha ye, lê derbarê hejmara hal û rewşan de jî heman pirsgirêk serî radike, li gel têkelkirina hal û maqaman li gel yek û li gel zarawayên din ên rêvîngên rêya sofîzm û irfanê û her ji ber wan sedeman em nikarin heman nêrînên dûbare û ne rast binîvsînin, di vê lêkolînê de em hewldidin hemû zarawayên hal û maqaman, çemk û zarawayên din ên sofîzm û irfaniyê bê cudakirina wan ji hev binîvsînin, bi taybet jî ew zarawayên ku di honandinên Fexredînê Iraqî û Mehuyî de amadene emê hewl bidin binivsînin.

## 3.1 Tevbe (Tobe)

yekemîn payeya irfan û sofîzmê meqama tobekirinê ye, rêvîng (Salk)karê wî yê yekemîn ku destpê dike tobe ye, tobekirin mijarekî olî, kiryarî û irfanî ye, tê wateya poşmaniyê û vegera bo gel xwedê ye, tobe di ayet û xwedê di fermê û amaje pê kiriye, herwaha di pêlekanên terîqatê de jî xwedî pêgehekî giringe. Tobekirin wek zarawayekî irfanû û wek payeyekî, dest ji gelek tiştên cîhanê kêşane, ku nahêlin mirov xwe bigehîne xwedê.Tobekirina yekem payeya rêvîngiya rêya sofîzmê, irfan û mercê xwe gehandina xwedê ye û dema ku rêvîngê rêya xwedê tobe kir carekedin ji wê tobekirinê poşman nabe û ji wê tobekirinê re jî tê gotin tobeya nesûh. Tobekirin di wateya irfanî de pêktê ji "*vegera hewlên xwe ji kesên xirap dûrxistinê û ji tiştên nayên pejirandin dûrketine, ber bi kesên baş û rewşekî ku tê pejirandin ve çûyîn û di encamê de hemû tiştên ku dihêlin mirov di rêya geheştina xwedê de astengin ji wan dûrketinê pênase dike*"[141] Arif û sofiyên bi navûbang jî derbarê tobekirinê de nêrînên wan ji hev cuda ne. "*Cuneyd dibêje: Tobekirin tê wateya ku tu gunehên xwe jibîr bikî, Sehîl gotiye; Tobekirin tê wateya ku tu dervey xwedê hertiştî ji bîr bikî ye, Rûyem gotiye; Tobekirin tê wateya ku tobe li tobekirinê bikî* "[142], Li gel ehlên sofîzmê di yekem qonaxê de tobekirin dibe sedemê paqijkirina nefsê ye, ji bo vê jî pênase û nasandina tobekirinê de nivîs û

---

[140] -Şêx Emîn Şêx Ela Eldîn Neqişbendî, *Tesewf Çîye*?, *Ç*apî Sêyem, *Ç*apxaney Çwar *Ç*ira, Silêmanî, 2015, r. 195.

[141] -Perwîn Eruc Niya,*Tewbe*,Cela Heştem, *Danşnaey Chanî Îslamî*, Beserperşt Xulam Eli Hedad, Neşr Binyad Dayrey Mearif Îslamî, Tehran, 1383, r. 376.

[142] -Îbrahîm Ehmed Şwan, *Ferhengî Sofiyaneyî Dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 84.

lêkolînekî zêde li ser hatiye kirin. di beşek wan penaseyên ku bo tobekirinê hatine kirin de cudayiyek di navbera tobe û Anabe de hatiye kirin. Anabe wek payeyek bilindtir ji tobekirinê hatiye pênase kirin. Anabe tê wateya vegeryana gel xwedê bixwe ye. Hin caran jî Anabe wek beşek ji tobekirinê hatiye pênase kirin û tobekirin du care"*(Tobe-anabe) û tobekirina (Bersiv dayînê), tobekirina (Anabe) ji tirsa xwedê ye û tobekirina (bersiv dayîne) ji ber şerm û ji ber nezîkbûna xwedê ya li evdên xwe ye*"[143]. Li gor nêrînên hin rêvîngên rêya irfanî û li gor baweriya wan, heqîqet ango rastiya tobekirinê derbasbûne li tobekirinê, bi wateyekî din tobe li tobekirinê ye, her ji ber vê jî eger em li ser nêrînên Rûyem hinekê bi ponijin, armanca wî zêdetir irfaniye. Ji Rûyemê kurê Ehmed pirskirin tobekirin çiye?got: "*Tobekirin ew e li tobekirinê tobe bikî* "[144]. Ev nêrîna Rûyemê kurê Ehmed wek nêrîn û pênaseya herî maqûl tê hesibandin, li gel arifan. Ji ber tiştê ku gunehe di xwezaya mirov de heye, rastiya tobekirina bi temamî nayê bidest xistin, rêvîng (salik)divê berdewam di rewşa tobekirinê de be.

Quşeyriye di pênasekirina tobekirinê de dibêje: "*Tobekirin yekem pêngave ji pêngavên sofîzm û irfanê, yekem payeye ji payeyên ku rêvîngê wê rêyê ne(kesên ku keşif dikin) tobe ji aliyê peyv ve tê wateya vegerê, ji aliyê şerîetê ve vegera ji tiştên xirap, bo gel kar û kiryarên pesinder*"[145].

Hocurî derbarê tobekirinê de dibêje: (*Bizane tobekirin wek peyv tê wateye vegerê û wek dibêje: ( Tab, ayricie) vegera pêşî girtinên (nehî) yên xwedayê mezin, ber bi wan tiştên bi pesnin, sedemê tobekirinê tirsa ji îşkenceyên xwedayê mezin û rabûna dilê ji xewa bê agah û dîtina şûreya henûkeyiye*"[146].

Bi ponijandina li her du pênaseyên Quşeyrî û Hocurî ew tişte bo me ronî dibe ku bîr û ramanên her du nivîskaran ên derbarê tobekirinê çawanin, ne tenê pênase ji ber

---

[143] -Ebubekir Mihemed Klabazî, *Kitab Tearof*, Tercumey Mihemed Cewad Şerîetî, Entişaratr Esatiyr, Tehran, 1370, r. 93.
[144] -Ebu Nesir Sirac Tusî, *Lil leme fî Tesawf*, Teshîh û Tehşîye Rînold Alin Niklison, Tercumey Mehdî Micteba, neşr Esatiyr, Tehran, 1381, r. 43.
[145] -Ebdul kerîm Bin Hewazin Qeşîrî, *Risalêy Qeşîrî*, r. 137.
[146] -Ebu Hesen Elî Bin Osman Hecuyrî, *Keşif El Mehcur*, r. 430.

dabeşkirina tobe li ser astên cuda de dîsa hevbîrin, ji ber baweriya Quşeyrî de sê mercên tobekirinê hene, ew jî ew in:

"*1-Poşman bûna ji wan tiştan ku wek dijatiya xwedê hatine pênase kirin.*

*2-Destkêşana ji xirabiyan.*

*3-Niyet kirina ku carekedin nevegeryana wan gunehane*"[147].

Derbarê pênaseya tobekirinê de Fexreldînê Eraqî dibêje:

*Iraqî tobeya xwe careke din dişkêne*

*Ji ber evîna xwedê de bû dîn û har*[148]

Bi nêrîna Eraqî bo tobekirinê de heman nêrîna (Rûyem)e bo tobekirinê. Ji ber Iraqî jî wek Rûyem baweriya wî de rawestandina tobekirinê tuneye, ji ber pêwîst dizane tobe jî bê şikandin. Di demekî ku Cam (Dilê Arif) bigehe heskirina rasteqîn a xwedê û di wê rewşê de jî ku arif bigehe heskirina rasteqîn êdî ne mirovekî madî ye û ber bi cîhana ruhanî û fenabûnê de pêngav davê je, di wê cîhanê de jî ku cîhan fenafîllahe mirov ti erkekî (teklîf) li ser nîne, ji ber ew êdî qutbûye ji erk, ji aliyekê ve geheştiye bi maf ango heq, ji aliyeke din ve jî êdî dîn û bê agahe ji mesele û babetên evîna heqîqî û rastî de, di wateye honandina çend zarawayekî irfanî de wek (Tobekirin, defer(dilê arif), evîna xwedê, dînbûn) di wê derê de heye. Mehwî dibêje:

*Le nawa basî tobey tu bû emrro ey sitemger şox!*

*Bixe em tewbe paşî kuştinî min, tobî û pîrt* [149]

Zarawayên (Tobe, şoxî sitemger, kuştin, pîr) ku ew hemû peyvên zarawayên irfanî û sofîzmê ne û Mehwî di bin bandora bîr û nêrîna irfanî de ye, dixwaze vê yekê bibêje

---

[147] -Ebdul kerîm bin Hewazin Qeşîrî, *Risalêy Qeşîrî*, r. 130-131.

[148] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, be Seî Cewad Nurbexş, Neşe Xeneqay Neamet Elahî, r. 12.

[149] -Mela Ebdul kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehuyî*, Jmareyî Çapî Yekem, Çapxaneyî Rena , Sine, 1392, r. 99.

ku şikandina tobeyê tiştekî asayî ye, herwekî ku Fexredînê Eraqî ew jî daxwazê li heskiriya xwe ya sitemkar dike, tobekirina xwe bişkêne, ji ber şox a heskiriya wî biryara tobekirinê daye, ji bo vê jî Mehwî daxwazê jê dike û dibêje, ji ber ew pîrê ku li pêş wî dikevî tobeyê, ku li ser destê wî berî ku tu tobe bikî di xew de min bikûje û piştre tobe bike, di babeta şikandina tobekirinê de Mehwî heman bîr û ramana Fexredînê Eraqî û irfanî di pejirîne. Ev yek jî nêzîkbûna Mehwî û Eraqî ya ji hev re derdêxe hole. Eraqî dibêje:

*Bide defrêk û tobe bişkê base*

*Bide û xwe rizgar bike li wê zuhdeya derew* [150]

Zaraweyên (defir, tobe, rizgarbûn, zuhd, derew, riya) peyv û zarawayên irfanî ne, Eraqî jî daxwaza qedeha mey dike û dixwaze ew tobeya ku kiriye bişkêne, ji ber tenê xwediyê wê çareseriyê ye bo rizgarbûna ji cîhana naxwaze, firt û fêlên zahîdan. Eraqî bi rêya bi dest anîna defir (dilê arif) ve dixwaze rûyê xirab ê zahîdan aşkera bike, ango bi wateyekî din, Eraqî dixwaze bi rêya bi destanîna defir (dilê arif) ve bigehine rastî û heqîqeta hebûn û fenafîlah, ji ber bi rêya serxoşiyê ve arif digehe rewşa fenafîllah û bi ti awayekê di cîhana madî de namîne, herwaha riyakar û derewînên wek zahîd bangevaziyê dikin, bi dîtina zahîd ve bi xirabîzaniyê ve şikandina tobekirinê ye. Mehwî heman nêrînên Fexredînê Eraqê di pejirîne, lê vê carê daxwaza peşîmanbûnê li zahîdan dike.

Mehwî dibêje:

*Nêzîke mirina te ey pîrê zahîd*

*Vere em tobe bikin, êdî bes e riya* [151]

Çemk û zarawayên (mirin, pîrê zahîd, tobe, riya) ev hemû peyvane ji zarawayên irfanî ne, di vê beyta honandinê de Mehwî wek Fexredînê Iraqî nêrînên xwe yên bo danûstandinên zahîd aşkera dike, ji ber Mehwî kar û helwêstê zahîdan wek riyakarî û

[150] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r.  267.
[151] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehuyî*, r. 197.

derewîn pênase dike, herwaha hemû ew perestiyên ku zahîd pêktînin, karên ne di cîh de ne û divê jê tobe bikin û ji kiryarên xwe vegerin, elbet ev bi dîtina Ferxedînê Eraqî û Mehuyî ve waha ye. Lê Mehwî berevajî Eraqî ve di vê beytê de daxwaz ji zahîd dike ku tobe bike û vegere ser rêya rast û dest li riyakariyê berde. Ev beyta Mehwî dibe ku piştî derbaskirina maqama tobekirinê hatibe gotin. Ji ber di maqama tobekirinê de arif berdewam di tobekirinê de ye, ji ber vê jî Mehwî ew maqam derbas kiriye û geheştiye bi maqamekî bilind û dixwaze zahîd jî li gel xwe rizgar bike û ji rewşa ku tê de ye derbêxe.

Di vê beytê de Mehwî daxwaz li pîrê zahîd dike û amaje bi vê yekê dike ku dest li riyakirinê berde û li gel Mehuyî li kar û kiryarên xwe yên xirab tobe bikin.

Herçend Mehwî bixwe kesekî arif û navdare jî, lê bixwe xwe wek gunehkarekê pênase dike, daxwazê li xweda dike ku wî bibexşê û bi baweriya Mehwî bexşîn û lêborîna wî li gel xwedê ye û li gel xwedê jî ew yek ti demekê têknaçe .

Her ji ber vê jî Mehwî dibêjê:

*Çi xweşe bi wan hemû tiştan ve yarebî tu min bibexşî*

*Bibexşe bigre dojehê xweliya vê kêm bû yek misqal* [152]

### 3.2 Xwenîşandan Ango Tezahûr (tecelî )

xwenîşandan (Tecelî) xwedî payeyekî berfirehe, her zindiyek li gor hêza xwe ya hebûnê ku di derûniya wî bixwe de hêza ku heyî ve, di gerdûnê de xwedî cîh û giringiyekê ye û dikarê li gor wê yekê ve jî dikare payeyekî xwenîşandanê jî bidest bixe. Xwenîşandan (tecelî) tê wateya ku "*derketina nûr û roniya ji xeybê bo dil an e*"[153]. Bi vê wateyê ve ku merce, dema ku arifek tiştekî dibîne di heman demê de, di nav wî tiştî bixwe de xwe bixwe jî bibîne, herwaha di wê demê de xwedê jî dîtiye, lê nikare aşkera bike, ji ber ku ew heybet û meziniya xwedê zimanê wan girêdide û xwedê di berxwe de di xwe de rasterast winda dikin, her ji bo wê jî "*gotine xwenîşandan (tecelî) çûna aliyekê*

[152] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*dîwanî Mehuyî*, r. 217.
[153]-Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Ferhengî Sofyaneyî Dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 78.

*ya perdeyê mirovahiyê ye, ne ku xwedê reng û hebûna xwe bigohere*"[154]. Ebubekir Kelabazî bi zimanê sihlî tosterî ve dibêje: Xwenîşandan (Tecelî) sê awayên wê hene.

Yekem: Xwenîşandan bixwe(Teceliya zat): Li dû çûn, hevpeydakirin (Mekaşife) jî jê re tê gotin, ango tê wateya lû dû ketinên dile di cîhanê de, ev jî tê wateya ku dema tu evdê xwedê bî û tu wî diparêzî, divê bi awayekî be ku xwedê li pêş çavên te wek Ebdulayê kurê Omer dibêje "*Di tewafkirinê de me xwedê didît*"[155]. Duyem: xwenîşandana bi sifetê te bi xwe be(Teceliya sifatê zat): Armanc derketina xwedê di cîhê tiştekî de ye û "*Hêza xwedê di wî kesî de derdikeve pêş û dervey wî ji çi tiştekî din natirse û ji bo wî kesî xwedê tenê bes e û daxwazê ji tu kesekî din nake*" [156].

Sêyem: Xwenîşandan desthilatiya xwe (Teceliya hakim zat) di vê derê de jî armanc li cîhana axiretê ye, her tiştekî li wê derê em bi dest dixin, di teorî û heqîqeta irfanî û rastiya îşraqî de û tama xulqandina cîhanê pêktê ji "*Derketina heq ango maf, ku hemû tiştek wî xulqandiye, derketina wê jî bi çenda awayane, ji wana derkeftina xweşikiyê, derketina celalî û navê wî û kiryarên wî*"[157]. Di irfana îslamî de mirov divê heqîqeta xwe nasbike û bibîne.

Fexredînê Eraqî di vê beytê de ji bo xwenîşandanê (tecelî) waha dibêje:

*Serê în cam ve badê keşf konem*

*nezdê ta xeltrê û hav mêy kodam est û cam badê kodam?*

*Baz tuvîm kê: zernet û zê bûset buyê vucud est û rengê nûr*

*mî tecelî yê zat û camê kelamê sefat* [158]

---

[154] -Ebubekir Mihemed Kulabazî, *Kitab Terof*, r. 121.
[155]-Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Ferhengî Sofyaney Dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 78.
[156] -Çavkanîya Berî, r. 78.
[157] -Çavkanîya Berî, r. 78.
[158] -Ferxedînî Ibrahî Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay* , r. 155.

Di vê beyta ku hatî honandin de Eraqî çend mijarên irfanî bikaraniye û ji wan jî (mey, cam, keşif, vucûd, nur) ku di irfana îslamî de pêwîste mirov heqîqet û rastiya xwe binase û bibîne, Eraqî di vê beytê de dibêje:

Di encamê de aliyên veşartî yên cam û badeya şarabê ku heqîqeta hebûna min bixwe ye û min dîtiye, di bersiva xwe de dibêje mey xwenîşandana zatê xwedê ye û cam ango şûşeya şerabê jî axaftina pîroz e.

Eraqî dibêje:

*Reng ve zê buset buyê vucd est û rengê nûr*

*Mêy teceliyê zat û camê kelamê sêfat*[159]

Ew aliyên irfanî yên di vê beytê de derketiye pêş pêktên ji (vucud, nûr, zat, cam, kelam û sifet) wateya beyta honandinê jî bi wî awayî ye, Iraqî vesf û pênaseya xwenîşandana sifetê xwedavendê dike û dibêje ku dema xwenîşandana sifetê xwedê xwe nîşan bide her tiştek ber bi hevrengî bûnê ve diçe û tu rengê yekitî û yekbûnê dibînî.

Derbarê xwe nîşandanê (Tecelî) de mehuyî dibêje:

*Le perdeyî cîlveyek ta ronimaye şurî sed mehşer*

*Nîqabiyek lade lew çêhre bibîne zelzeleyî mexluq*[160]

Di vê beytê de zarawayên (perde, cîlve, şor (hera) mehşer, nîqab, çêhre, zelzele) hemû jî zarawayên irfanî ne, Mehuyî dixwaze ronahî kirinekê bi Meşûqa xwe re bide û behsekê li piraniya dildarên xwe re bike, ku amadey dîtina derketina wî ne, her ku roja yar derdikeve hemû sî û sîbera evînê bilind dibe û diçe, her wek di roja lê pirsîna mahşerê tê, dîsa rûyê xwe derbixe ey yar bila sed mahşer rabin û hemû mexlûqat bihejîn û wekî ku erd û esman hemû bi lerze. Dibe ku di vê lerizandinê de têkelbûn di navbera xwedê û mirov de ava bibe, hemû mexlûqat li gel xwedavend têkel bibin û hevreng bûn ava bibe, di wê derê de jî yekitî û yekbûn dibînin, di bîr û ramana her du helbestvanan de

[159] -*Ç*avkanîya Berî, r. 155.

[160] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm, *D*îwanî Mehuyî, r. 250.

jî xwenîşandana xwedê pênase dike û êdî mirov mirov nîne, ji ber hevrengbûn û têkel bûn di navbera xwedê û evdên wî de pêktê.

Iraqî dibêje:

*Roşen ter est dem bê dem envarê kaynat*

*Ez nûrê bî nêhayet ruhê menverem*

*Roşenter est vucudê teceliyê zatê heq*

*Bênêmudê rencê budê bu comlêyê yek serem*[161]

Zarawayên ku di vê beytê de derdikevin pêş jî zarawayên irfanî ne, di vê beytê de Eraqî amaje bi derketina xwenîşandana xwedê dike ku di ruhê Eraqî bixwe de xwenîşandaye, bi vê yekê ve jî kariye ruhê Eraqî li ruhê xwedê de serî radike, ji bo wê jî Eraqî dibêje temamê tiştên ku di cîhanê de hatine ava kirin, nura xwe xwe ji nûr û ronahiya ruhê min verdigrin,  di vê derê de dibe Eraqî jî wekî (Hellac, Bayezidê Bistem...hwd.) bibêje ez jî xweda me, lê bi awayekî din û remz û sembolên din ên veşartî ve....

Mehwî dibêje:

*Ke tu derkewtî nalle û giriye coşa*

*Niye em cîlwe xeyrî berqî lamîi*[162]

Zarawayên (girye, nalle, cîlwe, berq, tîşkder (lamîi) peyvên irfanî ne û her yek li wan zarawane bo armancekî tên bikaranîn ku cudaye ji wan wateyên ku li risteya asayî de tê bikaranîn. Wateya beyta hatî honandin jî waha ye, ku Mehwî jî hest bi derketina xwenîşandana xwedê kiriye. Ji ber ku xwenîşandana xwedê derketiye pêş, êdî Mehwî ti aramiyek bo nemaye û dest bi giryan û helandinê kiriye, ew helyan jî her wekî ku Mehwî dibêje bi dervey xwenîşandana nûra xwedê tiştekî din nîne, di vê derê de heman

161 -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 324.
162 -Çavkanîya Berî, r. 298.

armanca Eraqî dûbare dibe, ji ber Eraqî dibêje temamê nûr (tîşk) di ruhê min de ye, ji ber nûr û xwenîşandana xwedê ketiye ruhê min de, di vê derê de armanca Mehwî jî hest bi derketina cîlwe ango xwenîşandana yar dike, ji ber ronahiya berq ango karebaya wê tîşkên xwe dide û dikare bê gotin ku Mehwî armanca wî xwenîşandana xwedê ye, her wekî ku Eraqî dibêje Mehwî amaje bi derketina xwenîşandana xwedê dike. ew xwenîşandan jî wa li Mehwî dike ku cîhan wek tem û mij bê ber çavê wî û her

wek Mehwî dibêje:

*Brîqey berqî cîlwey kê celabexşî bînayme*

*Ke qursî aftab û mee wek tem dête berçawim*[163]

Mehwî çend zarawayeke irfanî bikar aniye (brîqe (tîşk), berq, cîlwe, celabexiş) Mehwî bi mêjiyeke ecêbmayî ve di pirse gelo xwenîşandan û derketina kiye heta vê endazeyê bandor li ser min kiriye, bînîna çavên min vê roj û heyva mezin wek tem û mijekê ez dibînim, dibe tenê xwenîşandana zatê xwedê ve dikare heta vê astê be ku mirov rastî rewşekî waha bê, ji ber vê jî di cîhekî dî de hem xwenîşandan wa lê kiriye ku wek dîn û harekê lê bê û wek dîvaneyekê lê bê.

Mehwî dibêje:

*Çi berqî cîlweyek hewrî beharî kirduwe bê tab*

*Be nale û giriye we dêt û diçe wek taze dêwane*[164]

Zarawayên ber (brusk, di zarawayên irfanî de yekem nûre ku di ewdan de derdikeve û wan ber bi xwedavend da nêzîk dike) cîlwe (xwenîşandan (tecelî), bê tab, bê hêz, bê wuze) nale (di zarawayên irfanî de tê wateya derbaskirinê) girîn, dîwane (hin caran bi wateya pîrên terîqetê de tê bikar anîn) çemk û zarawayê irfanî de, di bin wateya zarawayên irfanî de armanca Mehwî derdikeve ku, Mehwî di vê beytê de pirsa vê dike ku, gelo dibe derketin û xwenîşandana (tecelî) kî be waha li ewr û biharê kiribe ku wek

---

[163] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 298.
[164] -Çavkanîya Berî, r.  361.

dîwaneyekê her mijûlê giriyê û nalînê be. Mehwî dixwaze vê bibêje, ku çawa dîwaneyek (Mehwî bixwe ye) mijûlê girî û nalînê ye, herwaha bi wî awayî ewr û bihar nale nala wane û digirîn. Di dîtina Mehwî de dema ku xwenîşandana (tecelî) xwedê derdikeve ne tenê Mehwî, kesekî nû dîwane û arif û heta ewrên biharê jî êdî nikarin aram bimîne û wek Mehwî dest bi nale nalê û hatinûçûnê dike, heta wê dema ku ewr êdî dest bi baranê dikin. Baran (feyz ê heqê xwedayî) ye, dema ku feyz ê heqê xwedayî xwenîşanda, êdî her tiştek wateya xwe winda dikin û hemû dibin yek, wê demê cudayî di navbera min û te da namîne, ew jî tê wateya ku cudayî di navbera xwedê û ewd de namîne. Ev diyardeye li gel helbestvanên faris tişteke diyare û Mehwî jî veguhestiye bo nav wêjeya irfanî ya kurdî, ji vê derê ve nêzîkbûna di navbera Mehwî û Eraqî de zêdetir ronî dibe, lê Eraqî bi awayekî ronî û rewan armanca xwe aşkera kiriye û Mehwî jî bi awayekî veşartî û bi remz e, ev jî ji ber aliyên civakî û herêmî yên Mehwî sedema xwe digre, dibe ku Mehwî li herêmeke din a wek (Şam, Xorasan) jiyan kiriba wek Eraqî bi ronî û aşkerayî behsa derketiba xwenîşandana (tecelî) ruhê xwedê kiriba di ruhê xwe de.

### 3.3 Hogiriya Xidugirtinê ( Ons )

Hogiriya Xidugirtinê (ons, ens) ew zarawaye yek ji wan rewşan tê hesibandin ku dikare ji aliyê sofî û arifan ve, hogirî, xidûgirtine (ens, yan jî ons). Ji aliyê wateya ziman ve tê wateya ku şadbûn û dilxweşiyê, dema ku mirov digehe bi armancên xwe rastî şadî û xweşiyê tê, bi wateyeke din hemû ew tiştên ku dibe sedemê dilxweşiya mirovin. Corcanî derbarê hogiriya, xidûgirtinê de dibêje "*ons li gel heybet di irfan de du rewşin, ji ser ve (qibz û bisg) in, her bi vî aliye ve (qibz û bisg) li ser tirs û tîka (xof û rîca) ne*)."[165].Quşeyrî heman nêrîn û ramanên Corcanî yên derbarê hogirî (ons) û mezinatî (heybet) diparêze.

Di ferhenga dê xwedê de hogiriya xidûgirtin tê wateya "*hogirî û girêdayî mayîna bi tiştekê ve ye, yan jî xwegirtine*"[166]. Lê di zarawayê hogirî de, xidûgirtin (ons, ens) bi

---

[165]-Mîr Seyîd Şerîf Corcanî, *Terîfan Ferhing Estelahat Merêf îslamî*, entşarat Feruzan, Tehran, 1377, r. 192.

[166]-Elî Ekber, *Loxet Namey Dêhxeda*, Çap Duvum, Celd Heştum, Entşarat Danşgah Tehran, 1346, r. 398.

wateya olî û irfaniya wê li gor bîr û baweriya zilamên mezin rêya sofîzm û irfane, hogiriya xidûgirtin (ons, ens) pêktê ji "*mirov an jî rêvîngên sofîgeriyê (ulfet) bûne û hogirî girtin dostayetî û aşînabûna bi tiştekê ve nasîn û ew tişte di dil de qahîmkirin û dil û derûnî vekirine, bo vergirtina wan kar û kiryarên ku xwedê û pêxember û yarenên wî pê keyfxweş û bi dilê wan kirine*"[167]. Ji ber ku hev rêgezbûn di navbera xwedê û mirov de tuneye, baweriya wan bi hogiriya navbera xwedê û mirov de tuneye, bi taybet heskirin di navbera xwedê û mirov de red dikin, di bersiva vê nêrînê de amaje bi vê ramanê re tê kirin ku dilê mirov madî û menewî û ruhaniye, ku li gel xwedê de di peyvendiyê de ne, ne ku di aliyê rêgezî de, her wekî ku Hafizê Şîrazî dibêje:

*Nefhetê fiyê men ruhî şînîdem şud yeqîn*

*Ber men în menî kê mazanê vêy ve zanê mast*[168]

Wate

*(Nefhet fiyê men ruhî) min bihîst, min jê bawer kir*

*bo min tê wê wateyê ku ew ê me ye, em jî yê wî ne*

Hocurî di vê derbarê de kîjan mijar di jor de ye û kîjan di payeyekî bilindtir de ye dibêje, li du aliyan ve behs li ser hatiye kirin, grubek baweriya wan wisa ye ku, ew aliyê ku ber bi nemanê ve ango ber bi helyanê ve (fenafîllah) û mezinbûnê (heybet) ve diçin li pêşin, lê li gor baweriya komekê jî baweriya wan wisaye ku zaraweyên ber bi arasteya nemirî (beqa) û hogirî (ens, ons) ve diçin li pêşvetirin, di navberê dejî Hocurî bixwe bêdengî helbijartiye û tu tiştek negotiye.

Derbarê hogirî, Xidûgirtin (ons, ens) de Eraqî dibêje:

*An munêsê xemetsarê can ku?*

*ve an şahêdê can  ens û can ku?*

---

[167] -Omer Ezîz Mehwî, *Meştî le Bîjeyî Arifî û Kirdeyî  îrfanî y Mewlana Mehwî*, Bergî Sêyem, Çapî Yekem, Çapxaneyî Ezmer Silêmanî, 2012, r. 452.

[168] -Mohesin Bîna,  *Munazil Elsaerîn*,  Xwace Ebdulla Ensarî, Çap Duwem,   Nşir Muelef, 1354, r. 125-132.

*An canê cehan kocast axer*

*ve an arêzuyê hemê cehan ku?*[169]

wate

*Ka? Hogirê keser revînê min*

*Ka? Şayetî giyana hogir û evîna min*

*Ew canê cîhanê li kûderê axir?*

*Ka hêviyên cîhanê yên jîna min?*

Zarawayên (şahid, ens, arazû, evîn) hemû ew zarawane irfanî ne, Eraqî heta astekê hogirê yara xwe bûye, ku bi temamî agahiya wî bixwe nemaye û berdewam li dû gerîn û pirsyaran de bûye, bi hêviye ku ew yara xwe ya (Meşûq) bibîne, ku dibe hêvinê rewandina xem û nexweşiyên, ew yara wî dibe hogirî û dildarê wê, ew yara ku bidestxistina hêvî û daxwazên wî yên di cîhanê de ye.

Eraqî dibêje:

*Êy bê tu zêndê cêsm û can, munêsê can kîstî?*

*şîftêyê to ens û canê ens revanê kîstî?*[170]

wate

*Ey bi tu ve zindiye giyan û beden, hogiriya jiyan kêyî tu?*

*Hemû mirovahî û cîhan dînê te ye, sedemê jiyana kêyî tu?*

Zarawayên (cisim, can, munês, şîfte, ens) ew hemû jî mijarên irfanî ne, her yek ji wan bi armancekî taybet ve tê vegotin, di vê derê de jî Eraqî hin taybetmendî di ber zarawanyan de vegotiye, heta astekî ku bi asanî bal dikşîne ser wan taybetmendiyên

---

[169] -Ferxedînî Ibrahî Eraqî, Risale Lemeat u Riseley Estelehay, r. 231.
[170] -Serçaweyî Pêşû, r. 247.

Eraqî, ji wane Eraqî wan hogirî û xidûgirtina xwe ya bi meşûq ve baldikşîne ser û dibêje gelo kiye? Em hemû bûn û ruh û giyana me hogiriya te ye û bêy te bo demjimêrekê jî em na jîn!, ey tu bixwe hogirê kî yi û xwe bi jiyana çi kesekî ve girtiye, ew jî tê wateya ku Eraqî xerîb nizane ku gelo yara wî (meşuq) hogirê wî bûye yan na. di demekî ku temamê cîhan û mirovahî dînê wê bûn, ji aliyeke din ve jî Eraqî xwastiye wî tiştî ji yara xwe verbigre, ku gelo? Yara wî (meşuq) bi çi jiyanekê re dibe hogir, ku Eraqî jî jiyana xwe li gor wê bigoherê, ku dilê yara xwe rakêşîne û li gel wê hogiriyê bike, ev demekê de ye ku pêwîste dildar (evîndar) ber bi aliyê meşuq ve gav bavêje, di rewşa rakêşerî de be. Lê ji aliyê din ve Eraqî berevajî vê yekê pêngav davêje, di bin ronahiya vê nêrîn de beyta ku Eraqî honandiye, Mehwî jî nêzîk wê nêrînê dibêje, divê dildar (evîndar) di xizmeta yara xwe de (meşuq) be, wê demê yar (meşuq) dibe nûr û jiyan. Wek di vê beytê de Mehwî dibêje:

*Ke weqtê al û yaranî li xidmetiya debin wek ruh*

*Heyate nûrî çawe ensî cane mehsî îhsane*[171]

Zarawayên weqt, yaran, ruh, heyat, nûra çav, ens, can, îhsan hemû jî çemk û zarawayên irfanî ne. lê di vê beytê de (ons) wek hal hatiye bikaranîn, ji ber hogirî (ons) pêktê ji wê xweşiya ku nêzîk xwedê peyda dibe û dervey xwedê hogirî di ti tiştek din de nabe, xidûgir berdewam hêza bi tenêbûn û aramî de dibe û dil pê vedibe, Mehwî jî di vê beytê de pesnên pêxember dide û dike hogirê giyan û dil, ji ber kesê ku ji pêxember hesbike, wekî ku xwedê hesbike ye, herwekî ku çawa Eraqî amaje bi aramiya dil kiriye, di dema hogirî wî de ye (yar), bi heman awayî li gel Mehwî jî dema ku al û yaranên wî di xizmeta yar de dibin, wê demê yar dibe jiyan û nûra çav û hogirî û başî bo wan di nivîsa ji aliyê Eraqî de hatiye honandin, dildar (evîndar) li dû wê yekê de ye ku bizane gelo yar li kûderê ye? Û bi giyan û jiyan çi keseke bibe hogir, yan jî dê bibe hêvinê hogiriyê bo giyan û ruhê çi kesekê, lê ji aliyê Mehuyî ve ew babete hatiye zanîn, Mehwî li dû çûye (keşif) û aşkera kiriye ku dema ku evîndar û heval di xizmeta yar (meşuq) de dibin. Wê demê yar (meşuq) jî cîh, hogirî û hogiriya jiyan dostiya xwe aşkera dike,

---

[171] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehuyî*, r. 512.

Mehwî pir bi ronî û aşkera amaje bi cîh û şopa yar (meşuq) dike, reng ji vê zêdetir jî li gel Mehuyî dikare bê dîtin, ku di wateya xwenîşandan (tecelî) yar (meşuq) di ruhê Mehwî de derdikeve, ji bo vê heta wê astê ku hogirî (ons) yar bixwe bûye, bi hemû awayekê girêdayî yar bûye, nikare dest li yara xwe berde, heta di dema li ser bê kuştin jî.

Mehwî dibêje:

*Bo seydî Mehuyî ew muze îmayeka bese*

*Sehray ulfete kelenêçîrî rem heram*[172]

Mehwî gelek zaraweyên irfanî wek êyd (meqamên cezbe û dûrketinê) muze (îlhamê xeybî), îma (amajeye ji bo danûstandineke birîndar kirinê, herkesekî ku amajeyekê bo bike wek wek paşverûyekê ye, sehra, ulfet, nêçîr bikar anîne. Mehuyî behsa wan dem û wextê kuştina xwe ya bi destê yar (meşuq) dike, bi derketin û xwenîşandana (tecelî) yar, yan jî derketina muze (îlhama xeybî-gayîb) bese bo ku Mehuyî êdî haya wî ji wî nemîne û giyana xwe bispêre, bi wateyek din di dema derketina îlhamekî xeybî Mehuyî hebûna xwe wek mirovek ji dest dide, ber bi maqamekî din pêngav davêje û berê xwe dide sehra, hogirî û girêdana wî ya pêkvebûnê destpê dike.

### 3.4 Amaje (Nîşane)

Amaje çemkekî irfaniye, hin caran bi awayekî veşartî arif bikartînin, bi armanca xwe parastina ji zimanê nexêrxwazan "*îşareta zimanê bingehîn û xwezayî ya sofiyane ku, rastî sofî bi awayekî veşartî xwe pê bi lêv dikin û ji tirsa zimanê namehrem û kêm bîniyan û nezanan*"[173]. Herwaha di pirtûka (Keşif El Muhacir) de amaje hatiye kirin û dibêje: "*Agahdarkirina kesên din ji armancê, bê ziman gotina peyvaye*"[174]. Li tenişte zaraweyê amaje (nîşan-îşaret) de zarawayê îma jî tê bikaranîn, wek bibêjî îma coreyeke li îşaret, lê di zarawayê irfanî de kiryareke nayê pejirandine û heta asta kafirbûnê jî tê birin.

---

[172] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*dîwanî Mehuyî*, r. 289
[173] -Îbrahîm Ehmed Şwan, *Ferhengî Sofyaneyî Dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 41.
[174]-Mîr Seyîd Şerîf Corcanî, *Terîfan Ferhengê Estilahat Merêfê îslamî*, r. 561.

Di pirtûka (El ilim) de tê gotin "*îşaret tişteke veşartiye û bi vebêje û destavêje nayê aşkera kirin, ev jî tê wateya ku ji ber hûrî û nazikiyê nikare bi vebêje û destavêjeyê bê aşkera kirin, Cuneyd gotiye: Gotinên pêxemberan xeberin ji amadebûnê û gotinên rastgo yên pêxemberan amajene ji dil dîtina wan (Meşahede).*"[175]

Eraqî dibêje:

*Cumleyekî budê, nebudî ez dwêy xeber*

*Ne erş ne prî, ne eşart, ne tercuman*[176]

Wate

*Hemûy yekê bû, nebû li dîwane heval*

*Ne erş û ne erd, ne amaje û wergêr*

Eraqî zarawayê îşaretê bikaraniye, ku zarawayekî irfaniye û heta astekê jî bi temamî bi armanca xwe ya irfanî ya veşartî bikaraniye, ku bi baweriya Eraqî her tiştek û tiştên ku hatine xulqandin dawiyê de bune yek, ji ber cudayî û bûna du beş û tu dualîbûn û rawekirinek, an jî pêşneyar û nûçeyek li ser tuneye, herwaha amaje jî kiriye ku bi taybet di navbera erş û erd û tiştên din de jî dualîbûnek di navbera wan de tuneye, ew jî tê wateya ku ez û tu nîne û hemû yekin û ti rawekirinek û nêrîn, ramanek nayê helgirtin, ango di wateyek din de ji ber ku Eraqî dibêje her tişt yeke û nabin du, wê demê hest bi ti cudayiyekê nake di navbera xwe û xwedê de, ji ber ku ruhê xwedê di navbera ruhê Iraqî de xwenîşandaye (tecelî), ji bo vê jî dibêje ti nûçeyek di derbarê dualîbûna me di nav vê behsê de nebûye, ev babeteke û ti xwandinekî din helnagre, her di vê derê de Mehwî behsa yar (meşuq) û cîh girtina yar (meşuq) dike û dibêje:

*Le arif amiyek pirsî hewalî meslex û qesab*

*Be enguştî şehadey kird îşarey mehkeme û nayîb*[177].

---

[175]-Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Ferhengî Sofyaneyî Dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 41-42.
[176] -Ferxedînî Ibrahî Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 461.

Zarawayên arif, qesab, şehade, îşare, irfanî ne û Mehwî jî bi wateyekî irfanî de bikaraniye, lê bi awayekî tê xwestin, ku di wateya Mehwî hatiye pirsgirêkekî di navbera civakê de giwaştiye bo babetekî irfanî, ji bo ku çawa yar (meşuq) çawa dildar (evîndar) tên kuştin û tên bê heş kirin û bi awayekî ne dad perwerî, her bi awayekî karê dadgeh û cîhgirê wî û armanca Mehuyî ew e ku yar pir bi awayekî zalimane danûstandinê li gel Mehwî dike, di vê beytê de tenê zaraweyê îşaret bikaraniye ji beyta helbesta Eraqî, lê bi awayekî pir bi zanayî, di beyta li pişt wê de, ev nêrîne jî jê vergirtiye ku Eraqî gotiye; hemû yeke ango cudayiya min û te nîne û em nabin du,

Mehwî jî dibêje:

*Le heq bêjî buwe behrî (Ene El heq) her qesîdêkim*

*Le batî caîze, û wacib gerrra qetlim bikin wacîb*[178]

Zarawayên heq, ene el heq, caîz, wacib, qetil, hemû jî vegote û zarawayên irfanî ne, Mehwî di vê derê de zarawayê ez heqim (ene el heq) a Hellacê Mensur bikaraniye, ew peyve jî ji ber kuştina Mensurê kurê Helac, ji ber bi heman awayî Mehwî jî xwestiye wek Mensur bibêje ez heqim, ev jî heman nêrîna Fexredînê Eraqî ye ku dibêje, hemû her yekin û du nînin, wateya helbesta wî jî wisa ye, ku çawa Mensurê kurê Helac gotiye ez xwedê me (ene el heq) û hate kuştin, ew jî dibêje heman nêrîna min jî wisaye, ji bo vê jî kuştina min wacib bûye û kerem bikin min bi kujin, bila kuştina min jî bibe xelatek (caîze) ji bo min, di rastiyê de pêwîstbû ez hatibam xelat kirin ji ber min rastiya xwe anî ziman. Di dawiya xezela xweda jî zêdetir nêzîk dibe li nêrîna Iraqî, ji ber Mehwî dibêje:

*Dile erşî xuda (Mehuyî)xecalet be le ber xeflet*

*Ke bote butkedey bê be rehmen ya deyrê bê rehîb*[179]

Zarawayên erş, xeflet, budkede (derketina xwedayê yekbûyî), berehmen, deyr (cîhê perwerdekirin û goşegirî û zahîd û reben û belengazan)rehîb, hemû jî çemk û

---

[177] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela kerîm,*Dîwanî Mehuyî* , r. 85.
[178] -Çavkanîya Berî, r85.
[179] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehuy* , r. 86.

zarawayên irfanî ne, Mehwî berê xwe dide xwe û bi awayekî monologan li gel xwe dike û gazindan li xwe dike û xwe ji xwe aciz dike, ji ber ku li gel dil erşê xwedê ye, lê dîsa jî Mehwî lê bê agahe, heta astekî ku wek butkedeyekê lê hatiye, ku rehbendî têde nebe, wek deyrêkî lê hatiye, ku rahîb têde nebe, bi giştî her sê beytan de jî Mehwî di beyta yekem de amaje (îşaret) û di beyta duyem de jî ene el heq û di beyta sêyem de jî erş vergirtiye, ku wateya her sê beytan jî nêzîke li nêrîna beytên Iraqî ve, wê demê Mehuyî xwestiye amaje bi vê bike ku çawa dilê mirov erşê xwedê ye, dilê Mehwî jî erşê xwedê ye û kêm maye ku bibin yek, her wekî ku Mensur di heq gotinê de ez bûm ene el heq û kuştina min wacibe, ji bo vê jî di bin perde ve ango awayeke veşartî armanca xwe aşkera dike.

### 3.5 Berfirehkirin (Best )

Bisg di aliyê wateya peyv de tê wateya "*Berfirehî û vekirin û rawekirin û belavkirinê ye*"[180].Bisg ji aliyê rewşa sofiyane ve pêktê ji guhdariya sozekî xweş wek sozdayîna biheştê û piştî rewşa tîka (rîca) derdikeve pêş, bi wateyekî din de bisg "*Li gel rêwîngên terîqetê pêktê ji rêkirina amadekarên ewdan li qonaxên zanist û girêdana dil di rewşa keşifkirinê de. Herwaha halekî bê zêdekirin di xwe de digre ku nehatina bi hewldan û neçûna pêş û xwe ne westandin e, bisg di rojên arifan de wek tîkaye ji rojên mûrîdan*"[181] Di mijara sofiyane de bisg hatina nav aliyên veşartî yên bo nav dilê rêwîng e, rêwîng jî di vê rewşê de xwe bi berfirehî û bi awayê berbûyî dibîne.

Eraqî dibêje:

*Teht ez lotf bênevaz, teht ez qehreman bê têda zed*

*Têhî ez bestê xoş başî, tehî ez fîz pejmanî*[182]

Wate

*Heye carek ke rûy xoşe, heye carê be qelsî dêt*

[180] -Elî Ekber, *Loxet Nameyî Dêhexda*, Celd Yazdem, r 57.
[181]-Îbrahîm Ehmed Şiwan, *ferhengî sofyaneyî dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 58.
[182] -Ferxedînî Ibrahî Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 379.

*Demekî to le bisg xoş, demê nav fîz û sîsawî*

Zarawayên lotif, qehir, bisg, fîz hemû çemk û zarawayên irfanî ne, Eraqî behsa li rewşa derd gotina sofiyan dike, ku hin caran rûyê wan xweşe û hin caran jî rûyê wan girê û tûje û acizin û hin caran jî pir keyfxweşin û lê hin caran jî di navbera peşmûrdeyî û belavî û sîsawî de ne.

Mehwî dibêje:

*Le bo erbabî dunya med best û beyanî eşq*

*Ke Mehuyî şerhî nuktey canefza bo mirduwe çay*[183]

Zarawayên dunya ango cîhan, best, eşq ango evîn, canefza, hemû zarawayên irfanî ne, herçend ev zarawane wateya wan bixwe heye di zimanê asan ê rojane, lê wek zarawayê irfanî de wate û armancê xwe heye û pir cuda ye, ji wateya serekî û hatî aşkera kirin, di vê beytê de Mehuyî zarawayê girtî ve hatiye, lê wek zarawayekî irfanî û rewşa irfanî bikaraniye, bi wateyeke din, ev zaraweye bi wateya lêkdanê ve hatiye bikaranîn, ne wek bi wateya berfirehkirinê ve(bisg), di temamê dîwana Mehwî de tenê yek car zarawayê berfirehkirinê (bisg) hatiye bikaranîn û wê carê jî bi wateya irfanî de hatiye bikaranîn, ji ber di wateya lêkdanê de hatiye bikaranîn. Wateya helbestê jî ew e ku Mehwî dixwaze behsa evînê bike û lêkdanê bo wê bike, lê wê lêkdanê bo çi kesekê wê bike, ji ber her kesek ne hêjayî wê ye ku li ser behsa evînê bê kirin, bi wateyeke din Mehwî pirs li xwe dike û dibêje, ew ehlê vê cîhanê bi coreyekê piştrastin ku li gel miriyan pêwîst nake behsa ti tiştekî bikî, bi taybet jî babeteke giring ê wek evînê, êdî çi pêwîst dike behsa evînê bo wan bikî, behsa wê evîna xwedayî ya rasteqîn qet pêwîst nake lêkdanê bo wan bikî, ji ber ku ew tênagehin û têgeheştina wan bo rewşa evîna heqîqetê tuneye. Di vê derê de jî cudayiya Eraqî û Mehwî derdikeve ku Eraqî ronahî kiriye civak çend beşin û di civakê de cor cor mirov hene, hin kes rû xweşin û hin kes bê dengin, hin kes hene behsa vebûn, geşbûn û sîsawiyê dikin, bi heman awayî Mehwî cîhanê dike du beş, ewên ku ehlê dil in û arifên rasteqînin di babetên evîn û heskirinê de

---

[183] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehuyî*, r. 230.

jêhatî ne û ewên ku ehlê cîhanê ne wek miriyanin û pêwîst nake behsa evînê bo wan bê kirin.

### 3.6 Neman Helandin (Fena)

Neman, heliyan (fena) yek ji maqamên sofîzm û irfanî ye, dema ku rêwîng digehe vê maqamê dikeva rewşa helandina ruhî û bedenî, ku êdî bi tu awayekê peyvendiya wî li gel cîhana hest de namîne û temamê kiryar û danûstandinên wî yên xirab digoherin, di cîha wan de kiryar û danûstandinên xwedayî tê de ava dibin, ew kiryarane jî "*hemû tiştên wî yên xirap li dil û derûnî û hestên wî de yên heyî davêje derve û di tûrikê wî de çi heye davêje, ev jî dibe rêyek bo fenafîllahbûn û têkçûna bedenê wî ademê ji tiştên xirab û çepel dûrdikeve ye*"[184]. Ji vê derê ve jî gohertin li ruh û bedenê mirov de serî radike, ji ber neman, heliyan (fena) pêktê ji "*gohertina rewşa xirab a ber bi rewşekî baş ve ye û heliyane di xwedê de*"[185].

Di ferhenga terîfet (Fenabûn bi wateya têkçûna sifat û vesfên xirab a rêwîng (salik) tê, neman, helandin (fena) du core ne, ya yekem ew e ku dihate gotin fêrkirin, rahêna (Riyazet), a duyem jî hest bi cîhana milyaketan nekirine "*Cîhana xeyb, yan jî ew cîhana melayîket te de jiyan dikin) ew coreya nemanê ye ku wek noqbûnê ye, ji meziniya xwedê de û wek dîtina xwedê dikare bê pênase kirin*"[186] wê demê helandin (fena) ewe ku ademê zad, dervey zatî- xwedê ti tişteke din nabîne û hest bi ti tişteke din nake, heta digehe wê astê ku ti tiştek di bîr û xeyalên wî de namîne.

Izedîn Kaşanî derbarê neman, helandin (fena) de dibêje: "*Neman, helandin (fena) du awayên wê hene, neman (fena) a Ruwaletî (fena vahrî) û nemana derûnî (fena bagin) nemana rewaletî namana kiryarane, xwedê rêwîng re(salik) bi xwe nîşandana (tecelî) kiryarên xwe yên xwedayî ve(Efael El hî) desthilata hatiyan (Axtiyar warîdat) a ti kiryarekê nezanî ye û niyeta hemû desthilatan xwesteka xwedê ye, neman (fena) derûnî (fena bagin) neman û hêza sifetên kesan û rêwîng bixwe (salik) di dîtina bandorên mezin ên zatî berdewam bû, noqbûna wî bixwe bixwe ye û zalbûna xwedê bixwe ye, derûn ji*

[184] -Omer Ezîz Mehuyî, *Meştêle Bîjeyî Arêfî û Kêrdeyî Îrfanî Mewlana Mehwî*, r. 355.
[185]-Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Ferhengî Sofyaney Dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 259.
[186] -Mîr Seyîd Şerîf Corcanî, *Terîfan firhing Istêlahatê merêf Îslamî*, r. 126.

*qirêj û nepaqijiyan ve têkdibe, nemana qirêjê di beşa xwedê dilê û yaranên rewş û hale da, nemana derûnê jî taybet menda serbestiyane, rêwîng (salik) ji rewşa kotîbûnê rizgar bibe û di bin perdeya sexte de hatibe derve ye*"[187] Ev mijr berdewam li gel zarawayê hebûnê (beqa) de derdikeve pêş, her wekî mijarên (Qebz û besg) (Sehf û seker) her yek ji wan pêwîstiya xwe bi yên din heye.

Hucurî dibêje: *(Destpêkê de man (beqa) û neman (fena) ketina sifatên bêkêre û rabûna sifatên kêrhatiye, herwaha dibêje, bizane neman (fena) û man (beqa) li ser zimanê zanist de wateyekî wê yê din heye û lê ser zimanê kesê bi hal û di wê rewşê de wateya wê cudaye*"[188]

Eraqî di beytekê de li pirtûka aşqname de vesf û pênaseya wan kesan dike ku digehine payeya man û nemana xwedayî dike de dibêje:

*Aftabî, ke erşê zereyê ust*

*Mugelêş ber semayê îşan est*

*Bê ezel, zunê qebil yaftê end*

*Ebed ender beqayê îşan est*

*Hemê der êşqê xud fena telebend*

*Kê beqa der fenayê îşan* [189]

Wate

*Xoretawêkî erş xallîyetî*

*Şwên hellhatinî semay ewyane*

*Le ezelewe , katêk meqbul bûn*

---

[187] -Kemaledî Ebdelrezaq Kaşanî,*Estelehat Sofiye*, Celd Siwem, TercumeyMuhamad Xwacuy, Neşr Mulî, Tehran, 1372, r. 228-229.

[188] -Ebu Heseyn Elî ebn Osman Hocuyrî, *Keşif Elemhcur*, r. 361.

[189] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*,  r. 463.

*Ebedîş her beqay ewyane*

*Hemû le îşqda fenay dewêt*

*Xudî beqa her fenay ewyane*

Eraqî gelek zarawayên irfanî bikaraniye û ew zarawane li gel beşekî zêde yên irfanan bi heman awayî hatine bikaranîn, ku Eraqî pênase kiriye, ji wan a Reftab, erş, sema, ezel, eşq, fena, beqa, Eraqî dixwaze balbikşîne ser hebûna rasteqîn a xwedê nayê bidestxistin, heta cîhê avabûnê di dilê xwe de bidest nexim, her di destpêkê de helbijartina vê tîrêjên hebûnê, heta ebedî jî, he wê bimîne û têknaçe, ji bo vê jî divê di destpêkê de fena bibe û piştre jî man (beqa), ji ber vê hemû evîneke rasteqîn fenabûnê dixwaze, dema ku man (beqa)bixwe her neman (fena) ye, ji ber ji bo evîna rasteqîn evîndar divê bihele û nemîne, ev jî tê wateya ku fenafîllah bibe.

Derbarê neman, helandin(fena) de Mehwî dibêje:

*Ta zulmetî wicude terîkî le nûrî îşq*

*Sêber nema, hetawe, ke (Mehuyî nema xuda*[190]

Zarawayên zulmet, wicud, nûr, îşq, sêber, hetaw, neman, hemû ev zarawayane çemk û zarawayên irfanî ne, Mehuyî jî wek arifên fars û ereb, bi heman wateyê de bikar aniye, Mehuyî dixwaze rabigehîne ku heta ku giringî bi jiyana madî bê dayîn, ew her di tarîbûna nebûnê de dibe û dûr dibe li nûra evîna xwedayî, di rewşa dest li cîhanê berdanê de û dest jê kêşana ji tiştên bêkêr û vegera bo tiştên kêrhatî tê wateya ji roj ango tavê dê (Tav ango roj, rasteqîneya xwedê ye) derbikeve, wê demê di vê derê de Mehwî jî heman awayê eraqî vê dibêje, avabûna tîrêjên nûra xwedê li beden û ruha mirov de, di demekê de dibe ku mirov xwe ji hemû tiştan ramale, di cîha tiştên hestî yên cîhanê de, berê xwe bide neman û helandinê û tiştên baş ên cîhan milyaketan, di vê rewşê de jî mirov de nîşaneyên xwedayî tên dîtin, elbet ew karên ku mirov ên kêrhatî ve pêkane.

[190] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehuyî* , r. 37.

### 3.7 Man (El beqa)

Rêwîng (salik) ên vê maqamê, nêrîna wan wisaye ku maqama manê (El beqa) û neman, heliyan (fena) li gel yek bi heman wateyê û ji bo yek armancê tên bikaranîn, ev jî belgeya vê ye ku hin caran, arif di helbestên xwe de bi yek wate û delaletê de bikar tînin, hin kes jî wek du maqamên cuda pênase dikin, ji ber her du maqam jî xwedî sîma û taybetmendiyên xwe cuda ne, lê di astekî kûr a irfanî de heman wateyê jî di xwe de digrin. Ji ber ku dema maqamê neman, tinebûnê (fena) destpê kir, di vê rewşê de maqamê man ê (El beqa) hebûna xwe heye, man (El beqa) li hember nemanê tê û bi wateye "*man (El beqa) li cîhanê de ye, dijî nemanê ye (fena)* "[191]. Man (El beqa) wek maqamekê pêktê ji "*Destpêka gav avêtina berbi xwedê ye, piştî dawî hatina nemanê (fena) sifet û bandorên xwedayî verdigre*"[192].

Man (beqa) li gel rêwîngên rêya irfanî pêktê ji destpêka tevgera koça gel xwedê (Ser fî Alleh), ji ber ku tevgera koçê ya ber bi xwedê (Sîr Elî Ellah) dema bi dawî tê rêwîng (salik) sara (sehra) hebûn (wicûd) bi pêngavên rasteqîn û bi yek car qutkirinê ve, tevgera koçê ya ber bi xwedê de (Sîr fî alleh) dema bidest dixe, girêya dawiyê ya nemana benê wî (fena- mutleq) hebûneke (wicûd) zatî ji ya paqij, ji nepaqijiyê pêkhatiye (hedep) pêşkeş dike, ku sûd vergirtina li wê hebûna (wicûd) paqij ve li cîhaneke hatî pêşkeş kirin a ji vesfê xwedayî ve, hin kiryar û danûstandin derdixin ku ber bi kiryarên xwedayî ve pêş de diçin. bi wê wateya ku "*danûstandin û kiryar dibe danûstandin û kiryarên xwedayî*"[193]. Wateya wê ew e ku payeyên ku ji sifeta xwedê tên destxistin û dikare ji mirov de jî hebe.

Bi dîtina Iraqî ve her ewdek sifeta mirovbûnê di xwe de paqij bike wê bigehe payeya man ê(beqa) nêrîneke xwe di derbarê zanistê de aşkera kiriye û man (beqa) û neman, helandin (fena) ku dibêje zanistê manê (ilmê fena) ew e ku bizanî li cîhaneke din de dimînî û zanistê nemanê, helandinê (İlim fena) ew e ku bizanî cîhan namîne û wê bi dawî bê. Eraqî dibêje:

---

[191] -Elî Ekber, *Loxet Nameyî Dêhexda*, Cild Yazdim, r. 198.
[192] -Îbrahîm Ehmed Şiwan , *Şêirî Aynî û Sofîgerî le Şêire Kurdîyekanî Mehwî da*, r. 355.
[193] -Şêx Emîn Şêx Ela Eldîn Neqişbendî, *Tesewf Çîye*?, r. 257.

*Enderînê rahê her kê û yekta şeved*

*Gencê meinî der dêleş pêyda şeved*

*Coz cemalê xod nebîned der cehan*

*Enderînê rahê her kê û bîna şeved*

*Qetrê kezê derya bîrun ayed hemi*

*çun suyê derya şeved derya şeved*

*Ger sêfatê xod koned yekbarê mehv*

*der meqamatê beqa yekta şeved*[194]

Wate

*Lew rêgeyeda ger kesê taqane bê*

*Gencî wata lew diley peyda debê*

*Bê cige le rûy to hergîz nebînê ew dile*

*Lew rêgeyey wa her kesê bîna ebê*

*Ew dilopey hate der le naw derya*

*Katekî çuwe naw deryawe debêt be derya*

*Eger sîfatî xoy sirîyewe sereta le pirêk da*

*Lew meqamey manewe ew taqane debêt*

Di wan çend beytan de Eraqî gelek çemk û zarawayên irfanî bikar aniye, ji wan jî yekta cemal, qitre, derya, êfat, mehu, beqa, armanca Eraqî di vê beytê de armanceke irfaniye û hemû delîlên nav honandinê de tekeziyê li ser bîr û ramana giştî ya Iraqî dikin

[194] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 109.

ku bîr û ramaneke irfanî ye. Baweriya Eraqî ew e ku dema mirov an jî takekes di rêya xwedê de be û tenê xwedê bibe perestgeha wî, ew jî dibe takekes û ciwanî di dilê wî de serî radike, wateyê vê jî nemirî di dil û ruhê wî de peyda dibe, her wekî ku çawa xwedê namre û dimîne, ew jî namire û bi nemirî dimîne, her ji ber vê yekê dibêje dervey rûyê te ti tiştek din nabîne ey xwedê, ji ber her bi vê rêyê ve daye mirov û digehîte payeya manê (beqa), ew dilopa avê (dilopek ji cîhanîbûnê) dema ku li derya (cîhanîbûn) derdikeve, dîsa dema vedigere bo deryayê (Cîhanîbûn) dibe derya (cîhanîbûn), ji ber her di destpêkê de arif sifetê xwe paqijkiriye û payeya manê (beqa) vergirtiye û bûye nemir û dimîne, her ji ber vê jî ew nêrîn raste eger bê gotin ku sifetên xwedê di min de aşkera bûye, ev jî li gel piraniya arifan gotineke ba ye, yan jî Eraqî di beyteke din de dibêje:

*Temena mîkoned mîskînê Eraqî*

*Kê derya bed beqa bed ez fenayî*[195]

Wate

*Tika dekat hejarêkî wek Iraqî*

*Bibînêtewe duway manewey paş nemanî*

Eraqî derbas dibe ji afrînerê xwe û dibêje hêjarekî wek Eraqî temeniya wê dike, li piştî nemanê, helandinê (fena) û helyana wî ya di xwedê de , man a (beqa) xwe bibîne, ew jî tê wateya Eraqî baweriya wî ew e ku maqamê man û nemanê (beqa û fena) du maqamên cuda ne û maqamê fena li pêş maqamê neman, helandinê (fena) hatiye danîn, di beşeke piraniya helbestên irfanî de maqama manê (beqa) li dû maqamê nemanê (fena) tê, beşeke diyar a helbestvanan hewara xwe bo fena ango bo neman û helandinê (fena) dibin, her ji ber vê jî Eraqî jî heliyaye (fena bûye), li dû jiyaneke din digere, ew jiyan jî maqama manê (beqa) ye, di bin raman û bandora vê helbesta

Eraqî de Mehwî jî dibêje:

*Belke lew rêyewe min pey beme îmranî beqa*

---

[195] - Ferxedînî Ibrahî Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 293.

*(Mehuyî) xeyrî xerabatî fena nîm me laj*[196]

Zarawayên li dûketinê (keşif), beqa, xirabe (xirabûna sifetên mirov û tekçûna hebûna bedenî), fena, melaj (penagah), Mehwî têgeheştiye ku arif di destpêkê de, pêwîste bighije, maqamê neman, helandinê (fena) û jê rizgar bibe û piştre bigehe maqamê manê (El beqa) di vê beyta hatî honandin de Mehwî fenabûnê wek xirabe (xirab bûna sifetên mirov û têkçûna hebûna bedenî ) pênase kiriye, di vê maqamê de rêwîng heşê wî di serê wî de namîne û nikare sûd ji mirov re bigehîne, lê di maqama manê (beqa) de arif heşê wî tê serê wî û sûd ji xwe re û ji derdorê xwe re digehîne, her ji ber vê jî Mehwî dibêje ji bo maqamê manê (beqa)û nemiriyê re bigehim, ti çareyeke min ê din tuneye, dervey di xerabeyên helandinê û fenabûna bedenî, Mehwî her wekî Iraqî baweriya wî ew e ku arif heta ber bi maqamê fenabûnê ve neçe û xwe ne helîne ji her tiştê madî xwe paqij neke, li hemû xirabiyên cîhanê ne helîne, nikare bigehe maqamê man û nemiriyê, wê demê li gel arif û Iraqî û Mehwî mercê geheştina maqama manê (beqa) pêwîst destpêkê rêwîng bi maqama helandinê (fena) de biçe. Ji vê derê nêzîkbûna di navbera Iraqî û Mehuyî de derdikeve û heman helwêstê irfanî yên her duyan ronî dibe.

### 3.8 Yek Xwdê Perestî ( Tewhîd )

Xwedê perestî zaraveyeke irfan û Sozîmê ye. Eger em bixwazin bi kurtî behsa Yekta Perestiyê (Xwedaperestiyê) bikin, wê demê kurtiya hemû mijarên di hebûnê hene ku hebûna wan hêjayî perestinê ye û bi bikera (kirek) wê ya rast Xweda ye pêk tê. Bi wateyek din jî Yektaperestî di çavkaniyên klamên bi zorê eşkerekirina armanca yekbûna Xweda îspat kirî, ew hebûne ye. "*Takperestiya Sofîzmê eve; çav ji bilî yekê nebîne, dil ji bilî yekê nebîne, ji bilî yekê neyê di nava çarçoveya zanistê de. Dema Takeperestiya Sofîzmê bigihe gimikê (lutke, zîrve), ziman lal dibe, merce behsa cihekê bikirin û wê demê ziman digêre*"[197] Lê bi dîtina Îslamiyetê, "*Yektaperestî ji Xwedayek û bi yeknasînê*

---

[196]-Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemey Mela Kerîm, *Dîwanî Mehuyî,* r. 160.

[197] -Ebdulla Ensarî Hîruyî, *Sed Meydan*,Celd Yekem, Teshîh Ebdulhey Hebîbî, Neşir Dinyay Kitab , Tehran, 1386, r. 327.

*pêk tê, ango ew kesê hêjayî perestinê ye û divê sicdeyê jêre bibe. Herwiha ew dikare zindî û ne zindiyan biafirîne*"[198]

Di tekstên Îrfanan de, "*Ji bo eşkerekirin û derxistina rastiyan, wateya takperestî çend pile jêre hatine danîn. Wate mirov dikare bêje, Arîf di pileyê de takperestên rastîne û ya li jora wan jî pileya rast a ferd (kes) ku hêjayî xwedayê mezin be, Xweda tekane dîtine*"[199] Bi dîtina Ebwa El-Qasim Quşîrî, takperestî ji "*Takperestiya hikûmdayîna bi kesî" pêk tê*"[200] Piştre û di heman cihî de, corên yektaperestiyê tên cûdakirin û dike sê beş.

Bi heman awayî, hemû tiştên di vî warî de hatine gotin dibêje û weke Quşîrî takperestiyê dike sê beş. Herwiha heman tiştan dibêje ku yên Quşîrî behsa wan kirî.Piştî derxistina peyvên hinek nivîskarên ku di vî warî de nivîsandine, dîtina xwe tênin ziman.Min Xûdî Elî Kurdî Osmanî El-Cilabî dibêjim, "*Takperestî ji aliyê Xweda ve ji bo evdên wî veşartiye û bi hevokan nayê eşkerekirin*"[201]

Di fikra Fexredînê Eraqî de mercê gihiştina Takperestiyê ew ku kesê dixwaze cûdahiyek di nava hebûnan de nebîne û dilê Arif bi liberçavgirtina yê di cîhana zorî de ye bi toza zoriya tozê nabe. Kesê ezmûna we pileya bilind dîtibe, dibêje; dema dergehê Gole Carî ya takperestî ji bo min hat vekirin, bêhna rihana biheştê ji her giyayekê dikim.

Arifî dibêje:

*Eger çî le zêdî takperestî da deçêjim awî jiyan*

*Mawmewe tînû ziman kêşaw le ser lêwane lêreda*[202]

198-Şêx Emîn Şêx Ela Eldîn Neqişbendî, *Tesewf Çîye*?r. 267.
199 -Fatime Fena, *Tuhîd*, Danêşnamy Cehanî Îslamî, Cild heştem, be Serpereştî Xolam Elî Hedad Adil, Neşir Bîtyad Dayêrî Almarif Êîslamî, Tehran, 1383,r. 431.
200 -Ebdul Kerîm ebn Hewazin Quşeyrî, *Rsaley Quşeyrî*, r. 513.
201 -Ebu Huseyn Elî bin Osman Hucoyrî, *Keşif Elemhcur*, r. 417.
202 -Ferxedînî Ibrahî Eraqî, *risale lemeat u riseley Estelehay*, r. 320.

Eraqî her weke bi xwe balê dikişîne ser gihiştiye pileya mayînê. Ji ber ku ava nemirinê yan jî jiyanê vexwariye. Lê vê bi zor nabîne û timî xwe bi tênitiya rêya takperestiyê dibîne û timî bi wê yeka xwe têniya ziman hişk dibîne.

Arifî dibêje:

*Tenanet tîşkî hetawîş ger bibêt*

*Ziyatir xall niyetî şiwênewarî*

*Leweha hall ciwanî takperestî da*

*Nayniwênê be ewîn darî dîdarî*

*Rasteqîne eweye birwa deken çi niye*

*Bêcge takê le cîhanî giyandarî*

*Aşkira bêt tîşkî takperestî ewa*

*Ra dekat ew cîhane be naçarî*[203]

Li vir gelek beş û zaraveyên îrfanî ji aliyê Eraqî ve hatine bikaranîn. Ji wan jî, tîrêj, roj, xal, takperestî, evîn û rastî... Ev beşane hemû jî di irfanê de wateyên wan ên taybet hene. Ji zimanê asayî cûda ye.Lewra Êraqî dixwaze bi wateya Îrfan bêje. Tevî ku tîrên rojê, ‘Hebûna rastiya madî’ zêdetir xwedî hebûn be, ti giringiya wê nîne. Ji ber ku xal, ‘Cîhana Xeybê’ bi wê hebûna xwe ya madî bibandor nabe, Eraqî bi wateyek din dibêje.Madem ez di cîhana maddî de me, ti giringiyeke tîrêjên cîhana xeybê nîne.Lê dema tîrêja takperestiya rast hat nav, wê demê evîndariya rast jî peyda dibe û tîrêja rast derdikeve. Wê demê xal, ‘Cîhana Xeyb’ xwe nîşan dide û çi tîrêjên ne rast bin, radibin û winda dibin.

Mehwî di vî warî de wiha dibêje:

*Wacib le ser cemîî mûsillmanan û mu’mîne*

[203] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 258.

*Bawer biken be dill, çi xewamî û çi amiyan*

*Zatî xûda ke xalîqî ekwane, her bû*

*Yeenî qedîmî qutleqe (Baljat) û (Balziman)*[204]

Zaraveyên erk, kom, xaliq (çêker), mutleq, zat (kes) û zeman hemû jî zaraveyên irfanîne. Tevayiya fikra Mehwî wê yekê radigihîne ku pêwîste hemû Misilman û bawermend baweriyê bi wê yekê bênin ku Xwedayê bi tenê û bê şirîk, vê yekê jî ne tenê bi ziman bênin ziman. Belkî di nav de jî çi taybetmendî û çi jî giştî baweriya xwe pê bênin. Ji ber ku Xweda yeke, xwediyê hemû cîhan û asîman e. Bi wateyek ku rehaya herî kevin di her dem û cihekê de. Ev jî tê wê wateyê ku Xweda xwediyê zatê xwe ye nekû ji ber sedemek derve, ji ber eger ku ji ber sedemek derve be; ev tê wateyê ku wê pêwîstiya Xwediyê tak bi wê sedema derve hebe.  Ev jî ligel pêdiviyên Xweda dernakeve, tekane kesê xwediyê taybetmendiya timî be, ji ji vir ve nêzî navbera Êraqî û Mehwî de derdikeve. Baweriya herdu helbestvanan bi vî awayiye ku Xweda tenê ye, her hebû û dema tîrêja hebûna Xweda derket, êdî ti tiştek din namîne û ji bo demekê diçe.

Mehwî dibêje:

*Le beynî nûr û zullmet da ameşo ser nagrê "Mehwî"*

*Nîgarim boye pêy wit le min hatin, le to royn*[205]

Li vir heman dîtina arîfane ya Eraqî derdikeve.Ji ber ku Mehwî dibêje, dema bi awayek rastî tîrêja derve û nerasterast de ye. Herwekû Mehwî li dihek din de wiha dibêje:

*Ke biruhim têgebî cez be derçûn dekey, derçû*

*Debê aşiq ke dî bênrawe yarî, bê birwa*[206]

---

204 -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî,* r. 435.
205 -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî,* r. 330.
206 -Çavkanîya Berî, r. 16.

Li vir jî bi heman awayî Mehwî xwe dişibîne evîndarekê û heman awayê Eraqî dibêje, dema evîndar (Ne yê rast) zanî, yan jî hest bi wê yekê kir ku evîndara wê jê bêzar bûye, divê bêyî ti tiştekê biçe.Ango dema tîrêja rast derket, êdî hebûna tîrêja rast namîne û diçe.

Mehwî di derbarê takperestiyê de wiha dibêje:

*(Mehuya) Ba bes bê şîrkî teşebbûp bem û bew*

*Bigre bes damenî tewhîdî (Hu allah Ehmed)*[207]

Zaraveyên şîrk, teşbibbut û tewhîd cor û zaraveyên îrfanîne.Li vir Mehwî ji me re wê yekê vedibêje ku weke amojgarî kesek derdikeve, xwe weke mînakekê datîne û dibêje, bila êdî ji bilî Xweda hewara xwe negihînin ti kesek din.Ango Mehwî li vir bi dîtina yekîtibûnê temaşeyî tişt û karûbarên cîhanê dike. Ji ber ku daxwazê ji xwe dike ku ji bo karûbaran pişta xwe bi ti kesê girê nede. Ji ber ku ev kar dibe hevparê peydakirina ji bo Xwedayê tak û tenê. Li vir jî dîtina Mehwî derdikeve û di wê baweriyê de ye ku Xweda her tiştekе û bêyî wî ti tiştek nayê kirin. Ev dîtin ligel hemû Arif û Sofiyan navdare.Lewra ligel Arifî tê dîtin û Mehwî jî şopandiye.

### 3.9 Bibxşandin û Dest Beredayî (Cud û Sixa)

Bexşandin biwêjeke di ayet, exlaq, felsefe, kelam û îrfan, ango wate û nasandina peyva ku her yek di wê zanistê de cûda ye û nayê heman wateyê.Di ayetan de tê wateya bexşandin.

Di felsefe û kilaman de, di felsefe û kilamên Îslamî de, bexşandin ji dayîn û sûda miar û mijarek baş digihîne pêk tê. Nekû ji bo wergirtina weke deynek, ne ji bo armancek an jî tiştek ku ne hêjayî vê sûdê be. Bexşandin di îrfanê de: Arif ji ber bexşandinê, arif ji ber bexşandinê gelek axaftinên zêde û nasandina pir corî hene. Ji wan

---

207 - Çavkanîya Berî, r. 155.

jî; "*Parvekirina bêminet û bi cih anîna pêdiviyan bêyî dîtina kes, xwediyê pêdivî û bêyî daxwaza dîtina wî bike, li gor daxwazê ye*"[208]

Ji ber bexşandinê, Qûşîrî dibêje: "*Li ser ziman û sunnetê nehatiye, raste û bexşîniye; parvekirin ne çeton be û ligel kesên me, destberdayî (Destrêj) di pileya yekem de ye. Piştre bexşandin (pêşkêşkirin) û piştre jî fedekarî, canê xwe feda kirin. Her kesek tiştekê bide û tiştekê wergire, ew xwediyê pileya destberdayiyê ye. Her kesê zêdetir pêşkêş bike û kêmtir wergire, ew xwediye pileya bexşînê ye. Ew kes jî li beramberî nebûnan li ber xwe bide û kêmiya heyî şansê xwe pê diceribîne, bi şans e*"[209].

Hurcorî nasandina Qûşîrî aniyî û zêdetir zanyarî li ser daye, lê di navbera beşxandin û dest beredayî de cûdahî kiriye û dibêje: "*Hinek kesan cûdahî xistine di navbera bexşîn û dest beredayiyê de. Gotine dest beredayî ewe ku di bexşînê de cûdahiyê nake û kiryarek bêyî armanc be, kiryarek bêyî sedem û ew mijar rewşa du Pêximberan e. Bêyî sedem, ev jî rewşa du Pêximber e: Xelîl û yê din jî Pêximber Hz. Muhemmed (S.A.S) e*"[210].

Eraqî derbarê vê behs û mijarê de wiha ji bo Pêximber dibêje:

*Padîşahê nîştîmanî cûd û wicûd*

*Meqsedî ilîm û alemî meqsud*[211].

Eraqî di vê beytê de zaraveyên weke, 'Padîşah,cud, wicûd, ilim û alema' bikaraniye. Hemû jî zaraveyên îrfan in û armanca îrfan bikaranîne. Êraqî dest bi wesfê wî kiriye û behsa bexşîna Pêximber (S.A.S) a li ser zanist û meerifeya hemû mirovatiyê daniye, dike. Derbarê dest beredayê de.(Sixa).

Eraqî dibêje:

---

208 -Ebdullah Selewatî, *Cewd û Sexa*, Celd yazdehu, Be serperişt, Xulam Hadad Edil, Neşirê Betyad Dayêrê Alm Arêf Slamî, Tehran, 1386,3697.

209-Ebdul Kerîm Êbnê Hewazin Qeşîrî, *Rêsalêyê Qeşîrî*, r 401-502.

210 -Ebu Huseyn Elî Bin Osman Hucoyrî, *Keşif Elemhcur*, r 463.

211 -Ferxedînî Ibrahî Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay* ,r 241.

*Çende kem dêt sexawetî to*

*Rast bêtewe barî bêçareyekîş*[212]

Zaraveya Sexawet û bêçare, zaraveyên Irfanîne û Eraqî dixwaze wê yekê bêje ku tevî rehmeta te kêm be, lê ji ber ku tû kesek dest beredayî û kesek bê çareyî, rewşa te ya xirab wê baş bibe. Bi wateyeke din jî her çendî rehma te kêm be, her zêde ye. Ji ber tu kesek dest vekiriyî û bi ti awayî tiştek kêm pêşkêş nakî, lewra timî feqîr û bê serwet, li bendêne ku tû rewşa wan a xirab baş bikî. Li ser tevahiya vê qonaxê,

Mehwî dibêje:

*Çi xoşe bem hemû îsyanewe yarebî bimbexşî*

*Bibexşe, bigre dozex xollemêş kem bûyek misqal*[213]

Zaraveyê çetûnî (îsyan) bexşîne, dojeh û xweliya hemûyan cor û zaraveyên irfanîne.Li vir Mehwî hest bi îsyan û gunehbariya xwe kiriye.Herwiha baweriya wî bi Xwedayê wî jî tê ku wî bibexşîne.Ji ber ku xweda beşxinde (efûker) e. Ev jî nêzî pileya dest beredayiyê ye.Ji ber ku bi hemû gunehek zêde ve daxwaza bexşandinek zêde dike.Dibêje, wey tû bi wê mezinahiya xwe min ê biçûk efû bike, weke ku dojeh misqalek xwelî kêm bike.Ango Mewlî li vir Xweda weke fedekar bi nav dike. Ji ber Xweda gelek efû dike û li benda ti evdekê xwe ranaweste. Herwekî çawa ku Êraqî pesnê Pêximber dide, bi efûkerê ilm û zanist bi nav dike. Bi heman awayî ligel Mehwî ji ber vê û ji bo van hemû efûkirinan pesnê Xweda, hêz û karîna Xweda dide. Li vir behsa herdu armancên efûkirin û dest beredayiyê dike.

Mehwî gelek bi hûrî temaşeyî mezinahî, bexşindeyî (Efûkirin) û dest beredayiyê dike.Herçendî ku Mehwî bi xwe kesek arif û pileyeke ayînî ya baş hebû, lê her xwe gunehbar dibîne. Bi vî sûçî jî hêvî dike ku Xweda starê lê bike û gunehên wî efû bike. Bi xwe wiha dibêje:

[212] -Çavkanîya Berî,r. 241.
[213] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,dîwanî Mehuyî, r. 276.

*Meger ber mewcî behrî rehmetim xa wesfî settarî*

*We ger nane rehmete pak bûnewem, namumigniye setrim*[214]

Zaravayên weke, “Mewc (pêl), behs (cîhanî bûn) û setir (Xwe girtin, wek xwe girtina ser û çavan) paqij bûn, hemû jî zarav û beşên irfanîne. Weke me behs kirî Mehwî kesek arif û oldarekî navdar bû, tevî vê yekê jî xwe gunehbar di dît û dibêje; ewqas tawan (sûç) û gunehê min zêde ye, eger rehmeta Xweda ya weke derya pêlê dide stra min bike, berevajî bi ti awayî çareseriya min nîne û stara min nayê kirin. Mehwî li vir Xweda weke efûker û di heman demê de jî destvekirî bi nav dike.Ev jî ji ber wê sedemê ye ku Mehwî gunehbar e û bêyî beramber, Xwedayê mezin stara wî dike.Yan jî daxwaza starê ji Xweda dike.Herwiha mirov dikare ji vir li gor dîtina Mehwî, Xweda weke şansekê erbikeve.Ji ber ku Xweda gelek efû dike û ne li bendê ye ku evdê wî ti diyariyekê bideyê.

Li vir Mehwî her weke Eraqî li benda efûkirina Xweda ye.Timî bi hêvî temaşeyî bexşîn û mîhrîbaniya Xwedadike.Bi wateyek din jî bi dîtina Xwedayê efûker û destvekirî.Heman dîtin ligel Eraqî û Mehwî jî hene.

### 3.10 Xweda (Heq)

Zaraveya heq tê wateya, "*Selma û îspatkirinek ku mirov nikare înkar bike. Hebûnek aram e. Rast: Dq*"[215] Derbarê cor û zaraveyê ‘Heq’ de gelek dîtinên cûda hene. Hinek dibêjin, "*Biwêjek felsefî, îrfanî, fiqhî û tê wateya peyva rast û fikrek rast be. Li aliyê Sofiyan jî tê wateya Xweda, Selman, aramî û rawestiyay*î"[216]

Gûsî di pirtûka ‘El-Limee’ di derbarê ‘Heq’ de wiha nivîsandiye; "*Heq her Xweda ye, ji ber ku wiha gotiye, ‘Bi rastî bi Xweda her heman mafê eşkerekirinê ye.’*

---

[214]-Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm, *Dîwanî Mehuyî*, r. 297.

[215] -Elî Ekber, *Loxet Nameyî Dêhexda*, r. 737.

[216] -Seyd Ziyaedîn Secadî, *Miqedemey br Îrfan û Tesawf*, ûap Nuham, Entişarat Semiy, Tehran, 1380, r.742.

*(Nûr/25*)"[217], Hocorçî jî dibêje, ev zarave yek ji wan zaravayaneye ku diçin nava bergê daxwazkirinê de, di eşkerekirin û hûrîtiyên wê de dijwartir dibin. Heq aniye, bi nasandinek kurt û sade girtiye, "*Armanca wan ji heq, Xweda ye. Ji ber ku ev navek ji navê Xweda ye*"[218]

Eraqî dibêje:

*Têpere xafill le bîrî hî kesyan*

*Bîrî heq ke ta bimênê cawîdan*

*Ta le bîrî xot nebey bêcge le heq*

*Rasteqîne niye le bîrit bê ewan*

*Satê bêcge le Xûda le bîrkirnewe eto*

*Bîrkerî, gerçî to bîrnirêwî ziman* [219]

Eraqî zaraveyê rewşê weke corekî irfanî bikaraniye.Di çarçoveya îrfanî de amajeyên di nav de weke amojgariyekê (şîret) aniye ziman.Kesên biyanî di rastiya heq û xwe bi karê kesên din ve mijûl kirine. Agehdar kirine û dibêje; dest ji vî karî berdin, ji bo bi awayek bêmirin û zinî di fikra heq û heqperestiyê de bimîne. Bi wateyeke din û li gor dîtina Êraqî her çendî ku zimanê te li hewarkirin û prestîjê be, ti nirxeke wê niye. Eger ji bo kesên din be û ev kar ji perwerdekar (Heq) be, ji bo mîsoger bike dest ji rastiyan bernede.

Eraqî dibêje:

*Meger berûy heq nebînî çawit lêk bişê*

*Eto nabêt bibînî rûy parast* [220]

---

[217] -Ebu Nesir Sirac Tusî, Eleme fî El Tesewf, r. 367.

[218] -Ebdul Hesen Elî ebn Osman Hucurî, *Keşif Alme Hcur, Ç*ap Duvum, Meqedem û Teshîh, Mehmud Abidî, entişarat Sruş, Tehran, 1386, r. 560.

[219] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 207.

Mercê Eraqî ji bo dîtina rûyê rastiyan ê heq heye. Ew merc jî ji çavgirtina ji hemû rastiyan pêk tê. Ev jî tê wê wateyê ku pêwîste ew rêyên ku di rewşê de çavê wan li hemû kiryarên xirab bigirin, ji tiştên ne rast û vale xwe biparêzin, ew jî dibe sedemê wê yekê ku bigihe rastiyê (heq). Ev li aliyê piraniya rêyên ehlê terîqetê peyda dibin. Lewra Mehwî derbarê rewşa rêbwar (salk), arif û di bin bandora fikra Helac de fikir dike.

Mehwî dibêje:

*Heta heq nasîre, her heqme menfur*

*Weku mensur eger bimken be dara*[221]

Zaraveyên nasir, heq, minfur û darvekirin hemû cor û zaraveyên irfanîne.Mehwî weke arifên din bi heman awayî îrfan bikaraniye. Mehwî her weke Eraqî di wê baweriyê de ye ku her kesê pişta Xweda bigire û di hemû karên xwe de pişta xwe bi Xweda girê bide, wê demê Xweda jî wê alîkariyê bideyê. Lê cûdahiya Mehwî ligel Eraqî ew ku Eraqî weke amojgarî dîtina xwe aniye ziman. Lê Mehwî behsa rewşa xwe dike û dibêje, ez rastiyê dibêjim û pişta xwe bi rastiyê girêdidim. Her çendî ku hinek kes hene vê yekê qebûl nakin, ji bo vê armancê jî Hilac dike mînak. Ew jî ew yek bû Helac ji ber rastîgotinê, heta asta darvekirin û şewitînê çûye. Ne dûre Mehwî jî weke Helac û Bêstbêtî bêje, ez jî rastim û tê wateya min jî Xwedayê nûra xwe di nava xwe de tecelî kiriye.Lewra mînaka Mensûrê kurê Helac têne. Ji xwe eger armanca 'Heq-rastî' Xweda be, wê demê rastî wê derbikeve holê ku Mehwî jî gihiştiye pileya herî bilind a arîfbûne. Ji ber ku Arifbûn xala dawî ya kamilbûnê ye.Mehwî jî bikaranîna navê Helac diyare û bi rast zanîna gotina Helac ku gotî, ez 'Xweda me'. Li vir eger Mehwî jî piştgiriya gotinên Mensûrê kurdê Helac bike, Mehwî jî bi awayek nerasterast dibêje; ez jî Xweda me. Ji xwe eger mebesta Helec gotina rastiyê be, ji bo Mehwî jî heman tişte.

Mehwî dibêje:

*Be heq her heq, be na heqim wituwe le rojî bû*

---

[220] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, Risale Lemeat u Riseley Estelehay, r. 153
[221] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî*, r. 40.

*Weku Mensur eger bîşim kujin nakem le heq ladem dîsanewe*[222]

Mehwî piştgiriya gotinên Helac dike.Lê li vir zêdetir piştgiriya peyva rast axaftinê dike, neku xwe weke Xweda zanîn. Lewra Mehwî, Helac dike mijara kiryara xwe û tekane mêr datîne. Piştî kuştina Helac, êdî ti zilamek li ber çavê Mehwî nayê dîtin. Mehwî di vî warî de wiha dibêje:

*Qatî piyawe le ser em erze debînî Mensur*

*Be serdarewe (Zallinun) e le bin zîndana* [223]

Di vê hevokê de Mehwî bi şan û rûmeta Mensûrê kurê Helac û Jalinun hildide, wan bi mêrên merd, bê hempa û mêrên meydanê dibîne. Ji ber ku bêyî tir ji bo gotina rastî û fikra sofîgerî, helwest wergirtine. Di encama xirab a van helwestan de netirsiyane. Hellac serê xwe ji bo wê danî û Jalinunê Misrî jî ku 265 koçî jiyana xwe ji dest dayî kiriye. Demek dirêj li Bexda ketiye girtîgehê.Bêguman agehdariya Mehwî ji dîtinan hebû. Ji xwe eger Mehwî dîtin û helwesta wan nasnekiribe, helwestên xwe dinirxînin û tenê derbarê rastiyê de bi merdî hatine binavkirin.

Mehwî dibêje:

*Bipirse hallim, îhmalî wefa bes*

*Bitirse to le heq cewr û cefa bes*[224]

Zaraveyên ‘Rewş, wefa, heq (rastî), cewir û cefa’ hemû cor û zaraveyên irfanîne û Mehwî bi wateya îrfaniyan bikaraniye. Li vir Mehwî berê xwe daya stemgeriya bê wefa, xwe davêje ber bextê wê ku rewşa wê bipirse û êdî dest ji paşguhxistinê berde. Ji ber ev karek zalimaneye û Mehwî bi wê yekê amojgariyê dike ku cezayên Xweda bibîrtîne. Ji ber ku dibêje, Xweda bitirse, êdî cewir û cefayê nade min. Qutbûn û dûrketina ji yara rast ji aliyê îrfanan ve tişteke gelek belav e. Piraniya caran yarên wan jî yan kesên olîne, yan şêxe yan jî Xweda ye. Heta endazeyek tevlî nava arif û yara (evîndar) wan dibe.

[222] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî,* r. 302.
[223] -Çavkanîya Berî, r. 63.
[224] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî,* r. 198.

Raste eger bê gotin ku evîndara wan beşeke ji gewdeyê wan, lewra em dibînin gelek caran helbestvanên arîf ligel xwe ketine di nava guftûgoyann de. Ev jî nêzîkbûna navbera arif û yara wan de diyar dike. Piraniya helbestvanên arîf herçendî yara wan nêzî wan bibin, hê jî weke dûr wesif kirine. Vaye Mewlanayê Romî li dûriya Şems Tebrêzî heta astekê dîn bûye.

### 3.11 Aadegî (Hizûr)

Amadeyî di warê biwêja îrfaniyê de "*pîvana apore ligel rastîbûn û meqamê yekgirtûyî bi amadeyî bi nav dibe*"[225] Li cihek din bi heman awayî Secadî di pêşgotina pirtûka xwe ya di warê îfran û sofiyê de dinivîse ku amadeyî, "*amadebûna di nava rastiyê deye.Dema ji mirovên asayî pêwar dibe, li wî cihî dibe heq (Xweda)"*[226] Amadeyî gihiştina dilê Xweda ye.Dîtina wê yekê di tevayî rewş û bidestxistina meqamê amadeyî, ji bilî dostaniya Xweda bi ti rêyek din nayê bidestxistin.Bi wateyek din dema amadeyî bi dil destbikeve û rêwî di meqamê heskirinê de heta digihe radeyek Xweda, di hemû tiştekê de dibîne. Etar di vî warî de wiha dibêje:

*Dir hizûrî ew kisî ninşist tafanî nişd*

*Gir sir muyî ziman baqî bud tawan kinîm*[227]

Wate (Pênase):

*Kes neçû tenişt ewtafena nebû*

*Eger sere mûyek lêm bimênetewe tawan dekem*

Mercê amadeyî (Hizûr) ji hişê xwe çûyîne. Heta ku qasî tehle, mûyek di nava rêwî (rêbwar) û Xweda de mabe; amadeyî ji bo wî dernakeve. Her ji ber vê yekê Egar wiha gotiye û ji vê yekê zêdetir jî wiha dibêje:

[225] - Seyîd Ziya Eldîn Secadî , *Moqedemeyê Îrfan û Tesewf*, r. 268.
[226] -Çavkanîya B, r. 268.
[227] -Ferîdeldîn Etar Nîşapurî, *Tezkirat Elelulyai*, Celd duvum, r. 117.

*Kesek bêhna wî ya naskirî hebe*

*Li nêzî dergehê wî, xwediyê wî heye*[228]

Ango li gor dîtina Egarî kesek naskirî ligel xwehebe, ew nêzî Xweda ye û lewra xwe pêve girê dide û timî li ber dergehê Xweda amade ye.

Lê beşeke zêde ya sofî û arifan amadeyî weke meqamêe (yekgirtû) bi nav dikin. Amadeyî tê wateya amadeyiya dil a ji bo Xweda ya di dema windabûna (xeyb) di dema asayîbûnê de. Bi dîtina În Erebî amadeyî ji "*Amadeyiya dil a ligel Xweda, dema ku mirov dilê xwe ji hemû tiştekê û ji bilî rastiyê qutkirî' pêk tê.Her windabûn amadeye û her amadeyek winda (xiyab) ye*"[229], Em li vir digihin wê dîtinê ku dema dibêjin, filan kes amadeye. Ev wê yekê radigihîne ku ew kes ligel Xwedayê xwe amadeye û timî Xwedayê bibîrtêne.

Hocoyrî derbarê amadeyî de wiha dibêje: "*Armanca amadeyî, amajeya dile ya ji bo rê nîşankirina bawermendan heta hikmê pîvanê windabûn bû. Ji bo vê yekê dibe hikmê berçav, piştre windabûn bi xwe dibe amadeyiya rastî. Amadeyiya rastîn, dibe windabûna ji xwe.Bi awayek her kesê bi pîvan, winda bûye. Di rastiyê de amadeyî heye û berevajî jî şev e*"[230] Piştre Hocubrî dîtina gelek arîfan dike mijara gotinê, ji wan jî Hisên Kurê Mensûr (Helac) û Ebûbekir Şiblî.

Îbin Eta wisa datîne ku windabûn li ser amadeyiyê.Lê gelek kesayetiyên din ên weke; *"Harisî Muhasibî, Cunîd û Sehlî Kurî Ebdûllah jî di wê baweriyê de ne ku amadeyî di ser windabûnê de ye*"[231].

Quşeyrî derbarê amadeyiyê de wiha dibêje: "*Amadeyî, amadebûna li beramberî Xwedaye. Ji ber ku dema ew ji xelkê winda dibe, ligel Xweda amade dibe. Li gor wê wateyê divê amadeyî vê yekê ji ber deshilatdarbûna fikra Xweda li ser wî heta dil û derûn li beramberî Xweda amade dibe. Ango ew ligel Xweda de amade dibe. Ji ber ku ji*

---

[228]î, r 262.
[229]-Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Ferhengî Sofyaney Dîwanî Cizîrî û Mehuyî*, r. 121.
[230] -EbulHesen Elî bin Osman Hucurî, *Keşif Alme Hcur*, r. 368.
[231] -Çavkanîya Berî, r. 368.

*xelkê windabûyiye, merce bi giştî ji xelkê winda bibe û ligel Xweda amadeye. Dema gotin, filan kes amadeye, ango bi dil ligel Xweda amadeye û ligel Xweda ne bê agehdar e. Heta bi berdewamî fikra Xweda di dil de be, piştre keşifbûna wî li gor pile û payeya wî dibe. Wateya wê ewe ku Xweda bi taybet ji bo wî daniye. Ev jî dema hestê wî timî ne ligel wî be, agehdariya wî ji nefs û rewşa kesên din jî hebe*[232]

Dema mirov temaşeyî dîtinên Hoceyrî û Quşeyrî dike, ew yek derdikeve holê ku Quşeyrî ji bo amadeyiyê dû rûberan destnîşan dike. Amadeyiya rast (heq-Xweda) û amadeyiya amade, lê ligel Hocuyrî û di pirtûka 'Keşfil Mehcub' de amadeyî û windabûn tenê rûbereke wan heye.Ew jî bi wateya amadeyî tenê amadebûna li beramberî Xweda ye.

Eraqî di derbarê amadeyiya amade de wiha dibêje:

*Henardî lêwî meygêrî pirrî kird ew defray ke deygêrrê*

*Amadegî kirde manî, ew hedîsî nefsî însanî* [233]

Yan jî dibêje:

*Hey tek hemû kes biwêj û giştî hemû kerr*

*Wey le lay hemû kes û kes niyetî çi çaw*[234]

Eraqî li vir behsa amadeyî kiriye û di wê baweriyê de ye ku Xweda di nefs û rihê mirovan de amadeye.Lê ti kes bi çavê xwe vê amadebûnê nabîne.Ji ber ku Xweda nayê dîtin û tevî ku amadeye li hemû cihî heye, lê nayê dîtin.Tevî ku Eraqî di wê baweriyê de ye ku tenê arif dikare xwe bigihîne vê amadeyiyê û di hebûna Xweda de berdewam bike, tevî ku Xweda di hemû mirovan de heye. Merc jî ewe ku dilê wî timî ligel Xweda be û îmandar be. Ji ber ku hebûna Xweda, belav, hejar û dewlimend hest pê dikin. Êraqî jî di vê derbaRê de wiha dibêje:

[232] -Ebdul Kerîm ebn Hiwazin Quşeyrî, *Risaley Quşeyrî*, r. 268.
[233] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r.  25.
[234] -Çavkanîya Berî, r. 82.

*Wey le xwazyarît alemê periş û billaw*

*Lat hejar û dewlemendî bê berg û killaw*[235]

Mehwî dibêje:

*Wek gull hemû deme derewem ser be zubanW*

*ek xunçeye deruni, dillî gull le ser zuban*

*Yanî: Zîkrî fahîrim û fikrî bagnîm*

*Her wesfî lêwte, be hemû dem be her zuban*[236]

Zaraveyên weke, 'Zuban (ziman), zîkir, gahîr, fîkir û bagin' hemû jî beş û zaraveyên îrafanîn. Mehwî weke helbestvanek arif timî xwe û endamên laşê xwe şibandiye tiştekî xwezayî.Bi wê yekê dilê xwe şibandiye pişkivîna gulê.Mehwî li vir dixwaze behsa rewşa xwe bike.Timî amadeye di wesfê evîndara xwe de û bi ziman dil û dev, timî bi veşartî û girtî dike hawar. Ev jî wê yekê radigihîne ku Mehwî timî ji yara me ya bê agehdar bû, li aliyê helbestvanên arif û ji bo bigihin yara xwe, pêwîste ji bo saniyeyekê jî ji yara xwe bê agehdar nebin û timî heskirina xwe jêre bênin ziman. Ev jî wisa dike ku bibe sedem ji xelkê qut bibe û ligel Xweda amade bin.

### 3.12 Rastî (Heqîqet )

Rastî di warê wateya xwe ya peyvê de, tê wateya '*Tiştek bi awayê qut bûyî, haşa lê neyê kirin û îspatkirî be, peyva rastî ji bo tiştek li cihê xwe de aram be' ye"*[237]Rastî biwêjeke felsefî û îrfaniye. Li gor cihê ku lê tê bikaranîn, xwediyê wateyên cor be cor e. Di hinek aliyan de wiha derketiye holê ku rastî aliyê berçavbûn û rastî heye. Li gor hinek dîtinan jî rastî xwediyê aliyê zanistiyane ye. Derdikeve holê ku ev beş encama wê yekê ye ku dema mirov digihe rastiyê, meqamek ji hebûnê derdikeve. Xweda bêyî kefî û

[235] -Çavkanîya Berî, r 82.
[236] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehuyî*, r. 318.
[237] -Ebu Bekir Mihemd Kilabazî, *Kitabê Terof*, Celdê Duvum, r. 765.

perde, xwe ji bo dilê amraza arif wî kesî derdixe, ji ber ku li wir di navbera arif û meerûfan de nîne.

Rastî (Heqîqet)‘ Ligel sofiyan derketiya kesayetiya Xweda ya bê kefî û perde (hîcab) hatiye berçavkirin..Reşkirina piraniya bi guman di tîrêjên Xweda de û di pirtûka ‘Meecmue el-Silok’ de wiha tê gotin: "*Rastî di biwêja sofîzmê de tê wê wateyê ku zat û rastî, ango taybetmendiya rastî navê Zate, rastî navê taybetmendiye û armanc ji zat û taybetmendî jî hundir û derve ye. Zatê herî pîroz ango Xweda û taybetmendiyên Xweda*"[238]*Kusî di pirtûka ‘Lilmiee’ de wiha dibêje: “Rastî komkirina rastiyan, peyva hundir û wateya agehdariya dile û bi berdewamî rawestiya ye û yê dixwaze li ser dimeşe. Ango te baweriya xwe pê aniye*"[239,] Beşek zêde ya arifan di wê baweriyê de ne ku di çarçoveya rastiyê de peywendiya di navbera Xweda û girêdayî endazeyan dibe.Perde û hîcabat namênin û arif beyî ti berdestiyekê ligel Xwedayê xwe bi xwe diaxive.Ji ber ku "*Rastî ji gihiştina bi Xweda û di çarçoveya Xwedayetiyê de pêk tê.Dîtina bi kiryarî, peywendîbûn û arif; hemû ji zatê Xweda pêkhatine.Yan jî taybetmendiyên Xweda dibin sedemê bidestxistina pileya nemanê"*[240].

Li gor dîtina arîfan hemû rê rastîne.Çi tiştek raste, bi giştî rastîne. Yan jî rastî kevin û tekaneye, yek zêdetir nîne û ev jî rastiya Muglih e. Ango ne tiştekî din e û ev yek rastiyê nîşan dide.

Eraqî dibêje:

*Nihêniyek lew perdedaye, merce bîzanî*

*Derkewtûwe heqîqet çiye wa dîlî mecaze?*[241]

Zaraveyên ‘Nehênî (veşartî), perde, rastî û mecar’ hemû jî zaraveyên îrfanîne.Ew yek ji bo Êraqî eşkere bûye ku perdeyek di navbera arif û Xweda de heye. Lewra ew

[238]-- *Çavkanîya Berî*, r. 479.
[239] -Ebu Nesir Sirac Tusî, *Ellemeat fî Tesewf*, r. 368.
[240] -Fereyddun Sêpahî, *Rûh û şebeh*, neşr Ehsan, Tehran, Tehran, 1377, Mqaley2.
[241] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 72.

perde jî ligel Êraqî nemaye. Êraqî gihiştiye rastiye û êdî nizane nefsa wî çima bi vê yekê ewqas bi karê mecazî ve mijûl e.

Yan jî dibêje:

*Dema sultanî heqîqet îznî da nawmalî dill*

*Hemû ruh û rîz bûne le dewrî textî dill*[242]

Li vir Eraqî vê yekê bi eşkere ji me re radigihîne ku gihiştiye rastiyê û ev rastî jî ji aliyê rastiyê bi xwe ve hatiye kirin. Lewra çi dema ev yek eşkere bû, êdî her çi tişta rûyê cîhanê ye li derdora textê dilê min rêz bûn. Ev jî dema dibêje texta dilê min, wate dibêje ez gihiştime meqamekê ku ji ber birîna hîca meqama dawiyê ye. Ango gihiştiye rastiyê, ev kare jî ne ligel hinek arîfan be derneketiye.

Yan jî dibêje:

*Katêk le naw awêneda derwanime wênekem*

*Hemû cîhan berastîne rakêşrawe bom*[243]

Dîsa hemû tiştên hatine çêkirin ligel Eraqî dibin rastî, ev jî ji ber nemana rûpelên di navbera Xweda û Êraqî de yên ji ber rastiyê pêk tê.

Mehwî dibêje:

*Muheqqet her kesê meslekye heqîq û heqîqiye minfur*

*Sulokî çûne serdare, terîqey pîre Mensûr*

*Le olkery îşiqda bo her kesê serdariye menfur*

*Ulûy metebey serdare, bote peyrewî Mensûr* [244]

[242]-- Çavkanîya Berî, r. 154.
[243] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 16.
[244] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm, *Dîwanî Mehwî*, r. 173.

Li vir Mehwî gelek amaje û nîşanên Erfanî bikaraniye û hemû jî balê dikişînin ser gihiştina rastiyê.Mehwî, Mensûrê Helacî weke wêneyekê bikarniye ku qaşo Mensûrê kurê Helace gihiştiye rastiyê. Piştre jî ev wêne bû sedemê darvekirina wî. Ev sêdare jî bû nîşana serdarî û mezinahiya ji bo Helac. Ji ber ku bi gihiştina Helac a rastiyê û eşkerekirina wê jî bû sedemê darvekirinê.Lewra Mehwî jî bi heman awayî gihiştiye rastiyê.Ji ber ku dixwaze texlîdê Helac bike, bi wê yekê ku dike serkirde û pêşengê xwe yê mijara heskirin û rastiyê de. Ji ber ku Mehwî dibêje, meqamê serkirdayetiyê ji bo wê yekê ye ku di welatê heskirinê de digihe rastiyê. Ji xwe eger gihişt rastiyê, weke Helac dibêje li benda encamên wê raweste.

## 3.13 Taka (Reca) Hêvîdarî

Hêvîdarî yek ji pileyên terîqetê ye. Divê rêwî timî hêvî bi Xweda hebe û rica ji Xweda bike. "*Tika (rica) di warê peyvê de hîvîdarî û hebûna hêviyê ye. Lê di warê biwêja îrfanê ve daxwaza wî heskirina dil a ji bo bidestxistina evînek di siberojê de ye*"[245,] Zanistvan (arîfan) ‘Hêvîdariyê bi pileya herî nizim a terîqetê (mezheb) bi nav dikin. Armancxwaz ji ber ku ji aliyê dijmin û nerazîbûnan ve ye, tenê qezenca wî di rêya îrfan de ewe ku ji germiya tirsê kêm dike. Heta tirs ji kufra xwedawendiyê nebe bê hêvî û bêhêvîbûna di rehmeta Xweda de"[246], Sedemên hêvîdariyê baş in û rehmeta Xwedayê mezin e. Neku kiryar girêdayî wê yekê ye ku şerte di kiryara bendê de bê paqij kirin û di nav de xalek spî nayê dîtin. Ji ber ku hejar ji bilî hejariyê nikare tişteke din bike. Ji bo rûreş jî ji bilî rûreşiyê ti rengdaneke wî ya din nîne. Ji mumkîniyê ji bilî mûmkuniyê tiştek din nayê dîtin. Lê rehmet û lûtfa bê dawiya Xwedayê xwe sedema herî giring a hêvîdariyê ku derdikeve. Hemû kesayetî û kesên ne ciwan bi wî awayî xwe dipêçin, bi sade, rêkûpêk û ciwan digûherîne û dilê hemûyan dikeveyê. Her ji ber ku merc û bende dilê xwe li ser hêvîdariyê danî be.

Quşeyrî cûdahiya di navbera hêvîdarî û tikakariyê (rica) de, dem û bi baweriya wê tikakariyê tembele, terîqet di hewl û hewldanan digire. Hêvîdarî jî berevajiye, her weke

[245]-Mîr Seyîd Şerîf Curcanî, *Terîfan Ferhing Estilahat Mearf Îslamî*, r. 80.
[246] -Xwace Ebdullah Ensarî Herewy, *Sed Meydan*, r. 112.

Quşeyrî dibêje: "*Cûdiya di navbera hêvîdarî û tikakariyê de heye, tikakarî xwediyê wê rastî tembeliyê dike. Li ser rêya hewl û hewldanan radike û xwediyê hêvîdariyê berevajiye.Hêvîdarî hatiye pejirandin, tikakarî kemayesiyê têne*"[247], Li vir em digihin wê yekê ku bêjin hêvîdarî ciwanî û başiya hêzê ye.

Ibnî Xubeyq hêvîdariyê dike sê beş:"

-*Kesê başiyê dike û hêviya wî wisaye ku bipejirîne.*

-*Kesê xirabiyekê dike û vedigere dike. Hêvidare ku Xweda wî efû bike.*

-*Kesek tawanekê (sûc) dike û dibêje, hêvîdarim Xweda min efû bike. Ger kes xwe di xirabiyê de bibîne, ditirse ku li ser wî bibe deshilat û heta hêvîdar bibe*"[248].

Hocuyrî bi xwe derbarê hêvîdariyê ti tiştek negotiye û tenê gotiye, mezin kirine mijara gotinê. Ji bo vê armancê jî sûd ji tevgerên Ebûbekirê Yehya Bîn Miazî wergirtiye ku dibêje; "Rewşek baş hebû. Ji ber rastiya hêvîdariyê pêngavek baş avêtiye û Xweda pêhesandiye"[249] Bi balkişandina li ser vê nasandina li ser mijara hêvîdarî nivîsandî, dikare di wateya biwêja hêvîdarî têbigihîn.Hêvîdarî, hêvîdariya xwediyê dile û bidestxistina fermana Xweda ya di siberojê de ye.

Eraqî dibêje:

*Er nîm ûmîd ez kaha ew*

*Gir çe dirwîş û gida eftida da em*

*Aqbet nîku şûd garim, çu min*

*bir sir kuy reca eftadam*

*Han! Êraqî, xem mexur, kez beher tu*

---

[247] -Ebdul Kerîm bin Hiwazin Quşeyerî, *Risaley Quşeyrî*, r. 186-187.
[248] -Ebdul Kerîm bin Hiwazin Quşeyerî, *Risaley Quşeyrî*, r. 199.
[249] -Seyîd Ziya Eldîn Secadî , *Moqedemeyê Îrfan û tesewf*,Celd Duwem, r. 186- 187.

*Bir dir ligif xed eftadam*[250]

Wate:

*Bê hêwa nîm le ber dergay ew*

*Eger çî kewtûme siwalker û derwêş emin*

*Çak debêt encamî karim, çûnke min*

*Geştumete qonaxî hîwa û kewtumete ew cêgeş emin*

*Ha Êraqî! Xem mexo bo toye to*

*Kewtûmete ber derkî lutfî xuda ewîş min*

Eraqî sedema keyfxweşiya xwe di wê yekê de dibîne ku tevî ku weke derwêşek ji xwe re digereye, lê li ber dergehê Xweda ne bêhêviye. Ev bêhêvînebûn dibe sedem ku encama karên wî baş be. Ji ber ku gihiştiye qonaxa yan jî rewşa hêvîdarî. Her li vir jî bi xwe dibêje, Eraqî xemê nexwe encama dawî hemû ji bo te ye. Ji ber ku ketime ber rehim û mezinahiya Xweda.

Di vî warî de Mehwî dibêje:

*Behane megre lew camane came*

*Kerem ke saqiye, bigre reaman*[251]

Mehwî di vê hevokê de gelek beşên îrfaniyê bikaraniye.Ji wan jî ‘Bihane, camene (cemedanî), cam (dilê hişk), kerem, saqî (meşrûb) û recaw.’Mehwî di vê hevokê de pileyek di jêra Êraqî de ye.Ji ber ku Eraqî dibêje; ez gihiştime ber deriyê rehim û mezinahiya Xweda, lê Mehwî negihiştiye vê astê. Ji ber ku daxwaza saqiyê dike ku başiyê jê qebûl bike. Ango hevok bi giştî ber bi rewşa sofîgeriyê ve pêngavan tavêje.Ji

---

[250] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 157.
[251]-Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemey Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî*, r. 321.

ber ku Mehwî daxwaza tişteke xwedayî ji saqiyê dike.Lê liberçavgirtin weke peyveke ferhengî ya îrfanî hatiye bikaranîn.

Yan jî Mehwî dibêje:

*Niye be xeyrî emem hîçî tir omê û emel*

*Le baregahî Celîl Celîl (Ezucil)*[252]

Dîsa Mehwî gelek beş û zaraveyên irfanê bikaraniye. Hinek ji wan biwêjan ji aliyê Eraqî ve hatine bikaranîn û piştre Mehwî dûbare kiriye. Ji wan jî ‘umêd (hêvî), ewel (despêk), baregeh, celîl û ezûcel.’Mehwî gumanê ji tiştekê nabe ji bilî hêvî û emela li ber deriyê paqij ê Xweda.Mehwî heman ber dergeh û fikra Êraqî dûbare kiriye.Ev jî bandora Êraqî ya di dîtina Êraqî de li ser Mehwî derdikeve.

Mehwî dibêje:

*Şew çi şew? Lê pişikkdarî qerneha sibûhî umêd*

*Her le dawênî yekê xubhane le kepenhane roj*[253]

Zaravayên ‘Şev, sibeh, hêvî û penha’ cor û zaraveyên îrfanîne. Li vir Mehwî dibêje, ew şev çi şevek bû? Şevek bû bi sedan sale berbanga beyaniyan bi wê destpê dike. Di despêka her ji wan sibehan de bi hezaran rojan xwe veşartine.

### 3.14 Reza (Riza)

Reza di warê wateya peyva razîbûn û di warê biwêjê de ji" *reşkirina xerîbî û şîrînkirina tehliyên hikmê qeza û qederê pêk tê*"[254], Ev biwêj ji du aliyan ve behsa wê hatiye kirin, bi taybet jî di warê gelo Reza bi beşa rewşên darizandibe yan jî meqaman dîtinên cûr be cûr derbarê van mijaran de anîne ziman. Sofiyên Iraq û Xoresan derbarê Reza (Riza) de xwediyê dîtinên cûda ne. Li gor dîtina Xoresaniyan, Reza dawiye û yeke

[252] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemey Mela Kerîm,dîwanî Mehwî, r. 65
[253] -Çavkanîya Berî, r. 190.
[254] -Mehmud bin Elî Ezedîn Kaşanî, *Mesbah Elehdaye û Moftîh Elekfeyê,* r. 284

ji meqaman ango rêbwar ji ber hewldanên xwe ve bidestdixe. Lê Iraqiyan gotine, Reza girêdayî rewşane, bexşîşeke Xweda ye, peywendî bi hewl û hewldanên rêbwar ve nîne.Li gor dîtina arîfên navdar Reza pileya dawiye û li pey xwe, xwe dispêre Xweda. Ev jî qonaxeke arif teslîm û destgirêdayiyek tevayî daxwazên Xwedayê xwe, pêwîste di wê pileyê de arif digihe wê encamê ku her çi tişteke li gor daxwaza Xweda be, ne ya herî baş û sade ye. Ne cihê gilî û gazindane.”Qonaxeke arif teslîmî desgirêdane temam a daxwaz û hêviyên Xwedayê xwe dibe. Di vê pileyê de arif digihe wê armancê ku her çi tişta daxwaza Xweda be, ya herî baş û sadeye, cihê giliyane û ne gazinde. "*Pileya ji bo arif destgirtî be, piştî qonaxa xwe bi Xweda dispêre tê. Ji ber vê yekê ne pêwîste ku bi bawerînameyek ligel despêkê, beş û xwe bi Xweda spartin xerîb nabe û tehliya hikûm ligel şirîn dibe. Reza gimika terîqete û Reza ji mirov werdigire û daxwaza we di hêz û deshilata Xweda de namîne*"[255]

Xalek derbarê tiştên ku li ser Reza hatine nivîsandin, wê yekê derdixe holê ku Reza razîbûna bi qeza û qedera xwe ye, çi terqetêk nikare bigiheyê. Komelek kêm ên şewitîna rast a rêya tejî kend, rêyek xwar û qemçî arifan ji bo gihiştina wî meqamî serkeftinê bidestdixin.

Eraqî dibêje:

*Bew hukmî xudaye, xudî qezakey ewe*

*Lolo dilleke, helleye, rezakey eweye*

*Ew xudaye be kêy he suçî wa damê ceza*

*Tobe le gunahêkî, cizakey eweye*[256]

Eraqî berê xwe dide dilê xwe, amojgariyan dike û dibêje, ew tawan û binpêkirinên ku tû dikî, divê tû bi cezayê ku ji aliyê Xweda ve werdigirî razî bî.

Yan jî Eraqî dibêje:

---

[255] -Hesen Seîd Ereb, *Reza danşnamey teşbîh*, Celd Heştem, Zîr nezer Ehmed Sedir û Hac Syîd Cewadî û Kamranî Fenî û Behadîn Xoremşanî, Neşir Şehîd Seîd Mehbî, Tehran, 1378, r. 264.
[256] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, Risale Lemeat u Riseley Estelehay, r. 378.

*Her xiwastêkî bo ewîn bibêt*

*Le reza û pêkewe bûneweye debêt* [257]

Her daxwazek ji bo heskirin û evînê bigunce, wê demê wê çêbibe. Dema tû ligel hewl bidî, ligel bijî û bibî yek.

Mehwî dibêje:

*Qezabê destellatit bika, çiye xeyrî riça care*

*Le ber destî cella bipareze wek şêrî pel beste*[258]

Mehwî bi heman awayê Eraqî ji xwe re dibêje, divê tû bi wê qeder û qezaya ku Xwedayê mezin têne serê te razî bî. Herwiha eger wiha nebe, çi çareseriyek din heye. Lewra divê çawa weke şêrek te girêdan, bi wî awayî li ber qeza û qederê biparêze.

### 3.15 Mestî (Suker)

Mestî yek ji wan biwêjaneye ku bi zorî ji aliyê sofiyan ve pirsgirêk û nakokiyek zêde li ser hişyarî û mestê du zaravayên sofîzim û îrfanî yên li ser rewşa sofiyan tên bikaranîn. Hişyarî ji Xweda hatina rêya sofîzm piştî ji hişçûn û nemana hest pêk tê. Huceyrî di pirtûka ‘Keşf El-Mehcub’ de bi awayek ciwan behsa wê dike. Bi dîtina Kaşanî mestî di warê wateya mestî û di biwêja sofiyan de ji "*Reşkirina nasîna di navbera hikmê awa û derûniya, ji ber cûdahiya tîrêjên hizir di pirîskên tîrêja zatî de pêktê.Bi wateyek din mestî nebûna nasîna di navbera taybetmendî û naveroka şerîetê ye*"[259] Herwiha bi dîtina sofiyan jî mestî ji "*Bicih hiştina astengiyên taybetmendî, derûnî û balkişandina bi Xweda pêktê.Mestî li aliyekî ve ne liberçavan bû û ne zelal bû. Ji ber*

[257] -Ferxedînî Ibrahî  Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 378.
[258] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî*, r. 350.
[259] -Mehmud bin Elî Ezedîn Kaşanî, *Mesbah Elehdaye û Moftîh Elekfeyê*, r. 96.

*ku xwediyê mestiyê her demê kefayetxwaz be di mestiyê de, hinek caran di rewşa mestiyê de fikra wî li ser dilê wî nemîne*"[260].

Bi hûrbûna li ser van dîtinên derbarê mestî (sikir) de, ew yek eşkere dibe ku mestî di encama dîtina sifata başî ji bo bende tê zanîn. Mestî dibe sedemê şadî, xweşî, sermestiya dil û derûn.Lê 'Hoceyrî' bi xwe alîgirê Cûneydiyekanewe li gor mestê baştir dizane. Nasandina wî wateyek din heye û dibêje: "*Bi awayek giştî mestî di dema mana sîfet û ya hîcabê mestî nemane*"[261], Hocuyrî pênaseyek eşkere û taybet li ser mestiyê nîne û tenê ji bo selmandina (îspatkirina) girêdana bi mestî ve, di wê baweriyê de ye neman di dema mana sîfet de dizane. Hocuyrî bi xwe mestî dike dû beş. Ya Yekemîn, Hevaltî.Ya Duyemîn jî; Mesta Heskirinê.

Eraqî dibêje:

*Mişişee aja eskut minha*

*Fila eçhiwa elî yum el-tilaqî*[262]

Mehwî dibêje:

*Le ber hukmî nîgaya qate hoşyar*

*Heta çawî bika bir, meste her mestî*[263]

Di vê hevokê de herdu zaraveyên 'Hoşyar' û 'Mestî' hatine bikaranîn.Mehwî dibêje; yara min hê jî ciwan û dilgire, yê bibîne mest bûye û ketiye ser erdê.Herwiha ti kesek hoşyar (hişyar) li vir diyar nabe. Yara wî jî divê her Pêximber be. Lewra di hevoka heştan a xezela xwe de navê "Ebû Bişra aniye, her meste ku mestî Hz. Amade vêca ji bilî Pêximber divê çi mirovek mest bike?

---

[260] -Seyîd Ziya Eldîn Secadî ,*Moqedemeyê Îrfan û Tesewf*, r. 468.

[261] -EbulHesen Elî bin Osman Hucurî, *Keşif Alme Hcur*, r. 233.

[262] -Ferxedînî Ibrahî Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, r. 267.

[263] -Mela Ebdul Kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*Dîwanî Mehwî*, r. 105.

**ENCAM**

Ji bo sofîzmê gelek pênaseyên cor bi cor hatine kirin, pênaseya herî sade bo sofîzmê bi awayeke ruhî û kiryarî pêktê ji zanyariyên derbarê çawaniyên bi zatê xuliqkar ve ye, ev jî tê wateya ku divê çawa berê xwe bidî xwedê û tam ji perestiya xwedê verbigriye, giringiyê nedî bi madiyatê û zêdetir nêzîk bibî li aliyên manevî, wê demê ev tê wateya ku kêm birazêy û kêm bixoy û bêdengiyê helbijêrî li hember dengê bilind, hejarî û niyet paqijî bo xwedayê xuliqkar û berdewam di rabûn û rûniştin û danûstandinên xwe de bi kiryarî pêkbînî, yan jî sofîzm tê wateya aliyê navxweyî yê oldariyê. Yan jî tê wateya naveroka rasteqîn ve girêdanbûna bi xwedê ve ye, berdewam terîqatên cuda hebûne, bi taybet berî îslamê jî her hebûye, sofîzm pêwîstiye û berê xwe li cîhana axiretê dike, sofîzm di wateyek din de di serdemên qeyranan de dibe penagehek bo hemû mirovan û di demên asayî de dema ku mirov noqî madiyat û daxwazên xwe dibin, navendên me yên civakî bi cîh dihêlin, sofîzm mirovan fêrî xwe nasînê dike û bi rêya sofîzmê ve xwedê binasin, jiyana fikrî ya mirov jî pêktê ji du çemkan ango ferasetan (xwe nasîn û xwedê nasîn), ji aliyê civakî ve jî peyvendî di navbera mirovan de peyvendiyeke berjewendî xwaziyê ye, berjewendiyên cîhanê wa dike ku mirov kêmtir li yek xweş bibin, lê eger rû li cîhana sofîzmê bê kirin, ew tê wateya ku tu rû li cîhana manevî dikî, wê demê mirov tam ji tiwafkirin û jiyanê verdigre.

Irfan ezmûneke takekesiye û peyvendiya di navbera mirov û xwedê de ye, irfan pêktê ji kûrayî û tund û tîjiya hestên derbarê cîhana ku ew xwediyê wê nînin, irfan têkelbûneke li dibistanên cor bi cor ên felsefeya ji arifan hatî vergirtin û nasîna zaniste, ev jî tê wateya wek mijareke pêkhateyên zanistî vergirtine, li ser bingehê dil û dervey belge bi eqil kar kirine, di encamp de geheştina xwedê ye, wan karane hemû wek karên irfanî tên pênase kirin.

Di qonaxa zuhd de zahîd gelek rabûn û rûniştin û danûstandinên berevajî rewabûnê bikaranîne, ku di olê de tiştekî giringe ew jî (kêm xwarin, kêm xewkirin, zêdegavî nekirin, êş bi xwe dayîna kêşandin)

Cudayî di navbera zuhd û irfan de heye, lê cudayiyek wisa di navbera irfan û sofîzmê de nîne, cudayiyên wan jî ji aliyê zaraweyan de ye.

Irfani bûn taybet bi ole kî ve girêdayî nîne, ew yek jî tê wê wate yê ku her ol li gor taybetmendî yê xwe alîyek wê yê iranî heye.

Mehwî yek ji helbestvanên herî navdar ê kurd e û wek helbestvanek irfanî hatiye naskirin û gelek çemk û zarawayên irfanî li gor wateya irfanî bikaraniye.

Ferxedînê Eraqî yek ji helbestvanê Îranê ye û di sedsala heftê de jiyan kiriye û helbestvaneke arif bû, bi taybet bûye çavkaniyek bo helbestvanên arif ên pişt xwe.

Beşek ji helbestvanên arif bi temamî dijî rewabûnê bûne, her ji ber vê jî hin ji wan, bo nimûne Hellac hatiye darve kirin. (herçend hin nivîskar vê yekê red jî bikin.)

Di navbera Fexredînê Eraqî û Mehwî de gelek bîr û raman û çemk û zarawayên irfanî wek hevin û dubare bûne, ev yek jî tê wateya ku Mehuyî di bin bandora Fexredînê Eraqî de bûye, bi taybet jî ji aliyê raman û nêrînên irfanî û sofîzmê ve.

**Çavkanî**


-An Marî Şîmel, *Ebad Îrfan Îslamî, Tercumeyî Ebdulrehîm Gewahî*, Entişarat Ferhengî Îslamî, Tihran, 1377.

-Celaledîn Homey, *Tesevuf der Êslam*, *Ç*apê Duvum, Êntêşaratê Hemê, Tehran, 1366.

-Ebdul Baqî Gullpî Narlî, *Tesewf der Yeksed Pirsiş û Pasox*, Tercume Tofîq Haşimî Sobhanî, Entêşarat Ehya kitab, Tihran, 1380.

-Ebdul Husêyn Zêrîn Kub, *Donbalê Sofîzim*, Entişarat Emîr Kebîr, *Ç*ap Ewel, Tehran,1357.

-Ebdul Husêyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiye*, *Ç*ap Heftum, Entişarat Emîr Kebîr, Tehran, 1373.

-Ebdul Refîq Heqîqet, *Tarîx Îrfan û Arêfan Îranî*, *Ç*apê Sêhem, Entişarat Kumeş, Tihran, 1375.

-Ebdulbaqî Gullpî Narlî, Mulana Celal Eldîn Zindêganî, *Asar û Guzîdeyî Ez Anha Mutercêm Tufîq Sobhanî*, Çapê Çaharum, Entêşaratê Pejuhişgahê Ulum Ensanî û Motaleat Ferhegî, Tehran, 1386.

-Ebdulbaqî Sruş, *Helac Şehîd Tesevufê Êslamî,*Tercumêyê Huseyn Derayê, Êntêşaratê Esatîr, Têhran,1372.

-Ebdulheseyn Zerîn Kub, *Tesewf Îranî der Menzer Tarîxî yê an*, Tercumey Mecedeldîn Keywanî, Entêşarat Suxen, Tihran, 1383.

-Ebdulhusêyn Zêrîn Kub, *Custêcu der Tesevufê Îran*, Çapê Çaharum, Êntêşaratê Emîr Kebîr, Têhran, 1369.

-Ebdulhuseyn Zerîn Kub, *Erziş Mîras Sofiye*, Çapê Yazdehum, Entişarat Emîr Kebîr, Tehran, 1383.

-Ebdulkerîm bin Mewaz Qoşeyrî, *Risaley Qoşeyrî*, Tercumeyî Ebu Elî Hosên bin Ehmed Osman, Çap Nuhum, Entişarat  Êlmî û Ferhengiy Tehran,1385.

-Ebdulkerîm Sruş, *Qises Erbab Merêfet*, Çap Pencum, Entêşarat Ferheng Sîrat Tehran,1379.

-Ebdulla Ensarî Hîruyî, *Sed Meydan*,Celd Yekem, Teshîh Ebdulhey Hebîbî, Neşir Dinyay Kitab ,  Tehran, 1386.

-Ebdullah Selewatî, *Cewd û Sexa*, Celd Yazdehu, Be Serperişt, Xulam Hadad Edil, Neşirê Betyad Dayêrê Alm Arêf Slamî, Tehran, 1386.

-Ebdulrehman bin Xeldun, *Moqedemey ebn Xeldun*, Celd Ewel Tercumey Muyed Xwarzemî, Çap Şeşem, Entêşarat Êlmî û Ferhengî, Tehran, 1386.

-Ebdulrehman Ebin Xeldun, *Moqedemêyê Abên Xeldun*, Tercumeyê Muhemed Pervîn Kenabadî, Çapê Heştum, Êntêşaratê Êlmî û Ferhengî, Têhran, 1375.

-Ibnê Cuzî, Teblîs Eblîs, *Tercumî Elî Rêza Zekawtî Qeraguzlu*, Çap Duwem, Entişarat Danêşgah, Têhran 1381.

-Ibrahîm Ehmed Şwan, *Şêirê Ayînî û Sofîgerî le Şêire Kurdiyekanî Mehwî da*, Çapî Yekem, Çapxaneyî Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2001.

-Ebu Hamêd Xezalî, *Tecelî  Enver*, *Tercumey Yunis Yezdan Perest*, Entişarat Êhsan, Tehran, 1380.

-Ebu Nesir Sirac Tusî, *Lil Leme fî Tesawf,* Teshîh û Tehşîye  Rînold Alin Niklison, Tercumey Mehdî Micteba, Neşr  Esatiyr, Tehran, 1381.

-Edul Hesen Elî ebn Osman Hucurî, *Keşif Alme Hcur*, Çap Duvum, Meqedem û Teshîh, Mehmud Abidî, Entişarat Sruş, Tehran, 1386.

-Elî Ekber, *Loxet Namey Dêhxeda*, Çap Duvum, Celd Heştum, Entşarat Danşgah Tehran, 1346.

-Emam Muhamad bin Elî Şukanî, *Elfiwad Elmecmuet Ehadîs Elmezue*, Bitehq Elşeyx El Elamet Ebd Elrahman bin Yehya El maelş El miyanş, 85.

-Etaella Tededîn, *Cilwehay Tesewif û Îrfan der Îran û Cehan*, Entişarat Tihran, Tihran 1375.

-Eyîn El Qeza(Bîta), *Resaley Lewayh be Teshîh*, Rehîm Fermeş, kêtabxaney Menuçehr, Tehran .

-Êzdîn Nefîsî, el Însan Kamil, *be Teshîh Marîsan Moler*, Tercumey Ziya El dîd Dehşerî, Çap Heştum, Entişarat Tihuriy, Tehran, 1386.

-Fatime Fena, Tuhîd, danêşnamy, *Cehanî îslamî*, Cild heştem, be Serpereştî Xolam Elî Hedad Adil, Neşir Bîtyad Dayêrî Almarif Îslamî, Tehran, 1383.

-Fereyddun Sêpahî, *Rûh ûşebeh*, Neşr Ehsan, Tehran, Tehran, 1377, Mqaley

-Fexredînî Ibrahî Eraqî, *Risale Lemeat u Riseley Estelehay*, be Seî Cewad Nurbexş, Neşe Xeneqay Neamet Elahî.

-Ferîdaldîn Etar Nîşawpurî, *Tezkîret Alewlya*, Teshîh Rênold Nîklson, Çapê Duwem, Entişarat Dinyayê Kitab Têhrn 1370 .

-Hena Faxurî û Xelîl Cer, *Tarîx Felsefe Der Cehan Îslamî*, Tercumey Ebdulhemîd Ayetî, Entişarat Elmî û Ferhengî, Tehran, 1386.

-Hesen Seîd Ereb, *Reza danşnamey teşbîh*, celd heştem, Zîr Nezer Ehmed Sedir û Hac Syîd Cewadî û Kamranî Fenî û Behadîn Xoremşanî, Neşir Şehîd Seîd Mehbî, Tehran, 1378.

-J. A. Nîkilson, *Çrfan Arfan Mosilman*, Tercumeî Esedulah Azad, Entişarat Ferdusî, Meşhed, 1372.

-Kamil Ehmed Nijad, *Tehlîlê Asar û Nizamê Gencuyî*, Çap Duvum, Entêşarat Peyam, Tehran,1375.

-Kemaledî Ebdelrezaq Kaşanî, *Estelehat Sofîyef,* Celd Siwem, Tercumey Muhamad Xwacuy, Neşr Mulî, Tehran, 1372.

-Luyîs Masonî, *Mosayb Helac,* Tercumeyî Seîd Ziya El dîn, Dihşerî, Entêşarat Camî, Tehran1383.

-Maeruf Xeznedar, *Mêjuy Edebî Kurdî,* Bergî Çawarem, Çapî Duhem, Çapxaneyî Aras, Hewlêr, 2010.

-Mela Ebdul kerîmî Muderîs û Muhemeyî Mela Kerîm,*dîwanî Mehuyî*, Jimareyî Çapî Yekem, Çapxaneyî Rena , Sine, 1392.

-Mesheh El dîn (Seîd),*Dîwan Xezelyat,* Çap Nohem,Gbe Koşiş Xelîl Xetîb Rehber, Entişarat Mihtab, Tehran, 1377.

-Mihemed Îlxanî, *Tarîx Felse Der Qern Weset û Rinesans*, entişarat ferheng û erşedî îslamî, Tihran, 1383.

-Mihemed Mensur Nijad, *Eqil der Sê Dînîy Bozurg Asmaniy Zerdeşt*, Mesîhî û Êslam, Entişarat Cewan, Tehran, 1383.

-Mihemed Osman, *Felsefeyî Sofîgerî*, Çapî Yekem, Çapxaneyî Rojhilat, Hewlêr, 2013.

-Mîr Seyîd Şerîf Corcanî, *Terîfan Ferhing Estelahat merêf îslamî*, Entşarat Feruzan, Tehran, 1377.

-MohesIn Bîna, *Munazil Elsaerîn Xwace Ebdulla Ensarî,* Çap Duwem, Nşir Muelef, 1354.

-Nasir Sobhî Qeramekî û Mehmed Îrvanî, *Olum nefes Ez Dîdgahî Danêşmendan Îslamî,* Entişarat Senciş , Tehran, 1381.

-Omer Ezîz Mehwyî, *Meştî le Bîjeyî Arifî û Kirdeyî Îrfanî y Mewlana Mehuyî*, Bergî Sêyem, Çapî Yekem, Çapxaneyî Ezmer Silêmanî, 2012.

-Perwîn Eruc Niya,*Tewbe*,Cela Heştem, Danşnaey Chanî Îslamî, Beserperşt Xulam Eli Hedad, Neşr Binyad Dayrey Mearif Îslamî, Tehran, 1383.

-Qasim Xenî, *Tarîx tesewif der Çslam û Tetewrat û Tehewilat*, Çapê Nuhum, Celd Duwem, Entişarat Zewr, Tehran,1383.

-Rabert Hyom, *Edyan Zindey Cehan*, Tercumeyî Ebdulalrehîm Gêdas Çapê Nuhum, Neşrê Ferhengê Êslamîyê Têhran, 1379.

-Sebur Ebdulkerîm (Şikar), *Rengdaneweyî Kesayetî û Dunnyabînî Helac*, le Şêre Kilasîkî Kurdî û Farsî da Betaybetî Layî Mehwî û Hafizî Şêrazî, Çapî Yekem, Çapxaneyî Kemal, Silêmanî, 2009.

-Seîd Yehya Yesribî, *Dîn û Îrfan*, Entişarat Ferheng û Endîşey Îslamî, Têhgran, 1379.

-Sewamî Mogtanend, *Şoma be Koca Mîrevî*, Tercumey, Ehmed Beyt, Neşr Nesl Nu Endîş, Tehran,1383.

-Şêx Emîn Şêx Ela Eldîn Neqişbendî, *Tesevuf Çîye*?, Çapî Sêyem, Çapxaney Çwar Çira, Silêmanî, 2015.

-Seyd ziyaedîn Secadî, *Miqedemey Brt Îrfan û Tesawf*, ûap Nuham, Entişarat Semiy, Tehran, 1380..

-Tunî Liyn, *Tarîx Tefker Mesîhî*, Motercim, Rubret Eseryan, Çap Sêvum, Neşr Ferzan, Tehran,1386.

-W. T. Astîs, *Îrfan û Felsefe*, Tercumey Behadîn Xremşanî, Çapê Sûm, Entêşarat Sirûş, Tihran, 1367.

-Yan Rîpka, *Tarîx Edebyat Îran*, Celd Ewel, Tercumey Ebu Qasim Horî, Entişarat Suxen, Tehran,1383.

-Yugnî Edward Wîç, *Tesewf û Edebyat Tesewf*, Tercmey Sîrwîs Eyzdî,Entişrat Emir kebîr, Tehran, 1356.

-Yusif Qerzavî, *Sîma Xezalî Ez Nezerê Moafiqan û Moxalifen*, Tercumey Ferzad Hacî Mîrzayî, Entişarat Ehsan, Tehran, 1379.